


## **FERHENG Ê PÎŞK ÊN KURDÎ**



Xwediyê Imtîyazê  
HAFÎZ QAZÎ

Semîweskar  
MUEYAD TEYIB

©  
Mafê Çapkirinê  
parastî ye

Adrêş  
Eraq - Kurdistan  
Duhok  
Avahiyê yekûlîya  
Sindikayên Karkerên  
Kurdistanê  
Tel. 7226376 - 7222126

[www.spirez.org](http://www.spirez.org)  
[www.spirezpage.net](http://www.spirezpage.net)

- **Jimara weşanê:** (241)
- **Navê pirtûkê:** Ferheng pişkên kurdî
- **Danan:** Îbrahîm Remezan Zaxoyî
- **Pêdaçûn:** Xelat Remezan Nejjar
- **Derhênana hunerî:** Evraz Hisên
- **Berg:** Beyar Cemîl
- **Serperîştî ya hunerî:** Nazdar Jezerî
- **Serperîştî ya çapê:** Şêrwan Ehmed Teyib
- **Çapa:** yekem
- **Tîraj:** (750) Dane
- **Jimara Sipardinê:** (735) li sala (2007)
- **Çapxanya Xanî - Duhok**

دار سپرېز للطباعة والنشر  
دهوك

SPIREZ PRESS & PUBLISHER  
DUHOK

**FERHENG Ê PÎŞK ÊN KURDÎ**  
**Û PÊŞGOTINEK LI SER RÊJE Û DEM ÊN PÎŞKAN**  
**KURDÎ – INGLÎZÎ - EREBÎ**

THE DICTIONARY OF KURDISH VERBS  
AND PREFACE ABOUT THE MOODS AND TENSES OF  
THE VERBS  
KURDISH – ENGLISH - ARABIC

قاموس الافعال الكوردية  
مع مقدمة عن صيغ وأزمنة الافعال  
كوردية - انكليزية - عربي

**Îbrahîm Remezan Zaxoyî**

---

2007

کوردستان

---



## **Diyarî**

Ez evê pirtûkê dikim diyarî bo cenabê **Nêçîrvan Barzanî**, serokê hukomet a herêm a Kurdistan a fidiral yê rêzdar;çiku cenabê wî,bivan kiryarên gelek baş radibe:-

- 1- Têgoşîn bo nehiştin a nexuendewarîyê,bi vekirin a xulan bo nexuandewaran li her cihekî pêdivê di Herêm a me ya Fidiral de.
- 2- rêzgirtin û handan a zana û rewşenbîran li welatî û li derveyê welatî. Zana û rewşenbîr,çira ne welatî ruhindikîn û berê welatîyan didin bo pêş; da bigehin kerwanê welat ên pêşkevetî di cîhanê de.Ligel harîkirin a wan bo vekirin a dezgehên demborînê bo çelakî yên civakî û hunerî, da dev ji çayxanan û leyiztin a domînê û perkan berdîn.
- 3- Vekirin a dibistanan û kolîc ên pêdivê li gelek dever ên welatî,da bibin bingeh bo zankoyan.
- 4- Pêşvebirin û xurtkirin a dezgehên asayîşê bo paraztin a welatîyan .
- 5- Puîte pêdana nivîsîn a zimanê me yê şîrîn bi pîtên kurdî lafînî,da hin parçeyên bakur a welatî agehdarbîbin ji çelakîyên hukomet a me.

Hizar silav bo can ê bab û bapîr ên wî yên nemir.

Xoşî ya em têda dewlet serê Barzanî yê nemir û malbat û heval ên wî ne.

**Parêzer Ibrahîm Remezan Zaxoyî**



# **Pêrist**

<b>Pêşgotin .....</b>	<b>9</b>
<b>Pîta A .....</b>	<b>27</b>
<b>Pîta B .....</b>	<b>37</b>
<b>Pîta C .....</b>	<b>49</b>
<b>Pîta Ç .....</b>	<b>51</b>
<b>Pîta D .....</b>	<b>59</b>
<b>Pîta E .....</b>	<b>73</b>
<b>Pîta Ê .....</b>	<b>75</b>
<b>Pîta F .....</b>	<b>77</b>
<b>Pîta G .....</b>	<b>81</b>
<b>Pîta H .....</b>	<b>91</b>
<b>Pîta Î .....</b>	<b>105</b>
<b>Pîta J .....</b>	<b>107</b>
<b>Pîta K .....</b>	<b>113</b>
<b>Pîta Kh .....</b>	<b>119</b>
<b>Pîta L .....</b>	<b>123</b>

<b>Pîta M</b> .....	<b>131</b>
<b>Pîta N</b> .....	<b>137</b>
<b>Pîta O</b> .....	<b>145</b>
<b>Pîta P</b> .....	<b>147</b>
<b>Pîta Q</b> .....	<b>165</b>
<b>Pîta R</b> .....	<b>173</b>
<b>Pîta S</b> .....	<b>187</b>
<b>Pîta Ş</b> .....	<b>199</b>
<b>Pîta T</b> .....	<b>207</b>
<b>Pîta U</b> .....	<b>221</b>
<b>Pîta V</b> .....	<b>223</b>
<b>Pîta W</b> .....	<b>233</b>
<b>Pîta X</b> .....	<b>239</b>
<b>Pîta Y</b> .....	<b>247</b>
<b>Pîta Z</b> .....	<b>249</b>
<b>Paşgotin</b> .....	<b>257</b>
<b>Jêder ên pirtûkê</b> .....	<b>259</b>



## Pêşgotin

Min di vê pirtokê da pitir ji 1400 pîşk ên kurdî yê petî danan pêş çav ên xuandewar ên hêja egera min jê ewe, ku her yek ji me jêder ên pîşkan biduristî binasin, da çu şaşî di axavtin û nivîsînê da çê ne bin. Gelek ji nivîskar ên Kurd evan şaşîyan dikin:-

### 1. Di dem ê daxuaz de (The imparative) ligel pîşk ên(verbs) zanîn û karîn.

Çêbûn a dem ê daxuaz:-

**Bi+ rih a pîşkê+ e.** Bo kitê. (for singular.)

**Bi+ rih a pîşkê+in.** Bo komê.(for plural.)

**Rêz a yekê ji rêz ên derhînan a rihê ji jêderî.**

### Jêder(infinitive)    Pîşk a borî(past tense)    Rih(The basic)

Zanîn	zanî	zan
Karîn	karî	kar
Revin	revî	rev
Kirrîn	kirrî	kirr
Firîn	firî	fir

Bi + zan+ e.= **bizane.**    Bi + zan + in.= **bizandin.**

Bi + kar + e.= **bikare.**    Bi + kar + in.= **bikarin.**

Bi + rev + e.= **bireve.**    Bi + rev + in.= **birevin.**

Bi + kirr + e.= **bikirre.**    Bi + kirr + in.= **bikirrin**

Bi + fir + e. = **bifire.**    Bi + fir + in. = **bifirin.**

Bizane,bizane,ez kurdim.

Ez dizanim,ku tu kurdî

Min zanî ye,ku tu li Siwîdê dijî.

Min zanî bû,Ku ew peşêmane (poşmane).

Ez dikarim kurdî bixuînim.

Tu dikarî kurdî binivîsî.

Ew dikare inglîzî bixuîne.

**Hinkes evê rêzê bikardînin bişaşî:-**

**Bi + rih + ibe.= bizanibe. Bi + rih + ibin.= bizanibin.**

Bizanibe,bizanibe,ez kurdim. Ev şaşîye.

Ez dizanibim,ku tu kurdî. Ev şaşîye.

Ew dizanibe,ku tu kurdî. Ev şaşîye.

Tu dizanibî,ku ez kurdim. Ev şaşîye.

Ez dikaribim kurdî bixuînîm. Ev şaşîye.

Tu dikaribî kurdî binivîsî. Ev şaşîye.

Ew dikaribe inglîzî bixuîne. Ev şaşîye.

**Têbînî:-** Bizanibe û Bikaribe.Bizanibin û Bikaribin şaşî ne di zimanê kurdî de. Min hîvî heye kes bikar ne îne.(Bizane û Bikare.Bizanin,û Bikarin duristin bikarbînin.)

**2. Werin:-** Hin kes werin dikin **jêder**. Ew şaşîyek mezin e. Were! kit, werin! kom, pîşkên ferman in (daxuaz in).

Jêderê were ( **Hatin**) e. **Hatin, bihê(were), dihê, hat, dihat,**

**hatîye, hatîbû.**

Hinkes dibêjin(teqe lê were kirin.) Ev şaşîye çiku(were) li vir ne daxuaz e. Başe, teqe kengî lê hat kirin? Divê bihê zanîn ka teqe kengî lê hat kirin.Çiku divê pîşkê dem ê xu hebe.(Pîşk(verb) karek e di demekê de dihê kirin.).

(Teqe lê were kirin.) rîstek bê wate ye. Çiku bê dem e. Seyrî evan rîstan bike:-

- Teqe lê dihê kirin. Kengî? Niha (present continuous tense).
- Teqe lê hat kirin. Kengî? Berî niha (demê borî)(past tense).
- Teqe lê dihat kirin. Kengî? dema ez borîm. (demê borî yê berdewam.)
- Teqe lê dê hê kirin. Kengî? Demê bêt (demê ayinde). (future tense).
- Teqe lê hatîye kirin berînoke(allready). Demê tewawbor (present perfect)
- Teqe lê hatîbû kirin,berî ez biçim. Demê dûrbor (past perfect).
- Heker teqe lê bihê kirin,ew dê reve/revit. Demê niha yê bilanî (însaî) ye (present subjunctive tense.)

- Heker teqe lê hatiba kirin,ew da reve/revit. Demê borî yê bilanî. (Past subjunctive tense).

**Têbînî:-** Were! Werin! Ne jokerin da bo hemî dema bikarbînin. Bo daxuazê bitinê bikarbînin, çiku demê wan demê ne borî ye. Wek:-

- Aram were da biçin! An
- Gelî bira werin da biçin!
- Te gazî wan kir da bihên. Çiku hemî amadene bo çûnê.

### 3. He, ha, han = one, ones.

He:- peyvek taybete,cihê navê nêr û mê digire,kit û kom, da nav dubare nebe; demê em (ev,ew) bikarbînin bo bersiva (Kî ji van? An, Kî ji wan?)

Wek:

- kî ji van mirîşkan hêkkerin? Bo bersivê: Ev mirîşk hêkker e. An, Ev a he hêkkere. This one is egglayer. An, Ev duên he(ha,han) hêkkerin. These tow ones are egglayers. An, Evên he(ha,han) hêkkerin. These ones are egglayers. He(ha, han) di bersivê de cihê navê mirîşkê girt da dubare ne be/bit.

**Dr. Kamiran Bedirxanî** di rêzman a zimanê kurdî de,li jêr babetê cînav ên nîşadanê(Ev,Ew) wê gotî:-

**Ev he/ha. Ew he/ha.** Divîya gotiba:- **Ev e. Ew e.**

Çiku(e)=(is)Pîşka bûnê,**he/ha** ne pîşka bûnê ne.An divîya gotiba:- Hin dever (e) dikin (**he,ha**).

**Têbînî:-** Hinkes He /han Bikardînin wek pîşka bûnê,dema dibêjin:-

- (Ev bajar han )ew şaşîye. Ya rast; (Ev bajar e.) (this town is.)
- Hinkes he/han bikardînin wek cînavê nîşadanê bo kitek dûr (Ew), dema dibêjin:- (Bajar han)Ew şaşîye. Ya rast, ( Ew bajar) (That town).

Vêca nabit em (han)Carekê bikin pîşka bûnê û carek din bikin cînavê nîşadanê(ew). Ma joker e? Divêt em zimanê xu yê şîrîn aloz nekin û ji şaşîyan paqîjbikin, da pêngavekê ber bi zimanê yekgirtî ve biçin.

4. Hin birayên hêja evan şaşîyan dikin di **jêderan** de.

**SÂŞ (WRONG)**

Çûyîn  
Rawestîn  
Dayîn  
Geryan  
Nivîsandin  
Kolandin  
Kirryan  
Livyan  
Nasandin  
Peqyan  
Revyan  
Vegeryan  
Westîn  
Zayîn  
Tirsîn  
Tiraştin  
Vekolandin

**RAST (RIGHT)**

cûn (têneper e)  
rawestan (têneper e) rawestandin (Têper e)  
dan (têper e)  
geran (têneper e) gerandin (têper e).  
nivîsîn (têper e)  
kolan (têper e)  
kîrîn (têper e)  
livîn (têneper e) livandin (têper e)  
nasîn (têper e)  
peqîn (têneper e) peqandin (têper e)  
revîn (têneper e) revandin (têper e)  
vegeran (têneper e) vegerandin (têper e)  
westan (têneper e) westandin (têper e)  
zan (têper e)  
tirsan (têneper e) tirsandin (têper e)  
tiraşîn (têper e)  
vekolîn (têper e)

**Têbînî:**- Ez dê hemî jêder ên pişkan danim pêş çav ên xuendewar ên hêja, da bihên nasîn û şaşî nehên kirin. **Supas.**

**RÊJE Û DEM ÊN PÎŞKAN**

Rêje ya ragehandinê (indicative mood) (elsîxe elîxbarîye bi Erebî). Ev rêje ye kiryar ên rastîyê ber çav dikin, û **heşt** dem hene:-

1. Demê ferman (daxuaz) (imperative).
2. Demê ne borî (ranebordo) (present tense).
3. Demê neborî yê berdewam (present continuous).
4. Demê bihê (bêt) (ayinde) (future tense).
5. Demê borî (rabordo) (past tense).
6. Demê borî yê berdewam (rabordoyberdewam) (past continuous)
7. Demê tewawbor (present perfect tense).
8. Demê dûrbor (past perfect tense).

**Demê ferman(daxuaz):-** Ew kar e,yê peyvker (first person) ji peyvligelî (secondperson) dixuaze, daku bike piştî demê axavtinê û bi harîkarî ya pêşgir (bi---e) çêdibe, heker kit be û (bi---in), heker kom be. Wek:-

Bi + rih a pîşkê + e. bo kitê.

Bi + rih a pîşkê + in. Bo komê.

➤ **Aram** nav ê xu(xwe)**binivîse!**

➤ **Zarokîno** nav ên xu **binivîsin!**

**Têbînî:-** Heker pît a paşîn ya rihê(regî)dengdar(vowel)be; e,nakeve pişt kitê; lê n, dê keve pişt komê. Wek:-

<u>Kit</u>	<u>Kom</u>		<u>Kit</u>	<u>Kom</u>
1. Bi+ şû = bişû.	Bişûn. <b>Bo neyî yê:</b>	=	Neşû(Meşû)	Neşûn(Meşûn)
2. Bi+ xu = bixu.	Bixun.	=	Nexu (mexu)	Nexun(Mexun)
3. Bi+ rî = birî.	Birîn.	=	Nerî (Merî)	Nerîn ( Merîn)
4. Bi+ hê = bihê.	Bihên.	=	Nehê (mehê)	Nehên(Mehên)
5. Bi+ zê = bizê.	Bizên.	=	Nezê ( Mezê)	Nezên(Mezên)
6. Bi+ vê = bivê.	Bivên.	=	Nevê ( Mevê)	Nevên(Mevên)
7. Bi+ dirû=bidirû.	Bidrûn.	=	Nedirû(Medirû)	Nedirûn(Medirûn)

**Demê neborî du demin:-**

**Demê neborîyê berdewam.** Ew kar e,yê di demê axavtinê de çêdibe biharîkarîya:- (Di + rih a pîşkê + (m,im,î,e,n,in) = Present continuous. Wek:-

- Ez nanî dixum. I am eating the bread. (M) = am.
- Ez sêvan dikirrim. I am buying the apples. (im) = am.
- Tu çêlan difiroşî. You are selling the cows. (î) = are.
- Ew nanî dipêje. She is baking the bread. (e) = is.
- Em cilan dişûn. We are washing the clothes. (n) = are.
- Hûn pîrteqalan diçin. You are picking the oranges.(in) = are.

**Demê neborî (present tense).** Em evî demî bikardînin, daku biaxêvin li ser hin tiştê çêdibin bi giştî ne di demê axavtinê de. Wek:-

**1. Karek bi berdewamî çêbibe.Wek rastî.**

Çêbûn a evî demî:-

Di + rih a jêderî + (m,im,î,e,n,in). Wek:-

- a).Erd **dizivire** li dor xorê (rojê).
- b).Xor(roj) **derdihê** li rojhelatê.
- 2. karek dubare bi be.**
- c).Brînpêç çavdêrî ya nesaxan **dikin**.
- 3. Karek bû ye hîbûn (habit,custim)**
- a).Bilind herroj saet(çikok) heftî spêdê **diçe** bo karî.
- b).Kelebab (dîkil) Spêdê zû **bankdide**.
- c).Bazarî êvaran saet (çikok) heşt **digirin**.
- 4. Karek me bivê em bizanin ka çendcara dihê kirin.**
- a). Çendcara (how often) di heftî yê de, tu **diçî** bo sînemayê ?
- b). Çendcara di heyvê de,Ara serê xu **ditiraşe** ?
- 5. Bo diyarkirina cihê jîyanê bikardihê.**
- a). Nizar **dijît** li Hewlêrê.
- b). Kurd **dijîn** li Kurdistanê.

**Bo neyîyê(negative)(na)** dane cih ê **(di)** di ristê de.

- a). Roj heldihê li rojhelatê. Roj hel**nahê** li rojavayê.
- b). Roj **diçe** ava li rojavayê. Roj **naçe** ava li rojhelatê.
- c). Erd **dizivire** li dor xorê (rojê). Erd **nazivire** lidor heyvê.
- ç). Ez kurdî **di**axêvim bi duristî. Ez kurdî **na**axêvim bi şaşî.
- d). Salar hişyard**ibe** spêdê zû. Salar hişyard**nabe** spêdê zû.
- e). Azad **dinive** çikok heştî şevê. Azad **nanive** çikok heştî şevê.
- ê). Bijar otombîlê **dihajot** herroj. Bijar otombîlê **nahajot** herroj.
- f). Bazarî digirin di şevan de. Bazarî **nagirin** di cejnan de.

**Bo pirsê** (question)(interrogative)(**Ma**)dane pêşîya ristê û nîşana pirsê(?) dane paşî ya ristê(hevokê)(sentence). Wek:-

- a). **Ma** roj heldihê li rojhelatê ? Erê.
- b). **Ma** roj diçeava li rojavayê ? Erê.
- c). **Ma** erd dizivire li dor heyvê ? No. (Ne.)
- ç). **Ma** ez kurdî diaxêvim bi duristî ? Erê. No.
- d). **Ma** Salar hişyardibe çikok heftî spêdê ? Erê.
- e). **Ma** Azad dinive çikok heştî şevê ? No. (Ne).
- Ê). **Ma** Bijar otombîlê dihajo herroj ? Erê. (No).
- F). **Ma** bazarî digirin di cejnan de ? No.

**Têbînî:-** Di rist ên serê de,me demê niha bikaranî;lê ne di demê axavtinê de.

**Demê bê** ( bihê, ayinde, future):-Ew kare,yê di demê piştî axavtinê de çêdibe. Du rêz hene nîşa me didin, ku tiştek dê çêbe di demê bê de.

1. bi harîkarîya (**dê = shall,will**). Ew kar ne sedê sede,**hizirkirine**.
  - a). Azad sêvan **dê** kirre. **Hizirkirine**. Weheye bikirre,weheye ne kirre.
  - b). Tu nameyekê **dê** nivîsî.**Hizirkirine**. Weheye binivîsî,weheye ne
  - c). Em gulan **dê** çînin.**Hizirkirine**. Weheye em biçînin,weheye em neçînin.
2. Bi harîkarîya (**wê bi=Am going to.Is going to. Are going to**)  
**Ew kar sedê sede (100%100). Biryardane**.
  - a). Azad sêvan **wê** bikirre.Azad is going to buy apples.  
**Biryardane**.
  - b). Tu nameyekê **wê** binivîsî.You are going to write a letter.  
**Biryardane**.
  - c). Em gulan **wê** biçînin.We are going to grow roses.  
**Biryardane**.

**Têbînî**:- Hinkes (**dê,wê bi**) dikin(**ê bi**), pît a (**d**)û(**w**)bikarnaînin.  
Ew ne zimanê **edebî ye**, zimanê **tebayî ye(A'mî ye)**. Min hîvî heye (**dê, wêbi**) bikarbînin.

Bo neyî yê (negative) (**Na**) danin cih ê (**dê,wê bi**).

- a). Bijar xanî **dê** kirre. Bijar xanî **na** kirre.(na= shall not,will not)  
Bijar **will** buy the house. Bijar **will not** buy the house.
- b). Salar hespekê **wê** bikirre.Salar hespekê **na** kirre.(Na=am not going to.Is not going to,are not going to).Salar is going to buy a horse. Salar is not going to buy a horse.

Bo pirsê (interrogative):- (**Ma**)dabine pêşîya ristê û nîşan a pirsê (**?**) dabine paşîya ristê.

- a). **Ma** bijar xanî **dê** kirre ? Erê,Bijar xanî **dê** kirre.No, Bijar xanî na kirre.
- b). **Ma** Salar hespekê **wê** bikirre ? Erê, Salar hespekê **wê** bikirre.

**Demê borî** (rabordo,buhorî,past tense). Ew kare, yê berî demê axavtinê çêbûyî û bi avêtin a (**n,in**) ji jêderî

<u>Jêder</u>	<u>Pîşk a borî</u>
Çûn	çû
Hatin	hat
Revîn	revî
Revandin	revand

**Têbînî:-** Pîşk ên demê borî pêdvêyî pîşk a bûnê ne wek harîkar û dibin paşgir bo pîşkê.(pîşk ên bûnê evin):-

(m,im,î,yî,e,ye,n,in).

- Ez çûm bo bazarî duhî.
- Ez hatim ji Dihokê pêr.
- Em suyarbûn li hespan vê spêdê.
- Ew gehiştin nav rezî berî katekê.(berî katekê=an hour ago).
- Wî gul çinîn duhî nîvro.
- Min sêv firotin betirpêr.

**Demê borî neyî. Bo neyî yê (ne) dabine pêşî ya pîşk a borî.**

- Ez çûm bo bazarî duhî. Ez **ne** çûm bo bazarî duhî.
- Ez hatim ji Dihokê pêr. Ez **ne** hatim ji Dihokê pêr.
- Min gul çandin berî du roja. Min gul **ne** çandin berî du roja.
- Em peyabûn ji otombîlê şevêdî. Em peyanebûn ji otombîlê şevêdî.
- Ew suyarbû li hespî pêr êvarî. Ew suyarnebû li hespî pêr êvarî.

**Demê borî pirs.** Bo pirsê (Ma) dabine pêşî a ristê û nîşan a pirsê (?) dabine paşî ya ristê.

- Ma** ez çûm bo bazarî duhî ?
- Ma** ez hatim ji Dihokê pêr ?
- Ma** min gul çandin berî du roja ?
- Ma** em peyabûn ji otombîlê şevêdî ?
- Ma** ew suyarbû li hespî pêr êvarî ?



**Dem ê borî yê berdewam (past coninuous tense).**

Ew kar e, yê berdewamîyekê distîne berî axavtinê:-

- **Bi pêşgir (di)** ligel pîşk a borî ya têper çêdibe + **(n,in)** bo komê(plural).
- **Bi pêşgir (di)** û paşgir **(m,im,î,yî,n,in)** ligel pîşk a borî ya têneper çêdibe.

- a). Min nan **dixuar**,dema tu hatî.
- b). Ew suyard**ibû** li hespî,dema ez borîm.
- c). Se **direwîn**,dema kerwan gehiştî.
- ç). Hûn **dihatin** û **diçûn**,dema stêr rijayî.
- d). Ew **digirî**,dema babê wî venegerayî bo malê.

**Dem ê borî yê berdewam û neyî.**

**(ne)** dabine pêşîya a pîşka borî ya berdewam.

- a). Min nan **nedixuar**,dema tu hatî.
- b). Ew suyard**nedibû** li hespî,dema ez borîm.
- c). Se **nedirewîn**,dema kerwan gehiştî.
- ç). Hûn **nedihatin** û **nediçûn**,dema stêr rijayî.
- d). Ew **nedigirî**,dema babê wî venegerayî bo malê.

**Demê borî yê berdewam û pirs.**

Bo pirsê **(Ma)** dabine pêşîya ristê û nîşan a pirsê(?) dabine paşîya ristê.

- a). **Ma** min nan **dixuar**,dema tu hatî ?
- b). **Ma** ew suyard**ibû** li hespî,dema ez borîm ?
- c). **Ma** se **direwîn**,dema kerwan gehiştî ?
- ç). **Ma** hûn **dihatin** û **diçûn**,dema stêr rijayî ?
- d). **Ma** Kawe **digirî**,dema babê wî venegerayî bo malê ?

**Dem ê tewawbor (present perfect tense).**

Ew kar e, yê dem ê borî çêbûyî û berdewame; an dem ê borî destpêkirî û berî axavtin tewawbûnê rawestayî.

Çêbûn a demê tewawbûr bi du texlîta ne (cora ne).

- 1\ a). Pîşk a **tewaw** + **ye** ligel pîşk ên têper bo **nejimarnavan û jimarnav ên kit (single)**.
- b). Pîşk ên **tewaw** + **ne** ligel pîşk ên **têper** bo **jimarnav ên kom (plural)**.
- c). Pîşk ên **tewaw** + **(me,yî,ye,ne)** ligel pîşk ên **têneper**.

1. Min şîr kirîye. Min şîr **ne** kirîye. **Ma** min şîr kirîye?
2. Te av vaxuarîye. Te av **ne** vexuarîye. **Ma** te av vexuarîye?
3. Wî hespek firotîye. Wî hespek **ne** firotîye. **Ma** wî hespek firotîye?
4. Me du hesp firotîne. Me du hesp **ne** firotîne. **Ma** me du hesp firotîne?
5. Wê pênc bizin kîrîne. Wê pênc bizin **ne** kîrîne. **Ma** wê pênc bizin kîrîne?
6. Ez çûyîme bo Zaxoyê. Ez **ne** çûyîme bo Zaxoyê. **Ma** ez çûyîme bo Zaxoyê?
7. Tu çûyîyî bo Dihokê. Tu **ne** çûyîyî bo Dihokê. **Ma** tu çûyîyî bo Dihokê?
8. Ew çûyîye bo gundî. Ew **ne** çûyîye bo gundî. **Ma** ew çûyîye bo gundî?
9. Em çûyîne bo Wanê. Em **ne** çûyîne bo Wanê. **Ma** em çûyîne bo Wanê?

2\ a). Wê+pîşka tewaw ligel pîşk ên **têper** bo **nejimarnavan û jimarnav ên kit.**

b). Wê + **pîşk a tewaw** + (m,me,î,yî, n,ne) ligel pîşk ên **têneper.**

1. Min masîyek **wê** kirrî. Min masîyek **ne** kirrîye. **Ma** min masîyek Kirrîye?
2. Te sê sêv **wê** kirrîn. Te sê sêv **ne** kirrîne. **Ma** te sê sêv kirrîne?
3. Ez **wê** çûyîm bo Dihokê. Ez **ne** çûyîme bo Dihokê. **Ma** ez çûyîme bo Dihokê?
4. Hûn **wê** hatîn ji Dihokê. Hûn **ne** hatîne ji Dihokê. **Ma** hûn hatîne ji Dihokê?

#### **Demê dûrbor ( past perfect tense).**

Heker du kar çêbûn di demê borî de; divê demê karê yekem **dûrbûr be** û demê karê duwem **borî be.**

Çêbûn a vî demî:-

- 1\ a). Pîşk a **tewaw** + **bû**, ligel pîşk ên **têper** bo **nejimarnavan û jimarnav ê kit.**
- b). Pîşk a **tewaw** + **bûn**, ligel pîşk ên **têper** bo jimarnav ên kom.

2\ Pîşk a **tewaw** + (**bûm,bûyî,bû bûn**), ligel pîşk ên têneper.

1. Min av **vexuarî bû**,berî dîtin a te.
2. Te şîr **kirrî bû**, berî hatin a wî.
3. Wî hespek **kirrî bû**, berî çûn a me.
4. Me sê hêstir **firotî bûn**, berî av rabûnê.
5. Gulê pênc bizin **dotî bûn**, berî gehîştin a bêrîvanan.
6. Ez **çûyî bûm** bo Dihokê, berî hatin a Bijarî.
7. Tu **hatî bûyî** bo malê, berî hatin a min.
8. Ew **revî bû** ji gundî, berî hatin a polîsî.
9. Em **nivistî bûn** li ser banî, berî revîn a Aramî.

**Bo neyîyê (ne)** dabine pêşîy a pîşk a tewaw.

- 1.Min av **ne vexuarî bû**, berî dîtin a te.
- 2.Te şîr **ne kirrî bû**, berî hatin a wî.
- 3.Wî hespek **ne kirrî bû**, berî çûn a me.
- 4.Me sê hêstir **ne firotî bûn**, berî av rabûnê.
- 5.Gulê pênc bizin **ne dotî bûn**,berî gehîştin a bêrîvanan.
- 6.Ez **ne çûyî bûm** bo Dihokê,berî hatin a Bijarî.
- 7.Tu **ne hatî bûyî** bo malê,berî hatin a min.
- 8.Ew **ne revî bû** ji gundî, berî hatin a polîsî.
- 9.Em **ne nivistî bûn** li ser banî, berî revîn a Aramî.

**Bo pirsê, (Ma)** dane pêşîy a ristê û nîşan a pirsê (?)dane paşîy a ristê.

- **Ma** min av **vexuarî bû**,berî dîtin a te ?
- **Ma** te şîr **kirrî bû**,berî hatin a wî ?

**Rêje ya bilanî. (subjunctive mood),( elsixe el însaî,ye).**

Ev rêje ye kiryar ên:- **çêbûn, hatubat û xuezî yê** pêşçavdikin.  
Rêje ya bilanî, demek neborî û sê dem ên borî hene.

**Dem ê neborî yê bilanî ( present subjunctive tense).**

Çêbûn a vî demî:-

**Bi + rih(binyat) + (m,im,î,e,n,in)** ligel pîşk ên têper û têneper.

Wek:-

1. Heker ez **bibînim**, ez dê kirrim.
2. Heker tu **bibînî**, tu dê kirrî.
3. Heker ew **bibîne**, ew dê kirre.

4. Heker em **bibînin**, em dê kirrin.
5. Heker hûn **bibînin**, hûn dê kirrin.
6. Heker ew **bibînin**, ew dê kirrin.

**Bo neyîyê (ne) dabine cihê (bi) û (na) dabine cihê (dê).**

1. Heker ez **nebînim**,ez **na** kirrim.
2. Heker tu **nebînî**,tu **na** kirrî.
3. Heker ew **nebîne**,ew **na** kirre.
4. Heker em **nebînin**,em **na** kirrin.
5. Heker hûn **nebînin**,hûn **na** kirrin.
6. Heker ew **nebînin**, ew **na** kirrin.

**Têbînî:-** Di paristên heker de(**Ma**)dabine pêşî a **şaristê** û nîşan a pirsê (?) dabine paşî a ristê. Hinkes (**Ma**)dadinin pêşî ya **paristê**. Ew şaşîye.

1. Heker ez bibînim,**ma** ez dê kirrim?
2. Heker tu bibînî,**ma** tu dê kirrî?
3. Heker ew bibîne,**ma** ew dê kirre?
4. Heker em bibînin,**ma** em dê kirrin ?
5. Heker hûn bibînin,**ma** hûn dê kirrin?
6. Heker ew bibînin,**ma** ew dê kirrin?

**Demê borî yê bilanî (past subjunctive tense).**

Çêbûn a vî demî:-

1\ a) **Pîşk a borî + (bam,bayî,ba,ban)** ligel pîşk ên **têneper**.

1. Heker ez **çû bam**,tu da hêyî.
2. Heker tu **çû bayî**,ez da hêm.
3. Heker ew **çû ba**,Gulê da hê/hêt.
4. Heker em **çû ban**,hûn da hên.
5. Heker hûn **çû ban**,em da hên.
6. Heker ew **çû ban**,Aram û Gulê jî da hên.

**Bo neyîyê (ne) dabine pêşî ya pîşk a borî ya bilanî.**

1. Heker ez **ne çûbam**,tu da hêyî.
2. Heker tu **ne çûbayî**,ez da hêm.
3. Heker ew **ne çûba**,Gulê da hê/hêt.
4. Heker em **ne çûban**,hûn da hên.
5. Heker hûn **ne çûban**,em da hên.
6. Heker ew **ne çûban**,Aram û Gulê jî da hên.

**Bo pirsê**, di parist ên heker da, (**Ma**) dabine pêşîy a şaristê û nîşan a pirsê (?) dabine paşîy a ristê.

1. Heker ez çûbam, **ma** tu da hêyî ?
2. Heker tu çûbayî, **ma** ez da hêm ?
3. Heker ew çûba, **ma** Gulê da hê/hêt ?
4. Heker em çûban, **ma** hûn da hên ?
5. Heker hûn çûban, **ma** em da hên ?
6. Heker ew çûban, **ma** Aram û Gulê jî da hên ?

2\ b) **Pîşk a borî + (iba,iban)** heker pît a **paşîn** ya pîşk a borî bêdeng be. Wek:-

**Kir, dît, got, xuar, dot, ajot, alîst, aland, çand, vekir, girt, hejand, hijmart**

**Pîşk a borî + (ba,ban)** heker pît a **paşîn** ya pîşk a borî dengdar be. Wek:-

**Kirrî, da, za, çinî, birrî, dada, bazda, darda, dirû(diruî), gura, hêra, hinû.**

**Ligel pîşkên têper.**

1. Xuzî min yarî kiriba.
2. Xuzî te çêl dotiba.
3. Xuezî wî bizin firotiban.
4. Xuezî wê hirî şuştiba.
5. Xuzî me xuarin xuariba.
6. Xuzî we gundor çandiban.
7. Xuezî wan gamêş xudankiriban.
8. Xuezî min çêl **kirrîba**.
9. Xuzî mehîne canîyek **zaba**.
10. Xuzî wî çêl **guraba**.
11. Xuezî wê gul **çinîban**.
12. Xuezî me genim **diruîba**.
13. Xuzî we cil(kinc) **druîban**.
14. Xuzî wan pirs **zanîban**.

**Têbînî:- Hinkes (bi-----a) bikardînin û dibêjin:**

1. Xuezî min yarî **bi kir a**.
2. Xuezî te çêl **bi dot a**.

3. Xuezî wî bizin **bi firot a**.
4. Xuezî min çêl **bi kirrî ya**.
5. Xuezî mehîne canîyek **bi za ya**.

Ev şaşîyek mezine çiku (**bi**) nîşan a **demê neborî** ye (**present tense**) na be em ligel **demê borî** (**past tense**) bikarbînin.

#### **Bo neyîyê ne dabine pêşîya pîşk a tewaw.**

1. Xuzî min yarî **ne** kiriba.
2. Xuzî te çêl **ne** dotiba.
3. Xuezî wî bizin **ne** firotiba.
4. Xuezî wê hirî **ne** şûstiba.
5. Xuzî me xuarin **ne** xuariba.
6. Xuzî we gundor **ne** çandiban.
7. Xuezî wan gamêş **ne** xudankiriban.
8. Xuezî min çêl **ne** kirrîban.
9. Xuzî mehîne canîyek **ne** zaba.
10. Xuzî wî çêl **ne** guraba.
11. Xuezî wê gul **ne** çinîban.
12. Xuezî me genim **ne** duruîba.
13. Xuzî we cil **ne** duruîban.
14. Xuzî wan pirs **ne** zanîban.

#### **Di xuzîyê (xuezîyê) da pirs nînin.**

#### **Demê tewawborê bilanî (present perfect subjunctive)**

Çêbûn a vî demî:-

1. **Pîşk a tewaw + baya**. Ligel pîşk ên **têper**.
2. **pîşk a tewaw + (bama,baya,bana)**. Ligel pîşk ên **têneper**.
  - a). Xuzî min **dîtî baya**,daku min **kirrî baya**.
  - b). Xuzî te **dîtî baya**,daku te **kirrî baya**.
  - c). Xuezî wî **dîtî baya**,daku wî **kirrî baya**.
  - ç). Xuezî wê **dîtî baya**,daku wê **kirrîbaya**.
  - d). Xuzî me **dîtî baya**,daku me **kirrî baya**.
  - e). Xuzî we **dîtî baya**,daku we **kirrî baya**.
  - ê). Xuezî wan **dîtî baya**,daku wan **kirrî baya**.
- a). Xuzî ez **çûyî bama** bo Amedê.
- b). Xuzî tu **çûyî baya** bo Amedê.

- c). Xuezî ew **çûyî baya** bo Amedê.
- ç). Xuezî em **çûyî bana** bo Amedê.
- e). Xuezî hûn **çûyî bana** bo Amedê.
- ê). Xuzî ew **çûyî bana** bo Amedê.

**Têbînî:-** Ev dem e di ziman ê **Inglîzî** da bikar nahê.

**Bo neyîyê (ne) dabine pêşîy a pîşk a tewaw.**

- a). Xuezî wan **ne dîtîbaya**, daku wan **ne kirrîbaya**.

**Dem ê dûrbor ê bilanî (past perfect subjunctive)**

Çêbûn a vî demî:-

1. **Pîşk a tewaw + bûa(bûwa).** Ligel pîşk ên **têper**.

- a). Xuzî min **kirrî bûa**.
- b). Xuzî te **kirrî bûa**.
- c). Xuezî wî **kirrî bûwa**.
- ç). Xuezî wê **kirrî bûwa**.
- d). Xuzî me **kirrî bûa**.
- e). Xuzî we **kirrî bûa**.
- ê). Xuezî wan **kirrî bûwa**.

2. **Pîşk a tewaw + (bûma,bûya,bûna).** Ligel pîşk ên **têneper**.

Wek:-

- a). Xuzî ez **çûyî bûma**,berî çûn a Nizarî.
- b). Xuzî tu **çûyî bûya**,berî çûn a Narînê.
- c). Xuezî ew **çûyî bûya**,berî çûn a Hejarî.
- ç). Xuezî em **çûyî bûna**,berî çûn a Nazê û Ciwanê.
- d). Xuzî hûn **çûyî bûna**,berî çûn a Nermînê û Nesrînê.
- e). Xuzî ew **çûyî bûna**,berî çûn a deybaban.

**Bo neyî yê (ne) dane pêşîya pîşka tewaw.** Wek:-

- a). Xuezî min **ne kirrîbua**.
- b). Xuezî te **ne kirrîbua**.
- c). Xuezî wî **ne kirrîbuwa**.

- a). Xuzî ez **ne çûyîbûma**, berî çûn a Nizarî.
- b). Xuzî tu **ne çûyîbûya**, berî çûn a Narînê.

**Têbînî:- 1.** Hokerê (Na) bikardihê bo neyîyê(negative) ligel demê neborî û demê bê. Lê ligel pişk ên (**zanîn, karîn û hebûn**) (Ni) bikardihê. Wek:-

- a) Ez **nizanim** tu kîyî.
- b) Ez **nikarim**,te bibînim.
- c) Min sêvek heye.

- Min sêvek **niye**. Lê bo **komê** (Ni) dibe (**Nî**) Min du sêv hene.
- Min du sêv **nînin**. Te sê gundor hene. Te sê gundor **nînin**. Wî çar çêl hene. Wî çar çêl **nînin**.

**Têbînî:-2.** Min jêderên pişkan bikaranîn wek pişk û wek navê jêderî. Çiku: Jêder = pişka borî + (n,in).

<u>Pîşkaborî</u>	<u>Jêder</u>
Çû	çûn
Kirrî	kirrîn
Revî	revîn
Hat	hatin
Dît	dîtin
Barkir	barkirin
Suyarbû	suyarbûn

Jêder hene têper û teneper. Jêderên **têper** pişk ên wan pêdivêyî **pişkberê duristin(direct object)** di ristê de.

Min **mazî** çinîn. Te **genim** firot.

Jêderên **teneper**, pişk ên wan ne pêdivêyî **pişkber ên duristin**.

Ez **hatim**. Ew **revî**. Gulê **kenî**. Gurg **mir**.

Jêder **bê dem e**; lê pişk ên jê dihên hildan **dem hene**. Çiku pişk bê dem nabe. (**pişk karek e di demekê de dihê kirin**). Wek:-

**Çûn:** jêderek **teneper e** pişk ên jê dihên hildan evin:-

**Biç e:** (here) pişka daxuaz e(imparative)

**Diç e:** pişka neborî ye(present).

**Çû:** pişka borî ye(past).

**Diçû:** Pişka borî ya berdewam e(past continuous).

**Çûyî ye:** pişka tewawbor e(present perfect).

**Çûyî bû:** pişka dûrbor e(past perfect).



**Kirrîn:** jêderek **têper e** pîşk ên jê dihên hildan evin:-

**Bikirr e:** pîška daxuaz e(imparative).

**Dikirr e:** pîška neborî ye(present).

**Kirrî:** pîška borî ye(past).

**Dikirrî:** pîška borî ya berdewam e(past continuous).

**Kirrî ye:** pîška tewawbor e(present perfect).

**Kirrî bû:** pîška dûrbor e(past perfect)

**Derkirin:** Jêderek **têpere darijtî ye** ji ( der + kirin) = derkirin. Pîşk ên jê dihên hildan evin:-

**Derbike:** pîşk a daxuaz e (imparative).

**Derdike:** pîşk a neborî ye (present).

**Derkir:** pîşk a borî ye (past).

**Derdikir:** pîşk a borî ya berdewam e(past continuous).

**Derkirî ye:** Pîşk a tewawbor e (present perfect)

**Derkirî bû:** pîşk a dûrbor e (past perfect)

**Suyarbûn:** jêderek **têneper e lêkdayî ye** ji (suyar + bûn). Pîşk ên jê dihên hildan evin:-

**Suyarbibe:** pîşk a daxuaz e (imparative).

**Suyardibe:** Pîşk a neborî ye (present).

**Suyarbû:** pîşk a borî ye (past).

**Suyardibû:** pîşk a borî ya berdewam e (past continuous).

**Suyarbûyî ye:** pîşk a tewawbor e(present perfect).

**Suyarbûyî bû:** pîşk a dûrbor e (past perfect).

**Jêder (infinitive)** hem **pîşk** jê dihên hildan hem **navê jêderî ye** (verbal noun). Navê jêderî di ristan de dibe pîşker (**subject**) û pîşkber. (**object**); lê nabe pesn (**adjective**) wek navê pîşkerî (**present participle**). Navê pîşkerî wek:- Zana, gerok, nûsek (nuîsek).

**Têbînî:-** Di ziman ê **Kurdî** de wek ziman ê **Inglîzî** û **Siwîdî**; du cor (**K**) hene;

**Di ziman ê inglîzî de:-**

Yekem= **-K-** wek:- Kat, king,work,kart,wake.

Duyem= **-CK-**(sivik) wek:- Jack, black,stick,quickly,attack.

**Di ziman ê kurdî de:-**

Yekem= -K- wek:- kar= work=شغل.kolan=to dig=يحفُر. ka?=where=أين

Duyem=-Kh-(sivik).wek:-Khar=kid=جدي.kholan=narrow street=زقاق

Kha=hay=تين.khaj=pine=صنوبر.Kherr=deaf=أطرش.Khêr=penis=زُب

Khin=short=قصير.Khotan=pen=زربية.Kherik=unripefruit=فاكهة فجة

Û me gelek peyv hene (K)ên wan sivikin,dive em (H)danin pişt.

**Têbînî :-**

sinbul	nav	
j	jêder	infinitive
tê	têper	transitive
tên	têneper	intransitive
n.j.	Nav ê jêderî	verbalnoun
vt.	Têper	verb transitive
vi.	têneper	verb intransitive

**Parêzer Îbrahîm Zaxoyî**

# A

**Abrûbirin**: j.tê.vt. Hetikbirin. **To despise, To scorn.** يُهَيِّنُ ، يُحَقِّرُ  
Aramî karek ne di rê da kir, abrû yê xu(xwe) bir.  
Salarî Nazê maçîkir li kholanê, abrû yê wê bir.  
\_ : n.j. verbal noun. **Despise, Contempt.** أَهَانَةٌ ، تَحْقِيرٌ  
Abrûbirin a hevalan ne karek başe.

**Abrûcûn** : j.tên.vi. Şerimkirin. **To be ashamed.** يَسْتَحْيِي  
Semyanî li bazarî tirek kir abrûyê wî çû.  
\_ : n.j. verbal noun. **Shame.** اسْتِحْيَاءٌ  
Salar guh nade abrûcûnê di nav hevalan de.

**Adekirin**: j.tê.vt. Pakkirin a bîstanî ji dexelî. **To clean.** يُنْظَفُ الزَّرْعَ  
Du adekeran bîstanê min adekirin. Paleyekê rez adekir.  
\_ : n.j. Verbal noun. **Clean.** تَنْظِيفُ الزَّرْعِ  
Adekirin a bîstanan karekî pêdivê ye.

**Agehdarbûn**: j.tên.vi. Hatin têgehandin. **To inform.** يُعْلِمُ ، يُخْبِرُ  
Em agehdarbûn bo kombûnê (civînê).  
\_ : n.j. Verbal noun. **Information.** إِعْلَامٌ ، إِخْبَارٌ  
Agehdarbûnê berê gundîyan da zibare ya gundî.

**Agehdarkirin** : j.tê. vt. Têgehandin. **To inform.** يُنَبِّئُهُ ، يُخْبِرُ  
Samanî ez agehdarkirim bo seyran a karêzan.  
\_ : n.j. verbal noun. **Information.** إِخْبَارٌ ، إِعْلَامٌ  
Agehdarkirin a gundî hat kirin.

**Agirbarankirin** : j.tê. vt. gullebaran. **To shoot.** يُرْمِي ، يُطْلِقُ  
Pêşmergeyan neyar agirbarankirin berî sê roja.  
\_ : n.j. verbal noun. **Shooting.** إِطْلَاقٌ ، رَمِي  
Agirbarankirin a neyaran rojekê kêşa.

**Agirbestkirin** : j.tê.vt. Şer ragirtin. **To cease-fire.** يوقف القتال  
Israîlê û Felestînîyan agirbestkirin.  
\_ : n.j. Verbal noun. Stopping fire. ايقاف القتال  
Agirbestkirin çêbu dinavbera Parti û Yeketî de.

**Agirdadan** : j.tê.vt. 1. Agirhilkirin. To commove. يُثير الفتنه.  
2. Agirkirin. To set on fire. يُشعل النار.  
1. Xortekê agirdada li navbera Mameş û Pişderîyan.  
2. Aramî agirdada li ber tanê rezî.  
N.j. verbal noun. 1. Commotion. إثارة الفتنه.  
2. inflammation. إشعال النار  
1. Agirdadan li navbera du hozan ne karek başe.  
2. Agirdadan li nêzîkî puîşî karê bê mejîyan e.

**Agirgirtin**: j.tê. vt. Agir têberbûn, sotin. To catch fire. يشتعل  
Behzad nivistî bû agirgirt xanyê wî.  
\_ : N.j. Verbal noun. Catch fire. اشتعال  
Agirgirtin a pûşî li payîzan zû nahê vemirandin.

**Agirhilkirin**: j.tê. vt. 1. Dar sotin bûn agir. To set fire to, To inflame. يُشعل النار  
2. Têkvedankirin. **To commove.** يُثير الفتنه  
1. Nizarî agirhilkir daku goştî bibirêje/it.  
2. Aramî agirhilkir li navber a hevalan.  
\_ : n.j. Verbal noun. 1. **Setting fire to.** إشعال النار  
2. **Commotion.** ثورة، فتنه  
1. Agirhilkirin nêzîkî dexlan qedexe ye.  
2. Agirhilkirin li navber a gundî yan, karê bekoya ne.

**Agirkirin** : j.tê. vt. agirdagîrsandin. **To set on fire.** يُشعل النار  
Hejarî agirkir da xu gerimbike. Zînê agirkir bo ça çêkirinê.  
\_ : n.j. verbal noun. **Setting on fire.** إشعال النار  
Agirkirin xoş e li zivistanê.

**Agirvemirandin**: j.tê.vt. agirkujandin. **To extinguish, to put out.**  
يُطفىء النار  
Xanî yê Behzadî disot gundîyan vemirand.  
\_ : n.j. verbal noun. **Extinguishing, putting out.** إطفاء النار  
Agirvemirandin karê agirvemira ne.

**Agirxoşkirin:** j.tê. vt. agirjiyandinwe. **To kindle, to stoke.** يُزكي

النَّار

Rojekî sar me agirxoşkir, da agir me gerimbike.

Rojekî sar me agirxoşkir, da em gerim bibin.

\_ : n.j. verbal noun. **Kindling.** إِزْكَاءُ النَّارِ

Agirxoşkirin li roj ên sar pêdivêye.

**Ahenggêran :** j. Tê. vt. Şahîkirin. **To celebrate .** يَحْتَفِلُ

Kurd ên Swîdê ahenggêran newroz a îsal li Tênistê.

\_ : n.j. verbal noun. **Celebration.** اِحْتِفَالٌ

Ahenggêran a newroz a îsal li Swîdê gelek xoşbû.

**Ajotin :** hajotin. J.tê. vt. Lêxurrîn 1. **To lead .2. To drive.** يَقُودُ

Min hêster ajot. Te otombîl ajot.

\_ : n.j. verbal noun. **1.Lead, leading. 2.Drive driving.** قِيَادَةٌ

Ajotin a hêstiran ne asan e. Ajotin a otombîlan asan e.

**Akincîbûn:** j.tê. vi. Li warekê binecihbûn bo jiyânê. **To reside.**

يُقِيمُ، يَسْكُنُ

Şemal li Bamernê akincîbû.

\_ : n.j. verba noun. **Residing.** إِقَامَةٌ، إِسْكَانٌ

Akincîbûn a Şemalî li Bamernê , karek başbû.

**Alandin :** j.tê. vt. Lêpêçan. **To wrap, To wind** يُلَفِّ

Sînemê benik li tibl (til) a xu aland.

\_ : n.j. verbal noun **Wrapping(up).** لَفٌّ

Gulê gulolkek çêkir ji alandin a benkî.

Alandin a benkî li ser teşî yê asan e.

**Alizîn :** j.tên.vi. Li hev hatin alandin. **To complicate.** يَشْتَبِكُ

Davên me alizîn , nahên vedan.

\_ : n.j. verbal noun. **Complication.** اِشْتِبَاكٌ

Alizîn a davan, em gîrokirin ji ravkirinê (nêçîrê) vê spêdê.

**Alizandin:** j.tê.vt. Li hev alandin a bê serûber. **To complicate.** يُشَبِّكُ .

Behzadî dav alizandin şevêdî.

\_ : n.j. verbal noun. **Complication.** تَشَابُكٌ

Alizandin a davan nêçîr a kewan têkda.

**Alîkdan** : j.tê vt. Xuarin dan a ajelî. **To feed, to fodder.** يُعَلِّفُ، يُطْعِمُ  
Sêvê hesp alîkdan şevêdî.

\_ : n.j. verbal noun. **Feed, fodder.** تَعْلِيفُ، إِطْعَامُ .  
Alîkdan a dewaran karê zelaman e.

**Alîstin** : j.tê. vt. xuarin bi ezmanî. **To lick.** يَلْعَقُ، يَلْحَسُ  
Seyî şîr alîst ji bîrsan. Se şîrî dialîse ji bîrsan.

\_ : n.j. verbal noun. **Licking.** لَعَقُ، لِحْسُ  
Alîstin a şîrî bi ezmanî li seyî xoştê(xoşdihê).

**Alozbûn** : j.tên. vi. Têkçûn, ser lê şêwan. **To become confused.**

يُتَحَيَّرُ، يَرْتَبِكُ

Nizar alozbû, dema gurg dîtî li pêşîya xu.

\_ : n.j. verbal noun. **Confusion.** حَيْرَةٌ، اِرْتِبَاكُ  
Alozbûn di demê tengavîyan de asayî ye.

**Alozkirin**: j.tê.vt. Têkbirin, ser lê şêwandin. **To become confused.**

يُحَيَّرُ، يُرْبِكُ

Bê diravîyê(pareyîyê) ez alozkirim. Destkurtîyê ez alozkirim.

\_ : n.j. verbal noun. **Confusion.** حَيْرَةٌ، اِرْتِبَاكُ  
Alozkirin a şagirdî di demê taqîkîrîne de, ne ke!

**Amadebûn**: j.tên.vi. Pêkhatin. **To get ready.** يَسْتَعِدُّ، يَتَحَضَّرُ

Qenco amede ye bo çûnê.

\_ : n.j. verbal noun. **ready.** حَاضِرٌ، مُسْتَعِدٌّ

Amadebûn a Zîne bo wexerê ne asan e ,çiku berçîçik şîr e.

**Amadekirin** : j.tê. vt. Pêkanîn(pêkînan). Lêkdan. **To be ready.**

يُهَيِّؤُ، يَسْتَعِدُّ

Rojî xu amadekir bo wexerê(oxerê).

\_ : n.j. verbal noun. **Readiness.** تَهْيِئَةٌ، اِسْتِعْدَادٌ

Amadekirin a zaroyan bo her karî ne asan e.

**Anîn** : J.tê. vt. Înan, hanîn, **To bring, to get.** يَجْلِبُ

Xorşîdî pênc bizin anîn ji gundî.

\_ : n.j. verbal noun. **Bringing, getting.** اِحْضَارٌ، جَلْبٌ

Anîn a celebek pezî ji gundî; karê şivanî ye.

**Arambûn:** j.tên.vi. Tenabûn, bêhinhatin. **To calm down, to quiet.**

يَصْبِرُ ، يَهْدُو

Ez arambûm dema şerê cîhanê bi dawî hafî.

\_ : n.j. verbal noun. **Quiet.** صَبْرٌ، هِدْوَةٌ.

Arambûn piştî şerî pêşveçûn e.

**Aramkirin** : j.tê. vt. Tenakirin , **To calm, to quieten.** يُصَبِّرُ، يَهْدِي.

Min zaro aramkirin da bikarin bixuînin.

\_ : n.j. verbal noun. **Quiet.** تَصْبِيرٌ، تَهْدِيَةٌ.

Aramkirin a zaroyan li şahîyan karek giran e.

**Arandin:** j.tê.vt.Harkirin. **To provoke, to excite.** يُغْضِبُ، يُثِيرُ.

Cangîrî stêng arandin pêr êvarî.

\_ : n.j. verbal noun. **Provocation, excitement.** إِغْضَابٌ، إِثَارَةٌ.

Arandin a stêngan karê zarokan e.

**Asanbûn** : j.tên.vi. Sanahîbûn. **To become easy.** يَسْهَلُ، يَهْوُنُ.

Fêrkirin a kurdî asanbû bi pîten(tîpên) latînî.

\_ : n.j. verbal noun. **Easy, simple.** هَيْئٌ، سَهْلٌ.

Asanbûn a fêrkirin a kurdî bi pîten latînî pêşveçûn e.

**Asankirin** : j.tê.vt.Sanahîkirin. **To make easy.** يُسَهِّلُ.

Pîten latînî fêrkirin a zimanê kurdî asankir.

\_ : n.j. verbal noun. **Easy.** تَبْسِيطٌ، تَسْهِيلٌ.

Asankirin a fêrbûn a zimanê kurdî serkevtin e.

**Aşgêran:** j.tê.vt. Aş dan karî. **To run the mill.** يُشَقِّلُ الطَّاحُونَةَ.

Hevalî deh roja aşgêra bo gundîyan.

\_ : n.j. verbal noun. **Running the mill.** تَشْغِيلُ الطَّاحُونَةِ.

Aşgêran karek asan e.

**Aştbûn:** j.tên.vi. Pêkhatin. **To establish peace.** يَتَّصَلِحُ.

Partî û Yeketî aştbûn ji dil.

\_ : n.j. verbal noun. **Peace** صُلْحٌ.

Aştbûn a her du partîyan dilê me kurdan xoşkir.

**Aştkirin** : j.tê.vt. Pêkanîn (pêkînan) **To reconcile** مُصَالِحٌ.

Emrîka Partî û Yeketî aştkirin.

\_ : n.j. verbal noun **Reconciliation** مُصَالِحَةٌ.

Aştkirin a Partî û Yeketî li ser destê Emrîka çêbû.

**Avabûn:** J.tên.vi. ١. To build. **يَبْنِي، يَبْنِي**. ٢. To set, to sink. **يَغِيبُ**  
 1. Gund êt kavi avabûn ve.  
 2. Roj avabû; garan vege ra bo gundî.  
 \_ : n.j. verbal noun. 1. build. **تَشْيِيد** 2. going down. **اِخْتِفَاء**, **غِيَاب**  
 1. Avabûn a gundan ne karek asan e.  
 2. Avabûn a rojê(xorê)nîşan a şevê ye.

**Avakirin:** j.tê.vt. To build. **يُشِيدُ**  
 Gundîyan gundên xu avakirin.  
 \_ : n.j. verbal noun. build. **بِنَاء**, **تَشْيِيد**  
 Avakirin a gundan gundî pêrabûn.

**Avadanbûn:** j.tên.vi. Mirov çûn navda. **To lodge, to accommodate**  
**يَأْوِي، يُسْكِنُ**  
 Gund ên wêran hatin avakirin; paşî avadanbûn.  
 \_ : n.j. verbal noun. **Lodging, accommodation.** **اِسْكَان**  
 Avadanbûn a gund ên kê m av ne asan e.

**Avadankirin:** j.tê.vt. Mirov birin navda. **To belodged, to accommodate.** **يُسْكِنُ**  
 Gund ên nû hatin avakirin, hatin avadankirin.  
 \_ : n.j. verbal noun. **lodge, accommodation.** **اِسْكَان**, **اِسْكَان**  
 Avadankirin a gund ên nû hatin avakirin, hat kirin.

**Avdakevtin:** j.tê. vt. Avkêmbûn, avdabezîn. **To decrease water.**  
**يُنْخَفِضُ الْمَاءَ**  
 Havîne av dadikevin û canca çikdibin (hişkdibin).  
 \_ : n.j. verbal noun. **water decrease.** **اِنْخِفَاضُ الْمَاءِ**  
 Avdakevtin a rûbaran li havînan berçav e.

**Avdan:** j.tê.vt. Av gehandê, dan ber avê, awdan. **To irrigate.** **يُرْوِي**  
 Rezvan heftî yê carekê bîstanî avdide.  
 \_ : n.j. verbal noun. **irrigation.** **اِرْوَاء**  
 Avdan a bîstanî karê rezvanî ye.

**Avdêran:** j.tên.vi. Av jê hatin. **To ooze, to leak.** **يَنْضَحُ، يَتَرَشَّحُ**  
 Denê me yê avê avdêrîn e. Hemû den avdêrîn in.  
 \_ : n.j. verbal noun. **oozing, leakage.** **رَشْح، نَضْح**  
 Avdêran ji gozikan bi şevê avê sardike.



**Avdêrandin**: j.tê.vt. Av jê çûn. **To ooze, to leak.** يُنْضِجُ، يَرشَحُ

Gozikê me, avê kê m didêrîn e.

\_ : n.j. verbal noun. **ooze, oozing, leak, leakage.** رَشْحُ، نَضِجُ

Avdêrandin ji denan, denan kerx nake.

**Avêjtin (avêtin)**: j.tê. vt. Ji xu dûr kirin, firêdan. **To throw.** يَرْمِي

Berevanî berek avêt kêlê, lê neda.

\_ : n.j. verbal noun. **throwing.** رَمٌ

Avêjtin a cilkan hîbûn e li Swîdê.

**Avgêran**: j.tê.vt. Avê dide têhnîyan, **To distribute water.** يُوزَعُ الْمَاءُ

Şemalî avgêra di şahî ya bira yê min de.

\_ : n.j. verbal noun. **water distribution.** تَوَزِيعُ الْمَاءِ

Avgêran di şahîyan de harîkarî ye.

**Avgirtin**: j.tê.vt. Avrawestandin. **To enclose water.** يُحْبَسُ الْمَاءُ

Behzadî avgirt ji bîstanî, bîstan hişik kir.

\_ : n.j. verbal noun. **water enclosure.** اِحْبَاسُ الْمَاءِ

Avgirtin ji ser bîstanan karê neyaran e.

**Avisbûn**: j.tên.vi. Tişt bûn. Bergirtin. **To become pregnant.** يَحْبَلُ

Çêl a Bapîrî avis e. Sê çêl ên me avisbûn îsal .

\_ : n.j. verbal noun. **pregnancy.** حَمْلٌ، حَبْلٌ

Avisbûn a kitikan dikeve heyv a şubatê.

**Aviskirin**: j.tê.vt. Zik pirr kirin, bi tiştê xistin. **to make pregnant.** يُحْبَلُ

Gayekê çêlek aviskir li garanê.

\_ : n.j. verbal noun. **pregnancy.** حَمْلٌ، حَبْلٌ

Aviskirin a mehînan bi harîkarî ya mirovan çêdibe.

**Avjêçûn** : j,tên. vi. Dêrandin. **To ooze, to leak.** يَنْزُ، يَسْرِبُ

Denê çayxanê kê m avjêdiçe.

\_ : n.j. verbal noun. **oozing, leakage.** نَزٌّ، تَسْرِبٌ

Avjêçûn ji denên kerx kê m e.

**Avkêşan**:j.tê.vt. Avguhaztin. **To draw water, to carry water**

يَنْقُلُ الْمَاءَ, يَسْحَبُ الْمَاءَ

Jinikan avkêşa bo savar kelandinê duhî. Me av ji bîrê kêşa.

\_ : n.j. verbal noun. **drawing water, carrying water**. نَقْلُ الْمَاءِ

Avkêşan karê jinikan e li gundan.

**Avlêkirin**:j.tê.vt. Av avêtinê, av lê barandin. **To spray water**. يَرْشُ

بِالْمَاءِ

Nemam ên te çandin çirmisîn, avêlêbike.

\_ : n.j. verbal noun. **spraying water**. رَشٌّ بِالْمَاءِ

Avlêkirin a herroj li nemam ên nû çandî, pêdivê ye.

**Avrabûn** : j.tên. vi. Lafaw **to flood**. يَفِيضُ الْمَاءَ

Serêbiharê li kurdistanê avradibin.

\_ : n.j. verbal noun. flood. فَيْضَانُ

Avrabûn a rûbaran her sal li meh a nîsanê çêdibe.

**Avsarbûn** : j.tên. vi. Avtezîbûn. **To cool water**. يَبْرِدُ الْمَاءَ

Ziviztanav av ên rûbaran sardibin.

\_ : n.j. verbal noun. **cooling water** بَرْدُ الْمَاءِ

Avsarbûn ziviztanav karek asayî ye.

**Avsarkirin** : j.tê. vt. avtezîkirin. **To cool water**. يَبْرِدُ الْمَاءَ

Havînan em pêdivêyî avsarkirinê ne bo vexuarinê.

\_ : n.j. verbal noun. **cooling water**. تَبْرِيدُ الْمَاءِ

Avsarkirin li havînan karê tezîkerê ye.

**Avşêlîbûn** : j.tên.vi. Avpîsbûn, avgêlbûn. **To muddy water**.

يَتَعَكَّرُ الْمَاءَ

Baran barî avşêlîbû li celalan.

\_ : n.j. verbal noun. **muddy**. عَكْرُ الْمَاءِ

Avşêlîbûn a rûbar ê gundî salê carekê ye.

**Avşêlîkirin** : j.tê vt. Avpîskirin, avgêlkirin. **To muddy water**.

الْمَاءُ يُكَدَّرُ

Barîn a baranê avşêlîkir li celalê gundî.

\_ : n.j. verbal noun. **muddy**. تَكْدِيرُ الْمَاءِ

Avşêlîkirin bi barîn a baranê çêdibe.

**Avtêçûn** : j.tên. avê didêrîne, av xu têda nagire. **To leak water.**

يَتَسَرَّبُ الْمَاءُ

Me meşk a avê guhorî, çiku avtêdiçû.

\_ : n.j. verbal noun. **leaking water.** تَسَرَّبُ الْمَاءِ

Avtêçûn ji meşkê, meşkê ji kardiêxe.

**Avzan** : j.tê. vt. Derhatin a avê ji erdê. **To spring, to well.** يَنْبَعُ الْمَاءُ

Xak a kurdistanê cihê avzanê ye.

\_ : n.j. verbal noun. **spring, source.** نَبْعُ الْمَاءِ

Avzan li dorê gundê me kême.

**Avzêrkirin** : j.tê.vt.kiraskirin bi zêrî.**To gild.** يَطْلِي بِالذَّهَبِ

Zincîr a sto yê Ciwanê avzêrkirî ye;ne zêr e.

\_ : n.j. verbal noun. **gilding.** طَلْيُ الذَّهَبِ

Avzêrkirin karê zêringirî ye.

**Awarebûn** : j.tên. vi. Koçbûn, derbederbûn. **To tramp.** يَتَشَرَّدُ

Gelek gundî di enfal a reş da awarebûn.

\_ : n.j.verbal noun.**homlêssnêss, vagrancy.** تَشَرَّدُ

Awarebûn a gundî yên kurd,Sedam husên hobarbû.

**Awarekirin** : j.tê. vt. koçkirin, derbederkirin. **To tramp.** يُشَرَّدُ

Be, isîyan gundî yên kurd awarekirin.

\_ : n.j.verbal noun. **homlêssnêss, vagrancy.** تَشَرَّدُ

Awarekirin a gundî yên kurd, Rijêm a Be, is pê rabû.

**Axavtin** : j.tê. vt. peyivîn, **to speak, to talk.** يَتَكَلَّمُ

Sînemê ligel deyk a xu axavt, da li bira yê wê bibor e/it.

\_ : n.j. verbal noun. **speaking, talking.** تَكَلَّمَ

Axavtin a Narînê û deyk a wê li ser şûkîrîne(şûkîrîne) bû.



## B

**Bacdan** : j.tê. vt. xuîkdan. **To pay tax.** يَدْفَعُ الضَّرِيْبَةَ

Ez her sal bac a hatê didim.

Divê her mirovek xudan hat; bacê bide.

— : n.j. verbal noun. **paying tax.** دَفْعُ الضَّرِيْبَةِ

Bacdan serfirazî ye û jê revîn şermizarî ye.

Lawê kurd ji bacdanê ne reve.

**Bacwergirtin**: j.Tê.vt. xuîkwergirtin. **To get tax, to receive tax.**

يَسْتَلِمُ الضَّرِيْبَةَ

Bacwergir bacê werdigire.

— : n.j. verbal noun. **getting tax, receiving tax.** اِسْتِلَامُ الضَّرِيْبَةِ

Bacwergirtin karê bacwergirî ye.

**Backomkirin**: j.tê.vt.xuîkkomkirin. **To gather tax, to collect tax.**

يَجْمَعُ الضَّرِيْبَةَ

Gundîyan backomkirin bo bacwergirî.

— : n.j. verbal noun. **gathering tax, collecting tax.** جَمْعُ الضَّرِيْبَةِ

Backomkirin li gundan harîkarî ye bo bacwergirî.

**Badan** : j.tê.vt. 1.ristin. **To spin.** يَغْزُلُ . 2.zivirandin. **To turn.** يُدَوِّرُ

1. Teşî davan badide.

2. Narînê xu bada gêjbû.

— : n.j. verbal noun. 1. **Spinning.** 2. **Turning.** 1. غَزْلُ 2. دَوْرَان

1. Badan rîsî dike benik bo çinînê.

2. Badan serê zarokan gêjdike.

**Bangdan** : j.tê.vt. Gazîkirin bo nivêjê. **To call out to pray.** يُؤَدِّنُ

Melayê spêdê bangda, gundî çûn bo mizgeftê.

— : n.j. verbal noun. **calling out to pray.** اِذَانٌ

Bangdan a spêdê gundî hişyarkirin ji xewê.

**Bangêran:** j.tê.vt. Bagurdan bi ser banî ra înan û birin. **To roll the roof.** يَحْدِلُ السَّطْحَ.

Berî baran barînê gundîyan bangêran.

\_ : n.j. verbal noun. **rolling the roof.** حَدْلُ السَّطْحِ  
Bangêranê gundî ji dilopan paraztin.

**Bangkirin** : j.tê. vt. Xuaztin. **To invite.** يَعْزُمُ، يَدْعُو

Bijarî hemî heval û hogir bangkirin bo şahî ya xu.

\_ : n.j. verbal noun. **inviting.** عَزْوَمُهُ، دَعْوَةٌ  
Bankirin a heval û hogiran bo şahî yê dilê wan xoşkir.

**Banqutan:** j.tê vt. Şuînik li banî dan. **To knock the roof.** يَدُقُّ

السَّطْحَ

Hin kesan banqutan, berî baran barînê.

\_ : n.j. verbal noun. **knocking the roof.** دَقُّ السَّطْحِ  
Banqutanê dîwar ji avpêdaçûnê paraztin.

**Barandin** : j.tê. vt. Av havêtinê, av lêkirin. **To spray, to sparge.**

يَنْهَمِرُ، يَرْشُ

Seyranê av li nanî barand da nerimbib/e/it.

\_ : n.j. verbal noun. **spray.** رَشٌّ، انْهَمَارٌ  
Av barandin li nanê tîrê yê req bo nerimbûnê ye.

**Barîn** : j.tên. vi. Av ji bilindî yê hatin. **To rain.** يَمُطِرُ

Baran barî, di rê ya gundî de, cil ên me terkirin.

\_ : n.j. verbal noun. rain, **raining.** مَطَرٌ، انْهَمَارٌ  
Barîn a baranê ne hêla em biçin bo seyranê.

 \_ :n.j.verbal noun. **Prevention.** مَنَعَ .  
 Qedexekirinê rê ya Israîlê li Iraqîyan girt.
- Qedirgirtin:** J.tê.vt. Rêzgirtin. **To tend.** يُرَاعِي، يَحْتَرِمُ .  
 Kurd qedirgirin bo mirovên biyanî.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Tendance.** رِعَايَة، إِحْتِرَامُ .  
 Qedirgirtin a biyanîyan karek başe.
- Qefandin:** j.tê.vt. Rawestandin. **To stop.** يُوقِفُ .  
 Kelekvanî kelek li Pêşxabûrê qefand.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Stop.** تَوَقَّفَ، تَوَقَّفَ .  
 Qefandin a kelekê li Pêşxabûrê bo bêhin vedanê bû.
- Qefilandin:** j.tê.vt. Sirêbirin. **To benumb.** يَتَخَدَّرُ مِنَ الْبَرْدِ .  
 Bagerê rêving qefilandin li Şeraşê.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Tingle.** خَدِرٌ، تَخَدَّرُ .  
 Qefilandin a bagerê rêvingan dimirîne.
- Qefilîn:** j.tên.vi. Gocbûn, pekkevtin. **To tingle.** يَتَخَدَّرُ .  
 Rêving qefilîn ji ber bagerê.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Tingle.** تَخَدَّرُ .  
 Qefilîn a rêvingan kerwan da rawestandin.

- Qelemkirin:** j.tê.vt. 1.Kezaxtin. **To clip.** يُقْلَمُ  
 2.Rêkxistin. **To arrange, To dress** يُوَضَّبُ  
 1.Me mêw qelemkirin li heyv a subatê.  
 2.Ciwanê pirç a xu qelemkir bo dawetê.  
 \_ :n.j.verbal noun. 1.**Clipping.** تَقْلِيمُ . 2.**Arrangement.** تَوْضِيْبُ  
 1.Bi qelemkirinê mêw xemilîn.  
 2.Bi qelemkirinê pirç ciwanbû.
- Qelewbûn:** j.tên.vi. Goştgirtin., **To plump, To fatten.** يَسْمَنُ .  
 Çîmen qelewbû,çiku zor xuarin dixuar.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Plump, fattiness.** سِمِن .  
 Qelewbûnê Çîmen kirêtkir.
- Qelewkirin:** j.tê.vt. Dabestkirin. **To plump, To fatten.** يُسَمِّنُ .  
 Me du berx qelewkirin bo dawetê.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Plump.** تَسْمِيْن .  
 Qelewkirinê bihayê berxan girankir.
- Qemandin:** j.tê.vt. Sotin. **To burn.** يُحْرِقُ خَفِيْفًا .  
 Dulberê kirasê xu qemand bi dana agirî.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Burn.** حَرْقُ خَفِيْفٍ .  
 Qemandinê kiras da havêtin(avêtin).
- Qerimandin:** j.tê.vt. 1.Westandin. **To tire.** يُتْعَبُ  
 2.Qefilandin. يُخَدَّرُ، يُبْرَدُ  
 1.Te zaro qerimand bi rêveçûnê.  
 2.Barîn a befrê rêving qerimand.  
 \_ :n.j.verbal noun. 1.**Tiredness.** تَعَبٌ . 2.**Tingle.** خَدْرٌ مِنَ الْبَرْدِ.  
 1.Qerimandinê Kejo vehêla ji hevalan.  
 2.Qerimandnê rêving êxist nav nivînan.
- Qerimîn:** j.tên.vi. 1.Westan. **To become tired.** يَتْعَبُ  
 2.Qefilîn. **To tingle.** يَتَخَدَّرُ مِنَ الْبَرْدِ .  
 1.Ez qerimîm heta biser zuîrî kevtim.  
 2.Dest û pê yên Merdanî qerimîn ji çûn a ser befrê.  
 \_ :n.j.verbal noun. 1.**Tiredness.** تَعَبٌ . 2.**Tingle.** خَدْرٌ ، بَرْدٌ  
 1.Ji qerimînê du roja min bêhin veda.  
 2.Ji qerimînê du roja min ne şiya,ez li ser piyan rawestim.



**Qerzdan:** j.tê.vt. Deyndan. **To pay loan.** يَدْفَعُ الدَّيْنَ .

Dema Beyarî Qerz xuaztî,min qerzda yê.

\_ :n.j.verbal noun. **Paying loan.** دَفْعُ الدَّيْنِ .

Qerzdanê hizra min tenakir.

**Qerzkirin:** j.tê.vt. Deynkirin. **To borrow.** يَسْتَدِينُ .

Darî sed dînar ji min qerzkirin.

\_ :n.j.verbal noun. **Borrowing.** اِسْتِدَانَةٌ .

Qerzkirin a xizman dilêşî ye.

**Qesekirin:** j.tê.vt. Axavtin. Peyivîn. **To talk.** يَتَكَلَّمُ .

Azadî Serbest dît û ligel Qesekir.

\_ :n.j.verbal noun. **Talking.** تَكَلَّمَ .

Qesekirin li dîwanxanan karê rewşenbîran e.

**Qewartin:** j.tê.vt. Kolan ji navda. **To dig.** يَحْفَرُ مِنَ الْبَاطِنِ .

Benavê khulind qewartin bo dolman.

\_ :n.j.verbal noun. **Dig.** حَفَرَ مِنَ الْبَاطِنِ .

Qewartin a khulindan bo dolman karê kabanîya ne.

**Qewyatîkirin:** j.tê.vt. Daxuazkirin. **To recommend.** يُوصِي .

Babê gelek qewyatîkirin li kurê xu,dema wexerkerî.

\_ :n.j.verbal noun. **Recommendation.** تَوْصِيَةٌ .

Qewyatîkirin bargiranî ye bo wexerkerî.

**Qijbûn:** j.tên.vi. Gijbûn, Belavbûn. **To scatter.** يَتَّبَعَثُ .

Pirça min qijbû,dema ez ji xew rabûm.

\_ :n.j.verbal noun. **Scatter.** تَبَعَثَ، بَعَثَ .

Qijbûn a pirçê gulê kirêtkir.

**Qijkirin:** j.tê.vt. Gijkirin. Belavkirin. **To scatter.** يُبْعَثُ .

Hin kiçik pirç a xu qijdikin bo ciwanîyê.

\_ :n.j.verbal noun. **Scatter.** بَعَثَ .

Çu ciwanî di qijkirin a pirçê de nîye.

**Qiran:** j.tê.vt. Qirhan, Şkestin, Wergeran. **To get broken.** يَنْكَسِرُ .

Dar sêvek me qira ji ber gelek sêv(ber)girtinê.

\_ :n.j.verbal noun. **Brokenness.** اِنْكَسَارٌ، تَكَسَّرَ .

Qiran a darsêvê dilê me ne xoşkir.

**Qirandin:** j.tê.vt. Şkandin, Wergerandin. **To break.** يُكسِّرُ .

Babelîskê du darhinar qirandin duhî.

\_ :n.j.verbal noun. **Breaking.** تَكْسِير، كَسْرُ .

Qirandin a darhinaran zaro giryandin.

**Qirbûn:** j.tên.vi. Biran(birhan). **To evanesce.** يُبَاد، يُفْنِي .

Gelek mirîşk qirbûn bi êşa mirîşkan.

\_ :n.j.verbal noun. **Evanescence.** إبادة، فناء .

Qirbûn a mirîşkan ji êşê çêbû.

**Qirkirin:** j.tê.vt. Birandin. **To annihilate.** يَبِيدُ، يُفْنِي .

Êş a mirîşkan mirîşk ên gundî qirkirin.

\_ :n.j.verbal noun. **Annihilation.** إبادة، فناء .

Qirkirin a mirîşkan ji êşê çêbû.

**Qîjandin:** j.tê.vt. Qîrandin. **To Shriek.** يَصْرُخُ .

Danî qîjand, çiku pişîkê leqek lêda.

\_ :n.j.verbal noun. **Shriek.** صُرَاخ .

Qîjandin a Danî ji êşandinê bû.

**Qîjqîjkirin:** j.tê.vt. Qîrqîrkirin. **To clamor.** يَصْخَبُ .

Darayî qîjqîjkir, çiku zilkêtkê pêveda.

\_ :n.j.verbal noun. **Clamor.** صَخَب .

Qîjqîjkirin a Darayî dirawse ji xewê hişyarkirin.

**Qîjvedan:** j.tê.vt. Qîrvedan. **To roar, To screech.** يَصْرُخُ .

Besê qîjvedan,dema dîtî kurê wê bi avê de çû.

\_ :n.j.verbal noun. **Roar, Screech.** صُرَاخ .

Ji encam a qîjvedanê hinkes çûn kurê Besê deranin ji avê.

**Qîrandin:** j.tê.vt. Qîjandin. **To shriek.** يَصْرُخُ .

Behzadî qîrand çiku se hat nikve.

\_ :n.j.verbal noun. **Shriek.** صُرَاخ .

Qîrandinê deyk agadarkir.

**Qîrîn:** j.tên.vi. Qijîn. **To shriek.** يَصْرُخُ .

Em di ber mal a Axayî ra borîn qîrîn ji malê dihat.

\_ :n.j.verbal noun. **Shriek.** صُرَاخ .

Qîrînê da zanîn ku Axa birîndar e.

**Qoçdanan:** j.t.vt. Serlêkdan. **To butt one another.** يَنْطَاحُ .

Du ga likozê(çerê) bişerhatin qoçdanan hevdu.

\_ :n.j.verbal noun. **Butt.** نَطَاحُ .

Qoçdanan a herdu ga gelek ne kêşa.

**Qoçlêdan:** j.tê.vt. Ser lêkdan. **To butt.** يَنْطَاحُ .

Du ga bi gayekê werhatin û qoçlêdidan.

\_ :n.j.verbal noun. **Butting.** نَطَاحُ .

Du ga bi qoçlêdanê gayek din êxistin.

**Qopyekirin:** j.tê.vt. Dizîn bi çavdêriyê. **To cheat.** يَعْشُ .

Mamhostayî du qutabî girtin qopyedikirin.

\_ :n.j.verbal noun. **Cheat.** عَشُ .

Qopyekirinê herdu qutabî paşêxistin.

**Qoqilandin:** j.tê.vt. Deranîn. **To pull out.** يَخْلَعُ .

Noşdarî çavê khore qoqiland, da çavek şîşe biêxit cihê wî.

\_ :n.j.verbal noun. **Pulling out.** خَلَعُ .

Bi qoqilandinê çav kirêt dib/e/it.

**Qulbûn:** j.tên.vi. kumbûn. **To be bored, To be pierced.** يَنْقَبُ .

Deling a şelê min qulbû bi agirê çaxarê.

\_ :n.j.verbal noun. **Bore.** نَقَبُ .

Qulbûn a deling a şelî,şel da havêtin.

**Qulkirin:** j.tê.vt. Kunkirin. **To bore.** يَنْقَبُ .

Agirê çaxarê deling a şelî qulkir.

\_ :n.j.verbal noun. **Bore.** نَقَبُ .

Me dîwar qulkir bo êryel ê televizyonê.

**Qumlêdan:** j.tê.vt. Firlêdan. **To sip, To sup.** يَرْتَشِفُ .

Kopê çayê,min du qumlêdan û min dana.

\_ :n.j.verbal noun. **Sip, sup.** ارْتِشَافُ .

Bi qumlêdanê çay dihê vexuarin.

**Qurmiçandin:** j.tê.vt. 1.Çirçbûn. **To wither.** يَذْبَلُ

2.gelviçandin. **To shrink.** يَنْكَمِشُ

1.Destikê(çepkey) gulan zû qurmiçî ji bê avî.

2.kirasê min bi şuştinê qurmiçî.

انكماش . 2.Shrinking. ذبول . 1.Withering. n.j.verbal noun.

- 1.Qurmiçandinê gul dan avêtin.
- 2.Qurmiçandin a kirasî ji şuştinê çêbû.

**Qutbûn:** j.tên.vi. 1.Neman. **To annihilate.** يُبَادُ

2.Ma bê kilk. **To lose the tail.** يَفْقُدُ الذَّنْبَ

- 1.Pênc hizar xelkê Helebçe qutbûn bi xaz a jehirkirî.
- 2.kilka rîvî qutbû bi telheyê.

n.j.verbal noun. 1.**Annihilation.** إبادة

2.**Losing the tail.** فَقْدُ الذَّنْبِ

- 1.Qutbûn a pênc hizar kesan bi xazê çêbû.
- 2.Qutbûn a kilka rîvî ji kevtin a telhê çêbû.

**Qutkirin:** j.tê.vt. 1.Nehêlan. **To annihilate.** يُبِيدُ

2.khundkirin. **To cut the tail.** يَقْطَعُ الذَّنْبَ

- 1.Xaz a jehirkirî pênc hizar kes qutkirin.
- 2.Telheyê kilk a rîvî qutkir.

n.j.verbal noun. 1.**Annihilation.** إبادة

2.**cutting the tail.** قَطْعُ الذَّنْبِ

- 1.Qutkirin a pênc hizar kesa ji xazê çêbû.
- 2.qutkirin a kilka rîvî ji telhê çêbû.

**Qûlbûn:** j.tên.vi. Kuîrbûn. **To become deeper.** يَعْمُقُ

Gorepan ji peqîn a bombekê qûlbû.

n.j.verbal noun. **Depth.** عُمُقُ

Qûlbûnê gorepan têkda.

**Qûlkirin:** j.tê.vt. Kuîrkirin. **To deepen.** يَعْمِقُ

Me çal qûlkir av jê derkevt.

n.j.verbal noun. **Depth.** عُمُقٌ، تَعْمِيقٌ

Bi qûlkirin a çalê av derkevt.

# R

**Rabordin:** j.tê.vt. Borandin. **To spend, to pass.** يَمْضِي وَقْتًا .

Min du kat ligel Azadî rabordin bi dan û standinê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Spending.** قِضَاءُ الْوَقْتِ .

Raborandin a du kata ligel Azadî Sûd jê hat wergirtin.

**Rabûn:** j.tên.vi. 1.Helsan. **To stand.** يَنْهَضُ

2.Reqbûn. **To erect.** يَنْتَصِبُ

3.Bû lafaw. **To Flood.** يَفِيضُ .

1.Ez rabûm ji cihê xu.

2.Gav a mîz a mindalî dihê kîrê wî radibe.

3.Xabûrê Zaxo rabû kerek ligel xu bir.

\_\_ :n.j.verbal noun. 1.**Standing.** نِهْوُضُ . 2.**Erection.** اِنْتِصَاب

3.**Flood.** فَيْضَان

1.Rabûn a min bo rêzgirtinê bû.

2.Rabûn a kîrê mindalî bo mîztinê bû.

3.Rabûn a xabûrî ji ber barîn a baranê bû.

**Radan:** j.tê.vt. 1.Bûn. **To give birth to.** يُولَدُ

2.Vedan alekê. **To remove.** يُزِيلُ .

1.Şengê duhî kurikek rada.

2.Min berik rada çiku pîsbibû.

\_\_ :n.j.verbal noun. 1.**Birth.** وِلَادَةٌ . 2.**Removal.** اِزْأَحَةٌ .

1.Bi radan a kurikî dilê Şengê xoşbû.

2.Bi radan a berikê mal baqijbû.

**Raêxistin:** j.tê.vt. Dana ser erdê. **To furnish.** يَفْرِشُ .

Me berik raêxist da mal gerim bib/e/it.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Furnishing.** فَرَشُ .

raêxistin a berkê mal gerimkir.

**Ragehandin:** j.tê.vt. Da zanîn. **To inform of, To report.** يُعْلِنُ، يُبَلِّغُ

Nûçegehanê, nûçeyên Siwîdê ragehandin ji Ktv.

\_.n.j.verbal noun. **Information, Report.** اِعْلَان، تَبْلِيغ، نَقْلُ .

Ragehandin a nûçeyan karê nûçegehanî ye.

**Ragirtin:** j.tê.vt. 1.vehêlan. **To delay.** يُؤَخِّرُ

2.Paşêxistin. **To save.** يَدَّخِرُ 3.Xu libergirtin. **To bear.** يَتَحَمَّلُ

1.Kerwanî xu ragirt ji ber rêgiran.

2.Alanî bîst dînar ragirtin.

3.Avanî xu ragirt li ber êş a birînê.

\_.n.j.verbal noun.1.**Delay.** تَأْخِيرُ .2.**Saving.** ادِّخَارُ

3.**Bearing.** تَحَمُّلٌ، صَبْرٌ

1.Ragirtin a kerwanî sûd gehahndê.

2.ragirtin a bîst dînara karek başbû.

3.Ragirtin a Avani li ber êşê, karek başbû

**Rahêlan:** j.tê.vt. Êrîşkirin. **To attack.** يَهْجُمُ .

Pêşmergeyan rahêlan serbazan û paşvebirin.

\_.n.j.verbal noun. **Attack.** هَجُومٌ .

Bi rahêlan a pêşmergeyan serbaz şkestin.

**Rahiştin:** j.tê.vt. Destpêkirin. **To begin, To start.** يَبْدُوْهُ بِعَمَلٍ .

Paleyên rahiştin dirûn a genimî.

\_.n.j.verbal noun. **Begining, starting.** بَدْءٌ بِعَمَلٍ .

Bi rahiştin a dirûnê dilê xudanê genimî xoşbû.

**Rakêşan:** j.tê.vt. Xuşandin. **To drag along.** يَسْحَلُ .

Zêbarî kelexê hespî rakêşa.

\_.n.j.verbal noun. **Drag along.** سَحْلٌ .

rakêşanê kelexê hespî dûrêxist.

**Rakirin:** j.t.vt. 1.xardan. **To run.** يَرْكُضُ 2.Revîn. **To escape.** يَنْهَازُ

3.Hilgirtin, bilindkirin. **To raise, To lift.** يَرْفَعُ .

1.Mindalan rakir heta serê zuîrî.

2.Baloyî rakir ji ber gurgî.

3.Me bar rakir dana ser piştê hêstirê.

\_.n.j.verbal noun. 1.**Running.** رِكْضٌ .2.**Escape.** اِنْهَازٌ .

### 3.Raising, lifting. رَفَع

- 1.Rakirinê Aram westand.
- 2.Rakirinê Dara qurtarkir.
- 3.Rakirin a barî du mirov pê rabûn.

**Rakişan:** J.tên.vi. 1.Dirêjbûn ser piştê. **To lie down.** يَضْطَجُ .

2.Derçûn. **to retreat, To withdraw.** يَنْسَجِبُ .

- 1.Qenco rakişa ser piştê li dîwanxanê.
- 2.Herdem rakişa ji kombûnê.

— :n.j.verbal noun. 1.**Lying down,** اضْطِجَاع

2.**Withdrawal, retreat.** اِنْسِحَاب

- 1.Rakişanê, Qenco da şermê li dîwanxanê.
- 2.Rakişan a Herdemî ji kombûnê kirêt bû.

**Rakişandin:** j.tê.vt. 1.dirêjkirin a ser piştê. **To lie.** يَضْطَجُ

2.Derkevtin,Hêlan. **To withdraw.** يَسْحَبُ .

- 1.Nazdarê zaroyê xu rakişand di landikê de.
- 2.Xebatî xu rakişand ji kombûnê.

— :n.j.verbal noun. 1.**Lie, lying down.** اضْطِجَاع

2.**Withdrawal** اِنْسِحَاب

- 1.rakişandin a zaroyê Nazdar pêrabû.
2. Rakişandin a Xebatî ji kombûnê şerim bû.

**Ramalîn:** j.tê.vt. Gêsikdan. **To drift.** يَجْرُفُ .

Xelatî befir ramalî ji banî.

— :n.j.verbal noun. **drift.** جَرْفُ .

Ramalîn a befrê ban ji dilopan rizgarkir.

**Ramûsan:** j.tê.vt. Maçîkirin. **To kiss.** يُقَبِّلُ .

Bijarî destê dê ya(diya) xu ramûsa.

— :n.j.verbal noun. **Kiss.** تَقْبِيلُ .

Ramûsan a destê diyê karê mirov ên başin.

**Raperîn:** j.tên.vi. 1.Serhildan. **To move suddenly and rapidly**

يَثُورُ، يَنْتَفِضُ

2.ciniqîn. **To frighten.** يَجْفَلُ

- 1.Xelkê Ranyayê raperîn roj a sêyî adar a sal a 1991-ê.
- 2.Arî ji xew raperî, çiku xewnek nexoş dît.

— :n.j.verbal noun. 1.**Uprising, Revolt.** اِنْتِفاضة، ثورة

2. **Fright.** جفول .

1. Bi raperînê ricêm hat derkirin ji Kurdistanê .

2. Raperînê Arî ji xewê hişyarkir.

**Raperandin:** j.tê.vt. 1. Karpêkînan. **To complete.** يُنجزُ العملُ

2. Ciniqandin. **To frighten.** يُفزعُ، يُجفلُ

1. Paleyan drûn a genimî raperand bi sê roja..

2. Xewn a nexoş zaro raperand ji xewê.

— n.j.verbal noun. Completeness. **أُنجازُ عملُ**

2. **Fright.** جفول .

1. Raperandin a drûn a genimî sê roja kêşa.

2. Raperandin a zaroyî ji xewê, dîtin a xewnek ne xoş bû.

**Rapêçan:** j.tê.vt. 1. Pêçan. **To roll up.** يَطوي، يُلْفُ

2. Derkirin. **To expel.** يَطْرُدُ

1. Karkerê mafor(xalî) rapêçan çiku germa hat.

2. Polîsî qereç rapêçan ji gundî.

— n.j.verbal noun. **Rolling up.** لَفًا، طوي. **Expulsion.** طرد

1. Rapêçan a maforan ji tirs a xêrikan bû.

2. Rapêçan a qereçan ji gundî polîs pêrabûn.

**Raspartin:** j.tê.vt. 1. Spartin. **To deposit, to entrust.** يُعهدُ به إلى،

يودعُ

2. Da çêkirin/xuaztin. **To order.** يُطلبُ، إيصاء، أوصى بـ

1. Min hizar dînar raspartin banqê. Guharê zarok raspart dayinekê bo xudankirinê.

2. Min du gîsk ên qelew raspartin ji kewal firoşî.

— n.j.verbal noun. 1. **depositing.** نيداع. 2. **Order.** طلب، توصية،

1. Raspartinê pare dan parastin û zaro dan xudankirin.

2. Raspartin a du gîskan karek baş bû min kirî.

**Rastbûn:** j.tên.vi. xuehrî lê neman. **To be straight.** يَعتدلُ .

Heta mar rastnebû, ne çû di kunê de.

— n.j.verbal noun. **Straightness.** إعتدال .

Rastbûnê hêla mar biç/e/it di kunê de.

**Rastderçûn:** j.tên.vi. Wekî wî bû. **To be right.** يَظْهَرُ صَوَابُهُ .

Gotin a Şivanî rastderçû.

— n.j.verbal noun. **Right.** ظْهَورُ الصَّوَابِ .

Rastderçûn a gotin a Şivanî ew neda girtinê.



**Rastgotin:** j.tê.vt. Direwnekirin. **To tell the truth.** يَقُولُ الصِّدْقَ .

Beyarî gotinek rastgot, me jê bawer kir.

\_ :n.j.verbal noun. **Telling the truth.** قَوْلُ الصِّدْقِ .

Rastgotinê Beyar kir xoştivîyê hemûyan.

**Rastîhevhatin:** j.tê.vt. Hevdudîtin. **To come across.** يَتَلَقَّوْا بِالصُّدْفَةِ

Cangîr û Simko rastîhevhatin di şerê cîhanê yê êkê da.

\_ :n.j.Verbal noun. **Comming across.** لِقَاءُ بِالصُّدْفَةِ

Rastîhevhatin a Cangîrî û Simkoyî xoş hilkevtin bû.

**Rastkirin:** j.tê.vt. Xuehrî lê nehêlan. **To straighten.** يُعَدِّلُ .

Marî xu rastkir da biç/e/it di kunê de.

\_ :n.j.verbal noun. **Straightness.** إِعْتِدَالٌ .

Bi rastkirinê mar zûtir çû di kunê de.

**Rateqan:** j.tên.vi. Kevtin kholanan. **To tramp.** يَتَشَرَّدُ .

Ji tirs a kîmya baranê gundî rateqan.

\_ :n.j.verbal noun. **Tramp.** تَشَرَّدٌ .

Rateqanê gundî paraztin ji mirinê.

**Rateqandin:** j.tê.vt. Berdan kholanan. **To tramp.** يُشَرِّدُ .

Tirsê gundî rateqandin li çol û beyaran.

\_ :n.j.verbal noun. **Tramp, Displacing.** تَشْرِيدٌ .

Rateqandinê gundî hêlan birsî.

**Ravkirin:** j.tê.vt. Nêçîrkirin. **To hunt.** يَصْطَادُ .

Mîrê botan heyvê carekê ravdikir ligel destek a xu.

\_ :n.j.verbal noun. **Hunting.** صَيْدٌ .

Ravkirin a Mîrê botan bo xoşîyê bû.

**Ravekirin:** j.tê.vt. Ruhinkirin. **To explain.** يُوضِّحُ، يَشْرَحُ .

Fêrkerî wate ravekir bo şagirdan.

\_ :n.j.verbal noun. **Ezplanation.** تَوْضِيحٌ، شَرْحٌ .

Ravekirin a wateyê,wate asankir bo şagirdan.

**Rawestan:** j.tên.vi. 1.Helsan. **To stand up.** يَنْهَضُ

2.Ne çûn. **To stop.** يَتَوَقَّفُ

1.Nebez rawesta,dema mamhosta hatî jorê.

2.Serbaz dibezi ji nişka ve rawesta.

تَوَقَّفُ .n.j.verbal noun. 1.Stand. نِهْوِضُ .2.Stop, stopping.

1.Rawestan a Nebezî dilê mamhostayî xoşkir.

2.Rawestan a Serbazî,Serbaz qurtarkir.

**Rawestandin:** j.tê.vt. 1.Helsandin. **To stand.** يُنْهَضُ

2.Nehêlan biçin. **To stop.** يُوَقِّفُ .

1.Me zaro rawestand bo bejin pîvanê

2.Me hêstir rawestand bo bêhin vedanê.

وقوف .n.j.verbal noun.1.Standing up. نِهْوِضُ ,2.Stopping.

1.Rawestandin a zarokî bo bejin pîvanê bû.

2.Rawestandin a hêstrê bo bêhin vedanê bû.

**Razan:** j.tên.vi. nivistin. **To sleep.** يَنَامُ .

Nefel raza çiku xewa wê dihat.

نوم .n.j.verbal noun. **Sleeping.** نَوْمٌ .

Bi razanê Nefel tenabû.

**Razandin:** j.tê.vt 1.Nivandin. **To put to sleep.** يُنَوِّمُ

2.Niwandin. **To adorn.** يُجَمِّلُ

1.Kewê şîr da kurê xu û razand.

2.Nesrînê xu razand û çû bo seyranê.

تنويم .n.j.verbal noun.1.Putting to sleep.

2.Adornment. تَجْمِيلٌ

1.Razandinê kurê Kewê tenakir.

2.Razandinê Nesrîn diyarkir li seyranê.

**Razîbûn:** j.tên.vi. Pejirandin. **To satisfy.** يَرْضَى .

Narê razîbû şû bi Behzadî bik/e/it.

رضاء .n.j.verbal noun. **Satisfaction.** رِضَاءٌ .

Razîbûn a Narê Behzadî pêxoşbû.

**Razîkirin:** j.tê.vt. Pejirandin. **To satisfy.** يُرْضِي .

Min şîya ez Bêrîvanê razîbikim,da şû bi Alanî bik/e/it.

رضاء .n.j.verbal noun. **Satisfaction.** رِضَاءٌ .

Razîkirin a Bêrîvanê ne sanahî bû.

**Remangirtin:** j.tê.vt. Rojîgirtin. **To fast.** يَصُومُ .

Hin kurdan remangirin hina rojîgirin.

صيام .n.j.verbal noun. **Fast.** صِيَامٌ .

Remangirtin pêncî rojin,rojîgirtin sî(sih) rojin.

**Renckêşan:** j.tê.vt. 1.xebatkirin. **To struggle.** يُكافِح، يُناضِلُ .

2.Zehmetkêşan. **To make miserable.** يَشْقَى

3.êşan. **To suffer.** يَتَأَلَمُ

1.Xort ên kurd renckêşan bo maf wergirtinê.

2.Çavşînî di rê ya serkevtinê de gelek renckêşan.

3.Brîndarê xencerê gelek renckêşan ta saxbû.

— :n.j.verbal noun. **1.Struggle.** كِفاح . **2.Misery.** شَقَاء

— :n.j.verbal noun. **3.Suffer.** أَلَم

1.Renckêşanê maf bi dest me ve înan.

2.Renckêşan, rê ya serkevtinê digire.

3.Renckêşan, birîndaran bê hîvî dike.

**Renggirtin:** j.tê.vt. Boyegirtin. **To be coloured.** يَتَلَوَّنُ .

Darê spîndarî zû rengîdigire.

— :n.j.verbal noun. **Colouring.** تَلْوِين، تَلْوِين .

Hemû reng bo renggirtinê başin, rengê reş tene.

**Rengkirin:** j.tê.vt. Boyekirin. **To colour.** يَلْوَنُ .

Me dergeh bi rengê spî rengkir.

— :n.j.verbal noun. **Colouring.** تَلْوِين .

Rengkirinê dergeh ciwankir.

**Repbûn:** j.tên.vi. Rabûn, reqbûn. **To stand erect.** يَنْتَصِبُ .

Heker kîrê zarokî repbû, bizane mîza wî dihê.

— :n.j.verbal noun. **Standing erect.** اِنْتِصَاب .

Kîr repbûn a zarokî nîşan a mîz hatinê ye.

**Repkirin:** j.tê.vt. Rakirin, reqkîrin. **To erect.** يَوَثِّرُ .

Kerî kîrê xu repkir da biç/e/it ser makerê.

— :n.j.verbal noun. **Erection.** تَوَثِير، اِنْتِصَاب .

Kîr repkîrin a kerî maker aviskir.

**Reqbûn:** j.tên.vi. Sextbûn. **To harden.** يَتَصَدَّدُ .

Xişt(libin) li ber hetavê reqbûn.

— :n.j.verbal noun. **Hard.** تَصَدَّدُ .

Reqbûnê xişt dan firotin.

**Reqkîrin:** j.tê.vt. Sextkîrin: **To harden.** يُصَدِّدُ .

Hetavê xişt reqkîrin.

— :n.j.verbal noun. **Hardness.** تَصَدُّد .

Reqkîrin a xiştan bi hetavê çêbû.

**Reşandin:** j.tê.vt. Barandin. **To spray, To scatter.** يَنْثُرُ، يَرْشُ

Me av li kirasî reşand berî otîkirinê.

\_ :n.j.verbal noun. **Spraying, Scattering.** نَثْر، رَشْ

Reşandin a avê li ser kirasî, kiras da otîkirin.

**Reşbûn:** j.tên.vi. Rengê reş girt. **To blacken, to black.** يَسْوَدُ .

Cang di xim a reş de, reşdib/e/it.

\_ :n.j.verbal noun. **Blackening, Blackness.** اسوداد .

Bi reşbûnê cang kirêt dib/e/it.

**Reşkirin:** j.tê.vt. Rengê wê kirin rengê reş. **To black.** يَسْوَدُ .

Xecê kiras ê xu reşkir, da zû pîsneb/e/it.

\_ :n.j.verbal noun. **Blackening.** تَسْوِيد .

Reşkirin a cangî, karê ximdarî ye.

**Revandin:** j.tê.vt. Bixurtî birin. **To snatch, To grab.** يَخْطَفُ .

Dizî bizinek revand ji govê.

\_ :n.j.verbal noun. **Snatch, Grab.** خَطْف .

Revandin a bizinê diz pêrabû.

**Revîn:** j.tên.vi. 1.Helatin. **To escape, To flee.** يَفْرُ

2.bezîn. **To be defeated.** يَنْقَلِبُ

1.Dema xudanê xanî hişyar bû,diz revî.

2.Kewê min di şerekewê de revî.

\_ :n.j.verbal noun. **Escape, flight.** 2.defeat. غلب، خسارة. فرار.

1.Revîn a dizî ji tirs a girtinê bû.

2.Revîn a kewî di şerekewê da bû.

**Rewîn:** j.tên.vi. Werrîn. **To yelp, To bark.** يَنْبَحُ، يَعوي .

Se rewî,dema diz hatî pezî.

\_ :n.j.verbal noun. **Yelping, Bark.** نباح، عوي، عواء .

Rewîn a seyî şivan ê bezî hişyarkir.

**Rexnegirtin:** j.t.vt. Şaşî dîtin. **To criticize, To find fault**

**with.** يَنْقَدُ

Zêbarî hin rexnegirtin li pirtûk a Şêrko Bêkesî.

\_ :n.j.verbal noun. **Criticism.** إنتقاد .

Rexnegirtin a Zêbarî durust bû.

**Rêbirrîn:** j.t..vt. Şelandin. **To commit in highway robbery** يقطع الطريق.

Hin qeçaxa rêbirrîn dikirin li gelîyê pisaxan.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Highway robbery.** قطع الطريق .

Rêbirrîn karê qeçaxan e.

**Rêdan:** j.tê.vt. Hêla biborit. **To make way for.** يفسح المجال .

Pirvanî rêda pezî bibor/e/it.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Making way for.** فسح المجال .

Rêdan a borîn a pezî, pirvan pêrabû.

**Rêgirtin:** j.t.vt. Şelandin. **To commit highway robbery.** يقطع الطريق

Par qeçaxekê rêgirt li gelîyê dihokê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Highway robbery.** قطع الطرق .

Rêgirtin karê qeçaxan e.

**Rêhindakirin:** j.tê.vt. Bezirbûn. **To stray.** يتيه .

Hin polîsa rêhindakirin li gelîyê Zaxo.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Straying.** تيه .

Rêhindakirin a polîsan sergêjî bo wan çêkir.

**Rêkkevtin:** j.tê.vt. Bûn hevkar, Pêkhatin. **To agree with.** يتفق .

Arî û Danî rêkkevtin da bazirganîyê pêkve bikin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Agreement.** إتفاق .

Rêkkevtin a Arî û Danî sergirt.

**Rêkxistin:** j.tê.vt. Pêkanîn. **To organize, To arrange.** يهيئ، ينظم

Azadî xanîyek kîrî û rêkxist bo nivîsîngehê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Organization, Arrangement.** تهيئة، تنظيم

Xanî bi rêkxistinê, bû nivîsîngehekî rêk û pêk.

**Rêlêgirtin:** j.tê.vt. Qedexekirin. **To prevent.** يمنع .

Bijarî viya hevrikî ya min bikit, min rêlêgirt.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Preventing.** منع .

Bi rêlêgirtin a min Bijarî hevrikî hêla.

**Rêtin:** j.tê.vt. Rijtin. **To pour out.** يسكب .

Çêlê bi piyê xu şîr rêt.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Pouring out.** سكب .

Rêtin a şîrî Zarok hêla bîrsî. Bi rêtin a şîrî zarok ma bîrsî.

**Rêzbûn:** j.tên.vi. Kevtin rex/pişt/ hev. **To line up, To align.** يَصْطَفُ

Qotabî rêzbûn; berî ji fêrgehê derkevin.

\_ :n.j.verbal noun. **Lining up, Align.** إِصْطَفَا .

Rêzbûn a qotabîyan rêk û pêkî êxist fêrgehê.

**Rêzgirtin:** j.tê.vt. Puîtepêdan. **To respect.** يَحْتَرُمُ .

Qotabîyan rêzgirtin bi rawestanê dema Fêrker hatî jorê.

\_ :n.j.verbal noun. **Respect.** إِحْتِرَام .

Rêzgirtin a qotabîyan dilê fêrkerî xoşkir.

**Rêzkirin:** j.tê.vt. Dan rex hev. **To line up, To align.** يَصْفُ .

Zêrevanî qotabî rêzkirin di fêrgehê de.

\_ :n.j.verbal noun. **Alignment.** إِصْطَفَا .

Bi rêzkirin a qotabîyan dilê fêrkerî xoşbû.

**Rêxoşkirin:** j.tê.vt. Şeqam bi ser û berkirin. **To pave.** يُعَبِّدُ الطَّرِيقَ

Karkeran rêxoşkirin bo şeranşê.

\_ :n.j.verbal noun. **Paver.** تَعْبِيدُ الطَّرِيقِ .

Rêxoşkirin a şeranşê dilê gundîyan xoşkir.

**Rijandin:** j.tê.vt. Riştin, Rêtin. **To pour, To spill.** يُسْكِبُ .

Karkeran qêr rijand ser rê bo rêxoşkirinê.

\_ :n.j.verbal noun. **Pouring.** سَكَب .

Bi rijandin a Qêrê li ser rêyê; rê xoşbû.

**Rikgirtin:** j.tê.vt. Nevîyan bikin. **To object to.** يَحْتَجُّ، يَعْتَرِضُ

Şemalî rikgirt, ne hêla babê wî wexerê bik/e/it.

\_ :n.j.Verbal noun. **Objection.** إِعْتِرَاض ، حَيْجَاج

Rikgirtin karê/ nezanan e/nezanî ye.

**Riswabûn:** J.tên.vi. Hetikçûn. **To be exposed.** يَنْفُضُ .

Mirov ên ne baş li pîrîyê riswadibin.

\_ :n.j.verbal noun. **Exposure.** فَضِيحَة .

Riswabûn a Bekoyî ji nebaşî ya wî bû.

**Riswakirin:** j.tê.vt. Hetikbirin. **To disgrace.** يَفْضَحُ .

Beko hat riswakirin li Cizîra Bota.

\_ :n.j.verbal noun. **Disgrace.** فَضَح ، فَضِيحَة .

Riswakirinê Beko da barkirin ji Cizîrê.

**Riştin:** j.tê.vt. Rêtin, rijandin. **To spill, To pour out.** يُرِيقُ، يَسْكَبُ .

Destê min bi şîşê çayê kevt çay rişt.

\_ :n.j.verbal noun. **Spilling, pouring out.** اِرَاقَةٌ، سَكَبَ .

Bi riştina çayê min çay venexuar.

**Rizandin:** j.tê.vt. Genîkirin. **To rot, To decay.** يُجَيِّفُ، يُعَفِّنُ .

Arî kêloyek goştî rizand,çiku ne kir di tezîkerê de.

\_ :n.j.verbal noun. **Rot, Decay.** جَيِّفَةٌ، عَفِنَ .

Bi rizandin a goştî,Arî mal hêla bê firavîn.

**Rizgarbûn:** j.tên.vi. Qurtarbûn. **To save.** يَنْقُذُ .

Şemdîn rizgarbû ji lafawê.

\_ :n.j.verbal noun. **Save.** اِنْقَاذٌ .

Rizgarbûn a Şemdînî dilê babê wî xoşkir.

**Rizgarkirin:** j.tê.vt. Qurtarkirin. **To rescue, To save.** يُنْقِذُ .

Şivanî berxek rizgarkir ji gurgî.

\_ :n.j.verbal noun. **Rescue, Save.** اِنْقَاذٌ .

Rizgarkirin a berxî dilê Şivanî xoşkir.

**Rizîn:** j.tên.vi. Genîbûn. **To stink, To rot.** يُنْتِنُ، يَتَعَفَّنُ .

Elektrîk hat birrîn goşt di tezîkerê de rizî.

\_ :n.j.verbal noun. **Stink Rot.** نَتْنٌ، تَعَفَّنَ .

Rizîne goşt da avêtin.

**Rîtin:** j.tê.vt. Gokirin. **To defecate. To evacuate.** يَنْعَوِّطُ .

Zaroyî îro sê cara rît.

\_ :n.j.verbal noun. **Defecation, Evacuation.** نَعْوَاطٌ .

Ji ber gelek rîtinê zaro birin nik noşdarî.

**Rojgirtin:** j.tê.vt. Roj xeyidîn. **To be eclipsed.** يَنْكَسِفُ الشَّمْسُ .

Dehî heyv a gulanê rojgirtin çêbû.

\_ :n.j.verbal noun. **Eclipse.** كَسُوفُ الشَّمْسِ .

Rojgirtinê cîhan tarîkir.

**Rojîgirtin:** j.tê.vt. Remangirtin. **To fast.** يَصُومُ .

Narîne îsal deh rojîgirtin ne pitir.

\_ :n.j.verbal noun. **Fast.** صِيَامٌ، صَامَ .

Rojîgirtin bo tenduristîyê başe.

**Rojîşkandin:** j.tê.vt. Remanşkandin. **To break the fast.** يَفْطُرُ .

Omêdî rojîşkand,çiku hilavêt.

\_ :n.j.verbal noun. **Fast breaking.** إِفْطَار .

Rojîşkandinê Omêd tenakir.

**Royîştin:** j.tên.vi. Çûn. **To go.** يَذْهَبُ .

Em royiştin bo Silêmanîyê.

\_ :n.j.verbal noun. **Going.** ذَهَاب .

Bi royiştin a gelek xuên(xûn,xuîn) pakdibe.

**Ruhinbûn:** j.tên.vi. 1.Baş hat zanîn. **To clarify.** يَتَوَضَّحُ .

2.Sivikbûn. **To dilute.** يَتَخَفَّفُ

1.Bi rojê dinya ruhindibe. Wate ruhindibe bi pêdaçûnê.

2.Heker tu gelek avê bikî nav mastî,dê ruhine/e/it.

\_ :n.j.verbal noun. 1.**Clarification.** تَوْضِيح. 2.**Dilution.** تَخْفِيف

1.Ruhinbûn a jorê ji xorê bû. Ruhinbûn a wateyê bi pêdaçûnê bû.

2.Ruhinbûn a mastî bi avtêkirinê çê bû.

**Ruhinkirin:** j.tê.vt.1.Baş da zanîn. **To clarify.** يُوَضِّحُ .

2.Sivikkir. **To dilute.** يُخَفِّفُ

1.Heyvê(Mangê) şev ruhinkir. Fêrkerî wate ruhinkir.

2.Avê mast ruhinkir.

\_ :n. j. verbal noun. 1.**Clarification.** تَوْضِيح. 2.**Dilution.** تَخْفِيف

2.**Dilution.** تَخْفِيف

1.Ruhinkirin a şevê bi şewq a heyvê bû.

Ruhinkirin a wateyê bi pêdaçûnê bû.

2.Ruhinkirin a mastî bi avê bû.

**Ruxandin:** j.tê.vt. Herifandin. **To destroy, to ruin.** يُدْمِرُ .

Serbaz ên Saddamî Avahîyek ruxandin.

\_ :n.j.verbal noun. **Destruction, ruination.** تَدْمِير .

Ruxandin a avahî dilê xudanî sot.

**Rûdan:** j.tê.vt. Hilkevîtin. **To occur, To happen.** يُصَادَفُ، يَحْدَثُ .

Çi ruda li gundî Aram?

\_ :n.j.verbal noun. **Occurrence, Event, Chance.** صُدْفَةٌ، حَدَثٌ .

Rûdanê gundî gêjkin.



**Rûgirjbûn:** j.tên.vi. navçav têkçûn. **To frown.** يَقْطُبُ، يَعْبَسُ .

Goran rûgirjdibe, dema Sîrwanî dibîne.

\_ :n.j.verbal noun. **Frown, frowning.** تَجَهُمُ، تَعْبِسُ .

Rûgirjbûn li Goranî diyaridibe, Dema Sîrwanî dibîne.

**Rûgirjkin:** j.tê.vt. Navçav têkbirin. **To knit.** يُجَهِّمُ يَعْبَسُ .

Dema Dijwarî Berevan dîtî rûlêgirjkin.

\_ :n.j.verbal noun. **frown, Frowning.** تَقْطِيبُ، عُبُوسُ .

Rûgirjkin a Dijwarî ne di cihê xu da bû.

**Rûniştin:** j.tên.vi. Daniştin. **To sit down.** يَجْلِسُ .

Beroj hat mal a me rûnişt ser doşkî.

\_ :n.j.verbal noun. **Sitting down.** جُلُوسُ .

Rûniştin a Berojî li ser doşkî lê xoşhat.

**Rûreşbûn:** j.tên.vi. Şerimkirin. **To be ashamed of.** يَخْجَلُ، يَنْدَمُ .

Zêrevan rûreşbû ligel mêhvanan.

\_ :n.j.verbal noun. **Ashamed.** خَجَلٌ، نَدَمٌ .

Rûreşbûn a Zêrevanî ligel mêhvanan ji desttengîyê bû.

**Rûreşkirin:** j.tê.vt. Dan şermê. **To ashame.** يُخْجَلُ، يُنْذَمُ .

Desttengîyê Bawer rûreşkir ligel mêhvanan.

\_ :n.j.verbal noun. **Ashame.** خَجَلٌ، نَدَمٌ .

Rûreşkirinê Bawer gêjkir.

**Rûsbûn:** j.tên.vi. Tazîbûn. **To disrobe.** يَتَعَرَّى .

Keleş rûsbû, Dema min dîtî.

\_ :n.j.verbal noun. **Disrobement.** تَعْرِيةٌ .

Rûsbûnê Keleş da şermê.

**Rûskirin:** j.tê.vt. Tazîkirin. **to disrobe.** يُعْرَى .

Cemşîdî xu rûskir bo ketinavê.

\_ :n.j.verbal noun. **Disrobment.** عَرَى .

Rûskirin a Cemşîdî bo ketinavê bû.

**Rûtbûn:** j.tên.vi. Hat şelandin. **To rob.** يَنْسَلِبُ .

Guhdar rûtbû li zînê tîrî, di rê ya Balîsanê de.

\_ :n.j.verbal noun. **Robbery.** سَلْبٌ .

Bi rûtbûnê Guhdarî gelek şerim kir.

**Rûtkirin:** j.tê.vt. Şelandin. **To rob.** . يَسْلُبُ  
Guhdar hat rûtkirin li Zînê tîrî.  
\_.n.j.verbal noun. **Robbery.** سَلْبٍ .  
Rûtkirinê Guhdar/ da şermê/hêla bê cilik.

## S

**Sarbûn:** j.tên.vi. Sardbûn, Tezîbûn, **To feel cold, To cool.** يَبْرُدُ  
Alanî sarbû, dema çakêt êxistî.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Feeling cold, coldness.** بَرْد .  
Dermanê sarbûnê rûniştin a ber agirî ye.

**Sarkirin:** j.tê.vt. Sarkirin, Tezandin. **To make cold.** يُبْرِدُ .  
Min çay sarkir; paşî min vexuar.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Cooling.** تَبْرِيد .  
Bi sarkirinê girar xoşdib/e/it.

**Sanahîbûn:** j.tên.vi. Asanbûn. **To ease.** يَسْهَلُ .  
Wate ya me îro xuandî sanahîbû.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Making easy.** سَهْوَلَة .  
Sanahîbûn a watayan ji xuandin a gelek e.

**Sanahîkirin:** j.tê.vt. Asankirin. **To facilitate.** يُسَهِّلُ .  
Fêrkerî wate sanahîkir bo me.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Facilitation.** تَسْهِيل .  
Bi sanahîkirin a wateyî, em baş têgehiştin.

**Saxbûn:** j.tên.vi. Çakbûn. **To recover, To get well.** يَبْرُؤُ، يَشْفَى .  
Avan bi dermaî saxbû.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Recovery.** شِفَاء .  
Saxbûn a Avanî dilê deyk a wî xoşkir.

**Saxkirin:** j.tê.vt. Çakkirin. **To make well, To cure.** يُشْفِي .  
Noşdarî Erdewan saxkir.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Cure, healing.** شِفَاء .  
Saxkirin a Erdewanî ji nesaxîyê, karek başbû.

**Sebirkêşan:** j.tê.vt. Xu ragirtin, Aramkêşan. **To take patience.**

يَتَحَمَّلُ

Behram derkirin ji karî;lê sebirkêşa.

\_.n.j.verbal noun. **Patience.** تَحَمُّلٌ .

Sebirkêşan a Behramî ew ji nesaxîyan parazt.

**Sebirkirin:** j.tê.vt. Xu libergirtin. **To be Patient.** يَتَحَمَّلُ .

Arî sebirkir heta gehişt daxuaz a xu.

\_.n.j.verbal noun. **Patience, Endurance.** تَحَمُّلٌ .

Sebirkirin a Arî karek baş bû.

**Sehobûn:** j.tên.vi. Sehwebûn, Şaşbûn. **To err, To make a mistake.** يَنْوَهُمْ ، يَسْهَى ، يَخْطُو

Min viya ez biçim bo malê;lê ez sehobûm, ez çûm bo bazarî.

\_.n.j.verbal noun. **Error, Mistake.** تَوَهُّمٌ ، خَطَأٌ .

Sehobûn baş bû bo min,çiku min şîr kirrî.

**Sehokirin:** j.tê.vt. Şaşkirin. **To be wrong.** يُوْهَمُ ، يُخْطِئُ .

Ez da çim bo Sêmêlê min sehokir ez çûm bo Dihokê.

\_.n.j.verbal noun. **Wrong, incorrect.** تَوَهُّمٌ ، خَطَأٌ .

Sehokirinê ne hêla ez biçim bo Sêmêlê.

**Semakirin:** j.tê.vt. Dawetkirin, Helperkandin. **To dance.** يَرْقُصُ .

Me li gundî semakir heya nîv a şevê.

\_.n.j.verbal noun. **Dancing.** رَقْصٌ .

Bî semakirinê tenduristî ya mirovî başdib/e/it.

**Sengandin:** j.tê.vt. Kêşan. **To weight.** يَنْقَلُ ، يَزِنُ .

Zêringirî guhar sengandin, derçûn du giram.

\_.n.j.verbal noun. **Weight, Heaviness.** نَقْلٌ ، وَزْنٌ .

Sengandinê biha da zanîn.

**Seradan:** j.tê.vt. Serveçûn. **To visit, To pay a visit.** يَزُورُ .

Gulê bêje seradan ne bêje seredan.

\_.n.j.verbal noun. **Visit.** زِيَارَةٌ .

Seradan a nesaxan pêdivê ye.

**Serlêberdan:** j.tê.vt. Paşguhîexistin. **To neglect, To omit.** يُهْمَلُ .

Serdarî hevalê xu serlêberda,çiku direwker bû.

\_.n.j.verbal noun. **Neglect.** إِهْمَالٌ .

Serlêberdan a heval ên ne baş pêwîst e.

**Serbestbûn:** j.tên.vi. Ji bin destîyê derçûn. **To be independent.**

يَسْتَقِلُّ، يَنْتَالُ الْإِسْتِقْلَالَ .

Miletê kurd nêzîke serbestbib/e/it.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Independence.** اِسْتِقْلَال .

Serbestbûn a milletê kurd daxuaza hemû kurda ne

**Serbestkirin:** j.tê.vt. derçûn ji bindestîyê. **To become**

**independent.** يَمْنَحُ الْإِسْتِقْلَالَ

Inglîzî Pakistan serbestkir di çerx a 21-ê de.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Independence.** مَنَحُ الْإِسْتِقْلَالَ، اِسْتِقْلَالَ .

Serbestkirin a Pakistanê di çerx a 21-ê de bû.

**Serbilindbûn:** j.tên.vi. Serberzbûn. **To rise high, To raise.**

يَتَرَفَّعُ، يَتَسَامَى

Em serbilindin bi naskirin a Serok Barzanî.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Raise.** تَرَفَّعُ، تَسَامَى .

Serbilindbûn a me bi naskirin a Serok Barzanî bû.

**Serbilindkirin:** j.tê.vt. Serberzkirin. **To raise.** يَرْفَعُ شَأْنَهُ .

Hevaletî ya we em serbilindkirin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Raise.** رَفَعَ الشَّأْنَ .

Serbilindkirin a me ji xuandinê çêbû.

**Serbirrîn:** j.tê.vt. Serjêkirin, Mirandin. **To murder.** يَذْبَحُ .

Serjêkerê pezî deh berx serbirrîn bo cejnê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Murdering.** ذَبَحُ .

Serbirrîn a pezî bo goştî bû.

**Serferazbûn:** j.tên.vi. Azadbûn. **To liberate from.** يَتَحَرَّرُ .

Piştî serhildan a sal a 1991-ê kurd serferazbûn.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Liberty.** تَحَرَّرُ .

Serferazbûnê kurd bo pêşvebirin.

**Serferazkirin:** j.tê.vt. Azadkirin. **To become liberated.** يُحَرَّرُ .

Barzanîyê nemir kurd serferazkirin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Liberation.** تَحْرِيرُ .

Serferazkirin a kurdan, kurd pêşvebirin.

**Sergêjbûn:** j.tên.vi. Serxoşbûn. **To be giddy.** يَدُوخُ .

Qehreman sergêjbû, dema mey vexuarî.

\_ :n.j.verbal noun. **Giddiness.** دُوخَة .

Sergêjbûn a Qehremanî ji vexuarin a meyê çêbû.

**Sergêjkin:** j.tê.vt. Serxoşkin. **To giddy.** يَدُوخُ .

Hevalan babê Segvanî sergêjkin bi meyê.

\_ :n.j.verbal noun. **Giddiness.** دُوخَة .

Sergêjkin a babê Segvanî heval pêrabûn

**Serhejandin:** j.tê.vt. Gotin ne! **To refuse.** يَرْفُضُ .

Gotin Danî were şîvê bixu! Danî serhejand.

\_ :n.j.verbal noun. **Refusal.** رَفْضُ .

Bi serhejandnê zanîn Danî ne birsî ye.

**Serhîlbûn:** j.tên.vi. Dîtin bo car a yekê. **To discover.** يَكْتَشِفُ .

Rojhelat û rojava ya Emrîka derya ne; Kolombos ê gemîvan di geranekê de serhîlbû bo yekem car.

\_ :n.j.verbal noun. **Discovering.** اِكْتِشَافُ .

Serhîlbûn a Emrîka, Kiristof kolombos pêrabû.

**Serhildan:** j.tê.vt. Raperîn. **To move suddenly and rapidly.**

يَنْطَلِقُ، يَنْتَفِضُ

Cemawerê Ranyayê, serhildan di sêyî adar a 1991-ê de.

\_ :n.j.verbal noun. **Uprising.** اِنْتِفَاضَة، ثَوْرَة .

Serhildanê kurdistan azadkir.

**Serincdan:** j.tê.vt. 1.Kuîr lê nêrrîn. **To examine carefully.** يَدْفُقُ

2.Dîtin, Bînîn. **To observe.** يَشَاهِدُ .

1.Pirtûk hat serincdan, berî çapkirinê.

2.Arî vîya peykerê Barzanî yê nemir serincbide.

\_ :n.j.verbal noun. 1.**Inspection.** تَدْقِيقُ . 2.**Observing.** مُشَاهَدَة

1.Pûtê bidin serincdan a pirtûkê!

2.Serincdan a Arî bo peykerî lê xoşhat.

**Serjêkirin:** j.tê.vt. Serbirrîn. **To slay, To slaughter.** يَذْبَحُ .

Darî berxek da serjêkirin bo mêhvanan.

\_ :n.j.verbal noun. **Slaying, Slaughtering.** ذَبْحُ .

Serjêkirin a berxî dilê mêhvanan xoşkir.

**Serkevtin:** j.tê.vt. Derçûn, bidestvehatin. **To succeed, To pass an examination.** يَفُوزُ، يَنْجَحُ.

Azad di berêkaneyê de serkevt. Arî di taqîkirinê de serkevt.

\_ :n.j.verbal noun. **Success, Prosperity.** فَوْز، نَجَاح .

Serkevtin xoş e di berêkaneyê de û di taqîkirinê de.

**Serkêşan:** j.tê.vt. Ajotin. **To lead, To drive.** يَقُودُ .

Danî suyar e li kerî û deyk a wî serîdikêşe .

\_ :n.j.verbal noun. **Lead, Driving.** قِيَادَة .

Serkêşan a kerî asan e.

**Serlêşêwan:** j.tê.vt. Nizanîn çibikin, man heyrî. **To hesitate.**

يَتَرَدَّدُ، يَحْتَارُ

Beyar di bersivdan a pirsekê de serlêşêwa.

\_ :n.j.verbal noun. **Hesitation.** حَيْرَة ، تَرَدُّد .

Serlêşêwan a Beyarî ji ber ne zanîn a bersivê bû.

**Serlêtêkçûn:** j.tên.vi. Ma heyrî. **To be confused.** يَرْتَبِكُ .

Nizarê şagird serlêtêkçû di taqîkirinê de.

\_ :n.j.verbal noun. **Confusion.** اِرْتِيَاك .

Serlêtêkçûn a Nizarî ji ber ne nivistinê bû.

**Serlêtêkdan:** j.tê.vt. Gêjkirin. **To confuse.** يُحِيرُ، يُرْبِكُ .

Sîrwan, mamê te, pîr e, serlêtêknedel!

\_ :n.j.verbal noun. **Confusing.** اِرْبَاك .

Serlêtêkdan a mamê Sîrwanî, Sîrwanî egerek pê hebû.

**Serlêxuran:** j.tê.vt. Wîstin, Viyan. **To desire.** يَشْتَاقُ، يَرْغَبُ .

Dîdarî serlêxura hespek kirrî.

\_ :n.j.verbal noun. **Desire.** اِشْتِيَاق، رَغْبَة .

Serlêxuranê hêla Dîdar hespî bikirr/e/it.

**Sermagirtin:** j.tê.vt. Persîvgirtin. **To be cold, To chill.** يَزْكُمُ، يَبْرُدُ .

Pesar mangê carekê sermadigir/e/it.

\_ :n.j.verbal noun. **Chill.** زُكَام، بَرْد .

Sermagirtin mirovî diêxe nav nivînan.

**Sernişîvbûn:** j.tên.vi. Serserkîwergeran. **To upset.** يَنْقَلِبُ رَأْسًا عَلَى عَقِبِ

Min kilk a pişikê bilindkir pişik sernişîvbû.

\_ :n.j.verbal noun. **Upset.** انْقِلَابَ رَأْسًا عَلَى عَقِبِ .

Bi sernişîvbûn a pişikê,pişikê newnewkir.

**Sernişîvkin:** j.tê.vt. Pêbilindkirin. **To overturn.** يُقَلِّبُ رَأْسًا عَلَى عَقِبِ

Arî khurî ya kitkê girt û kitik sernişîvkin.

\_ :n.j.verbal noun. **Overturn.** قَلْبًا عَلَى عَقِبِ

Bi sernişîvkinê, kitikê newnewkir.

**Sernixûnbûn:** j.tên.vi. wergeran li ser devî. **To overturn.** يَنْقَلِبُ عَلَى فَوْهَتِهِ

Qepaxk a qazanê sernixûnbû.

\_ :n.j.verbal noun. **Overturn.** قَلْبًا عَلَى فَوْهَتِهِ .

Bi sernixûnbûn a qepaxkê,qepaxk pîsbû.

**Sernixûnkin:** j.tê.vt. wergerandin. **To overturn.** يَقَلِّبُ رَأْسًا عَلَى فَوْهَتِهِ

Min qepaxk rakir û sernixûnkin.

\_ :n.j.verbal noun. **Overturn.** قَلْبًا رَأْسًا عَلَى فَوْهَتِهِ .

Sernixûnkin a qapaxkê ez pêrabûm.

**Serpoşîn:** j.tê.vt. Sergirêdan. **To cover (the head).** يُعْطِي الرَأْسَ .

Xunavê Serpoşî bi kulavek zêrkinî.

\_ :n.j.verbal noun. **Cover (of the head).** غِطَاءَ الرَأْسِ .

Serpoşîn a Xunavê gelek jêdihat.

**Serrastbûn:** j.tên.vi. Bawerîhatin. **To peace of.** يَطْمَئِنُّ .

Ez serrastbûm ku Şivanî direw nekir.

\_ :n.j.verbal noun. **Peace, Heartsease.** إِطْمِئِنَانٍ .

Serrastbûn a min, Şivan ji ber çav ên min ne êxist.

**Serrastkirin:** j.tê.vt. Bawerîkirin. **To assure.** يُطْمِئِنُّ .

Min Dilêr serrastkir,ku ez dê jinê bo wî xuzim.

\_ :n.j.verbal noun. **Assurance.** إِطْمِئِنَانٍ .

Serrastkirinê dilê Dilêrî xoşkir.



**Serşorbûn:** j.tên.vi. Şerimkirin. **To Be ashamed.** يَنْحَجِلُ .

Gulê serşorbû ji ber direw a wê kirî.

\_.n.j.verbal noun. **Shame.** حَجَلٌ .

Heftîyekê gulê ji malê dernekevt ji ber serşorbûnê.

**Serşorkirin:** j.tê.vt. Dan şermê. **To Shame.** يَحْجُلُ .

Direwê Gulê serşorkir.

\_.n.j.verbal noun. **Shame, Shyness.** حَجَلٌ .

Serşorkirinê Gulê nesaxkir.

**Serşûştin:** j.tê.vt. Ser bi av û sabûnê paqijkirin. **To bath.** يَسْتَحِمُّ .

Zînê serşûşt da biçit seyranê.

\_.n.j.verbal noun. **Bathing.** اسْتِحْمَامٌ .

Serşûştinê Zînê ciwankir.

**Sertêçûn:** j.tên.vi. Mirin. **To die.** يَمُوتُ، يَهْلِكُ .

Xemoyî sertêçû di rêgirîyê de.

\_.n.j.verbal noun. **Death.** مَوْتٌ، هَلَاكٌ .

Sertêçûn a Xemoyî di rêgirîyê de bû.

**Serûbinkirin:** j.tê.vt. Wergêran. **To turn over.** يَقْلِبُ .

Gulê nan serûbinkir li ser sêhlê da bihê birajtin.

\_.n.j.Verbal noun. **Turning over.** قَلْبٌ، تَقْلِيْبٌ .

Serûbinkirin a nanî li ser sêhlê ji ber birajtinê bû.

**Serveçûn:** j.tên.vi. Seradan. **To pay a visit to.** يَزُورُ .

Aram vegeza ji wexerê, Danî serveçû bo silavkirinê.

\_.n.j.verbal noun. **Visitation.** زِيَارَةٌ .

Serveçûn a Danî dilê Aramî xoşkir.

**Servehatin:** j.tên.vi. Çûn nik. **To frequent.** يَتَرَدَّدُ عَلَى .

Gizîrê gundî gelek mêhvan servedihên.

\_.n.j.verbal noun. **Frequentation.** تَرَدُّدٌ عَلَى .

Servehatin a mêhvanan Gizîr hejarkirin.

**Serxoşbûn:** j.tên.vi. Ereq vexuarin, Sergêjbûn. **To be drunk.**

يَسْكُرُ .

Şemdîn serxoşbû li şahîyê şevêdî.

\_.n.j.verbal noun. **Drunkenness.** سُكْرٌ .

Şerxoşbûnê Şemdîn nivand şevadî.

**Serxoşkirin:** j.tê.vt. Ereq danê, Gêjkirin. **To intoxicate.** يُسَكِّرُ .

Hevalan Bengîn serxoşkir li şahîyê pêr.

\_ :n.j.verbal noun. **Intoxication.** سُكْرٌ .

Bi serxoşkirinê Bengînê hilavêt.

**Sewzbûn:** j.tên.vi. Keskbûn. **To become green.** يَخْضَرُ .

Baran barîn zemîn sewzbû.

\_ :n.j.verbal noun. **Verdancy.** إِخْضِرَارٌ .

Sewzbûnê dûmen ciwankirin.

**Sewzkirin:** j.tê.vt. Keskkirin. **To become verdant.** يُلَوِّنُ بِالْأَخْضَرِ .

Barîn a baranan zemîn sewzkir.

\_ :n.j.verbal noun. **Verdancy.** إِخْضِرَارٌ .

Bi sewzkirin a zemînê seyran mişebûn.

**Seyrkirin:** j.tê.vt. Nêrrîn, Temaşekirin. **To look at, To see.** يَنْظُرُ إِلَى

Baş seyrbike hespî! berî tu bikirrî.

\_ :n.j.verbal noun. **Looking, Seeing.** نَظْرٌ، تَبَصُّرٌ .

Bi baş seyrkirinê min hesp kirrî.

**Silavkirin:** j.tê.vt. Silawkirdin. **To salute, To greet.** يُسَلِّمُ عَلَى .

Min Behroz dît di rê de û min silavkir ê.

\_ :n.j.verbal noun. **Salutation, Greeting.** سَلَامٌ عَلَى .

Silavkirin li dîwanxanan karek baş e.

**Silav vedan:** j.tê.vt. Silawvedan. 1. **To return greeting.** يَرُدُّ السَّلَامَ

2. Nivêj tewawkirin. **To finish the prayer.** يُنْهِي الصَّلَاةَ

1. Danî silavkir Arî, Arî silav veda.

2. Darî nivêjkir û silavveda.

\_ :n.j.verbal noun. 1. **Return greeting.** رَدُّ السَّلَامِ .

2. **Ending the prayer.** إِهْتِامُ الصَّلَاةِ

1. Silav vedan pêdivê ye.

2. Silav vedan a nivêjê fer e.

**Silbûn:** j.tên.vi. Torebûn. **To dispute.** يَتَنَازَعُ، يَتَخَاصِمُ .

Lezgîn û jin a xu silbûn ji hev.

\_ :n.j.verbal noun. **Dispute.** نِزَاعٌ، خِصَامٌ .

Silbûn karê zarokan e.

**Silkirin:** j.tê.vt. Torekirin. **To dispute.** يُنَازِعُ، يُخَاصِمُ .

Omêdî hevalê xu silkir.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Dispute.** نِزَاعٌ، خِصَامٌ .

Silkirin a hevalî ne başî ye.

**Simtin:** j.tê.vt. Kunkirin. **To punch, to hole, To bore.** يَنْقُبُ .

Salarî dîwar simt da borî ya avê têra bib/e/it.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Punching, Boring.** نُقُبٌ .

Simtin a dîwarî Salar pêrabû.

**Sirrêbirin:** j.tê.vt. 1.Qefilîn, Qerisîn. **To freeze.** يَنْجِمُدُ

2.mirin. **To die.** يَمُوتُ

1.Rêvingê şevê, sirrêbir û kevt xestexanê

2.Kulîlk ên rezî sirrêbirin.

\_\_ :n.j.verbal noun. 1.**Freeze.** إِنْجِمَادٌ . 2.**Death.** مَوْتٌ .

1.Sirrêbirinê rêving gelek êşand.

2.Sirrêbirinê kulîk ne hêlan.

**Sistbûn:** j.tên.vi. Şilbûn: **To loosen, To relax.** يَرْتَخِي .

Teng a kurtanê hêstirê sistbû û barê wê kevt.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Looseness.** إِرْتِخَاءٌ .

Kevtin a barî ji sistbûn a teng a kurtanî bû.

**Sistkirin:** j.tê.vt. Şilkirin. **To relax.** يُرَخِي .

Min teng a kurtanê kerî sistkir.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Relaxation.** إِرْخَاءٌ، تَرَخِي .

Bi sistkirin a teng a kurtanî, kurtan kevt(berbû).

**Sizabûn:** j.tên.vi. Cezabûn. **To be punished.** يَنْجَازِي .

Gurî sizabû, çiku av rişt ber derê malê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Punishment.** جَزَاءٌ .

Sizabûn a Gurî ji ber av rijtinê bû.

**Sizadan:** j.tê.vt. Cezadan. **To punish.** يُعَاقِبُ .

Dadgehê Gurî sizada ji ber av rijtinê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Punishment.** عِقَابٌ .

Sizadan li Gurî ne xoş hat.

**Sizakirin:** j.tê.vt. Cizakirin. **To Punish.** يَجْزِي .

Xemo hat sizakirin du cara evê heftîyê.

\_ :n.j.verbal noun. **Punishment.** جَزَاء، عِقَاب .

Bi sizakirinê Xemo pêveneçû.

**Sirîn:** j.tê.vi. Jêbirin. **To wipe, To rub, To clean.** يَمْحِي، يَمْسَحُ .

Alanî Textê reş sirî.

\_ :n.j.verbal noun. **Wiping, Rubbing, Cleaning.** مَحْو، مَسَح .

Sirîn a textê reş Alan pêrabû.

**Sîrdan:** j.tê.vt. Pivdan. **To incite.** يُحَرِّضُ عَلَى .

Behzadî Arî sîrda da şerê Sîrwanî bik/e/it.

\_ :n.j.verbal noun. **Incitement.** تَحْرِيط .

Sîrdanê Arî da Qutan bi destê Sîrwanî.

**Sîsbûn:** j.tên.vi. Spîvebûn. **To turn white.** يَبْيِضُ .

Kelgamêş sîsbû ji ber lawazbûnê.

\_ :n.j.verbal noun. **Whitening.** اِبْيَاضُ .

Sîsbûn a rengê Kelgamêşî ji kêma xuînîyê bû.

**Sîskirin:** j.tê.vt. Spîvekirin. **To whiten.** يُبْيِضُ .

Kêma xuînîyê rengê Kelgamêşî sîskir.

\_ :n.j.verbal noun. **Whitening.** تَبْيِيطُ .

Sîskirinê rengê Kelgamêşî kirêtkir.

**Solkirin:** j.tê.vt. Nalkirin. **To shoe a horse.** يَنْعَلُ .

Pîtanê solker hêstir a me solkir.

\_ :n.j.verbal noun. **Horseshoe.** تَنْعِيلُ .

Solkirinê sim ên hêstrê paraztin ji xuranê.

**Sondxuarin:** j.tê.vt. Navê Xudê înan. **To swear.** يَحْلِفُ .

Dizî li pêş dadwerî sondxuar, ku bizin nedizî ye.

\_ :n.j.verbal noun. **Swearing.** حَلْف .

Sondxuarinê diz ji dadkirinê qurtarkir.

**Sorbûn:** j.tên.vt. Renglêsobû. **To become red.** يَحْمَرُ .

Ruî yên Beyarî sorbûn ji şerman.

\_ :n.j.verbal noun. **Redness.** إِحْمَرار .

Sorbûn a ruîyan nîşan a şermê ye.

**Sorkirin:** j.tê.vt. Rengkirin bi sorî. **To redden.** يُحْمَرُ .

Gulê kirasê xu sorkir.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Redness.** إِحْمَار .

Bi sorkirinê kirasê Gulê ciwan bû.

**Sotin:** j.tê.vt. Agirberdanê. **To burn..** يَحْتَرِقُ، يُحْرَقُ

Panzînxane ya Koyê hat sotin. Min gûfang(guîfang) sot.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Burning.** حَرَق .

Sotinê ziyaneke mezin gehand panzînxaneyê.

**Spîbûn:** j.tên.vi. Sîsbûn. **To whiten.** يَبْيِضُ .

Rengê Avanî spîbû Ji tirsan.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Whitening.** تَبْيِض، بَيَاض .

Spîbûn a rengê Avanî ji tirsan bû.

**Spîkirin:** j.tê.vt. Sîskirin. **To whiten.** يَبْيِضُ .

Amanspîkerî aman spîkirin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Whitening.** تَبْيِض .

Spîkirinê aman nuîkirin.

**Standin:** j.tê.vt. 1.Wergirtin bizerî. **To overcome.** يَأْخُذُ بِالْقُوَّةِ

2.Dagîrkirin. **To take by force.** يَحْتَلُّ .

1.Rêgirî tîfek a Şemalî jê stand.

2.leşkerî sal a 1991-ê di meh a adarê de kerkûk stand.

\_\_ :n.j.verbal noun.1.**Overcome.** إِسْتِحْوَاذٌ عَلَى .2.**Capture.** إِحْتِلَال

1.Standin a tîfek a Şemalî,Şemal gêjkir.

2.Standin a Kerkûkê dilê kurdan xoşkir.

**Strangotin:** j.tê.vt. Strîn. **To sing.** يُغْنِي .

Erdewanî strangotin li Zaxoyê ji êvarî heta nîv a şevê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Singing.** غِنَاء .

Bi strangotinê Zaxoyî li Erdewanî kombûn.

**Stirîn:** j.tên.vt. Strangotin. **To sing.** يُغْنِي .

Eyas stirî ji êvarî heya nîv a şevê.

\_\_ :n.j.verbaênoun. **Singing.** غِنَاء .

Stirîn a Eyaşî dilê guhdaran xoşkir.

**Sunetkirin:** j.t.vt. Çermikê kîrî birrîn. **To circumcise.** يُخْتِنُ .  
Sunetker zarokan sunetdik/e/it.  
\_ :n.j.verbal noun. **Circumcision.** خْتَان .  
Sunetkirin paqijî ye,pêdivê ye bo zarokan.

**Supaskirin:** j.tê.vt. Malavakirin. **To thank.** يَشْكُرُ .  
Azadî mêhvandarî bo Botanî kir,Botanî ew supaskir.  
\_ :n.j.verbal noun. **Thank.** شُكْر .  
Supaskirinê Azad dil xoşkir.

**Suyarbûn:** j.tên.vi. Çûn têda/ serpişt a dewaran. **To ride.** يَرْكَبُ .  
Azad suyarbû li otomobîlê. Danî suyarbû li hêştirê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Ride.** رُكُوبُ .  
Suyarbûn a hêştirê li Danî xoşhat. Suyarbûn li tirênê xoşe.

**Suyarkirin:** j.tê.vt. Danan li ser pişt a dewaran. **To ride,** يَرْكَبُ عَلَى  
Botanî, Danî suyarkir li hêştirê. Azadî, Dîlan suyarkir li tirênê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Ride.** رُكُوبُ .  
Suyarkirin li hêştirê li Danî xoşhat. Suyarkirin li tirênê,  
Dîlanî pêxobû.

**Sûzdan:** j.tên.vi. Jivandan. **To promise.** يَبْعَثُ، يَعْهَدُ  
Min sûzda Şîrînê,ez çîrokê bo wê binivîsim.  
\_ :n.j.verbal noun. **Promise.** وَعْد، عَهْدُ  
Min sûzdan bicih anî ligel Şîrînê.

## Ş

**Şabaşdan:** j.tê.vt. Pare kirin diyarî. **To donate.** يَهَبُ نِقوداً .  
Hemî dawetîyan şabaşdan.  
\_ :n.j.verbal noun. **Donation.** مَنحة، هبة .  
Şabaşdan hîbûn e li dawetan.

**Şabaşwergirtin:** j.tê.vt. Diyarî wergirtin. **To take donation.** يأخذُ  
الهِبة  
Zirnabêjî şabaşwergirtin li dawetê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Taking donation.** أخذُ الهبة .  
Şabaşwergirtin li dawetan zirnabêj pêradib/e/it.

**Şahbûn:** j.tên.vi. Lêxoşhatin. **To be glad at.** يَسْرُ، يَفْرَحُ .  
Nizar şahbû bi derçûn a kurê xu.  
\_ :n.j.verbal noun. **Gladness.** سرور، فرح .  
Şahbûn a Nizarî bi derçûn a kurê wî bû.

**Şahkirin:** j.tê.vt. Dilxoşkirin. **To gladden, To cheer.** يُفْرِحُ .  
Min kurê xu şahkir bi kîrîn a otombîlekê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Gladness, Happiness.** سرور، فرح .  
Şahkirinê kurê min handa bo xuandinê.

**Şahîkirin:** j.tê.vt. Semakirin, Dawetkirin. **To dance.** يَرْقُصُ .  
Xortan şahîkir ji êvarî heta nîv a şevê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Dancing.** رَقِصُ .  
Şahîkirin werzişe,bo tenduristîyê başe.

**Şandin:** j.tê.vt. Hinartin, Nardin. **To send.** يَرْسِلُ .  
Biskê nameyek şand bo mamê xu.  
\_ :n.j.verbal noun. **Sending.** إرسال .  
Şandin a nameyê dilê mamê Biskê xoşkir.

**Şarandin:** j.tê.vt. Gerimkirin. **To Become hot, To heat.** يُحْمَى .  
Gulê tenûr şarand. Xecê dawet şarand. Sêvê axavtin şarand.  
\_ :n.j.verbal noun. **Warmth, Hotness.** حَمَاوَة .  
Şarandin a tenûrê nan zû da birajtin. Şarandinê dawet xoşkir.

**Şaşbûn:** j.tên.vi. Helebûn. **To mistake.** يُخْطِئُ .  
Ez şaşbûm di xuandin a inglîzî de.  
\_ :n.j.verbal noun. **Mistake, error.** خَطَا .  
Şaşbûnê ez dam şermê.

**Şaşkirin:** j.tê.vt. Helekirin. **To mistake.** يُخْطِئُ .  
Min hin şaşî kirin di taqîkirinê de.  
\_ :n.j.verbal noun. **Mistake.** خَطَا .  
Şaşkirinê ez paşxistim di taqîkirinê de.

**Şehkirin:** j.tê.vt. Şanekirin. **To comb, To card.** يُمَشِّطُ .  
Min serê xu şehkir li ber xudîkê(awênayê).  
\_ :n.j.verbal noun. **Combing, Carding.** تَمَشِيط .  
Şehkirin a pirçê ez lawkirim.

**Şehitandin:** j.tê.vt. Çirmisandin. **To fade, To wither.** يَذْبُلُ .  
Dest lêdanê fiçik şehitandin.  
\_ :n.j.verbal noun. **Withering.** ذَبُول .  
Berhem kê m dibe bi şehitandin a fiçikan.

**Şehitîn:** j.tên.vi. Çirmisîn. **To fade, To wither.** يَذْبُلُ .  
Gelek fiçik şehitîn û hatin avêtin îsal.  
\_ :n.j.verbal noun. **Withering.** ذَبُول .  
Şehitîn a fiçikan verêj kêmkir.

**Şelalkirin:** j.tê.vt. 1.dirûn bi destî. **To sew by hand.** يُخَيِّطُ بِالْيَدِ  
2.Kêmkirin, Ji ber hev deranîn. **To diminish.** يُنْقِصُ، يُقَلِّلُ  
1.Besê kirasê xu şelalkir;paşî da ber mekînê.  
2.Rezvanî spîndar şelalkirin.  
\_ :n.j.verbal noun. 1.**Sewing by hand.** خِيَاطَةٌ بِالْيَدِ  
2.**Diminution.** تَقْلِيلٌ، انْقَاصٌ  
1.Şelalkirî drûn bi mekînê asankir.  
2.Şelalkirin a spîndaran rezvan pêrabû.



**Şelandin:** j.tê.vt. Rûtkirin. 1.To rob. يُسَلِّبُ  
 2.Ruîskirin. To take off (clothes). يَنْزِعُ المَلا بَس .  
 1.Rêgirî Adem şeland.  
 2.Min xu şeland da xu bişûm.  
 \_ :n.j.verbal noun.1.Robbing. سَلْبُ .2.Taking off. نَزْعُ المَلا بَس  
 1.Şelandinê Adem jarkir.  
 2.Şelandin bo ser şûştinê bû.

**Şemitandin:** j.tê.vt. Tehisandin. To Slide. يُزَلِّقُ .  
 Tîvilê gundorî piyê min şemitand.  
 \_ :n.j.verbalnoun. Slide. زَلْقُ .  
 Şemitandinê ez êxistim û cil ên min pîsbûn.

**Şemitîn:** j.tên.vi. Tehisîn. To slide. يَنْزِلِقُ .  
 Piyê min şemitî ;lê ez ne kevtim.  
 \_ :n.j.verbal noun. Slide. انزلاقُ .  
 Şemitînê ez ne êxistim,çiku min xu bi darê ve girt.

**Şenekirin:** j.tê.vt. Dan bayî bi milhêban. To winnow. يَذْرِي .  
 Bextiyarî coxîn şenekir û genim da rexeke.  
 \_ :n.j.verbalnoun. Winnow. تَذْرِيةُ .  
 Şenekirin a coxînê genim cudakir ji khayê.

**Şepirzebûn:** j.tên.vi. Bêserûberbûn. To jumble. يَرْتَبِكُ .  
 Cangîr şepirzebû li Wanê ji bê diravî.  
 \_ :n.j.verbal noun. Jumble. إرباكُ .  
 Şepirzebûnê jiyan a Cangîrî ne xoşkir.

**Şepirzekirin:** j.tê.vt. Bêserûberkîrin. To jumble. يُرْبِكُ .  
 Ozerkîrin a Lezgînî,ez şepirzekirim li Amedê.  
 \_ :n.j.verbalnoun. jumble. إرباكُ .  
 Şepirzekirinê ez gêjkirim.

**Şeqlêdan:** j.t.vt. pêlêdan, teplêdan. To kick, To slap. يَصْفَعُ ، يَرْكُلُ  
 Dema Bijarî Gurgîn dîtî, Sê şeqlêdan.  
 \_ :n.j.verbal noun. Kick, Slap. صَفْعُ ، رِكْلُ .  
 Şeqlêdanê Gurgîn êşand.

**Şeqtêhildan:** j.tê.vt. Pêhinlêdan. **To kick.** يَرْكُلُ بِالْقَدَمِ .

Dema Kovanî Beko dîtî, Şeqtêhildan.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Kick.** رَكْل بِالْقَدَمِ .

Şeqtêhildanê Beko Gêjkir.

**Şermizarbûn:** j.tên.vi. Serlêşêwan. **To blush.** يَسْتَحِي ، يَخْجَلُ .

Pesar şermizarbû ligel mêhvanan.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Blush.** اسْتِحَاءٌ ، خَجَلٌ .

Şermizarbûn a Pesarî ligel mêhvanan, Pesar êşand.

**Şermizarkirin:** j.tê.vt. Dan Şermê. **To shame, To blush.** يُخْجَلُ

يُسْتَحِي .

Jin a Guhdarî, guhdar şermizarkir ligel mêhvanan.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Shame, Blush.** خَجَلٌ ، اسْتِحَاءٌ .

Şermizarkirinê dilê Guhdarî ne xoşkir.

**Şewitandin:** J.tê.vt. Sotin. **To burn.** يُحْرِقُ .

Agirî du xanî şewitandin li gundî.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Burn.** حَرَقٌ .

Şewitandinê hin gundî hêlan bê xanî.

**Şewqdan:** j.tê.vt. Ronahîdan. **To light.** يُظَيُّ .

Stêr a gulavêjê her sal 15-î teboxê şewqdid/e/it.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Lighting.** إِظَاءَةٌ .

Bi şewqdan a gulavêjê şev fênik dibin.

**Şêlan:** j.tê.vt. 1.Xuarin tawandin. **To digest food.** يَهْضُمُ

2.Tawandin. **To desolve.** يُذِيبُ .

3.Perixandin. **To massage.** يَدْلِكُ .

1.Ûr bi çar Katan (se,etan) xuarinê dişêl/e/it.

2.Xecê mast şêla, bû dew(mast aw).

3.deyk a min pişt a min şêla ez tenabûm.

\_\_ :n.j.verbal noun. 1.**Digestion.** هَضْمٌ . 2.**Desolve.** إِذَابَةٌ .

3.**Rubbing.** دَلِكٌ ، تَدْلِيكٌ .

1.Şêlan a xuarinê di ûrî de çêdib/e/it.

2.Şêlan a mastî ligel avê mast ruhinkir.

3.Şêlan a piştê, pişt tenakir.

**Şêtbûn:** j.tên.vi. Dînbûn. **To become mad.** يَجُنُّ .

Mercê tebê girt û şêtbû.

\_ :n.j.verbal noun. **Mad.** جنون .

Şêtbûn a Mercê ji tebê çêbû.

**Şêtkirin:** j.tê.vt. Dînkirin. **To mad, To cause madness.** يُجَنِّنُ .

Mindalan Xanzê şêtkir.

\_ :n.j.verbal noun. **Mad.** جنون .

Şêtkirin a Xanzê ji mindalan çêbû.

**Şilbûn:** j.tên.vi. 1.Terbûn. **To wet.** يَتَبَلَّلُ .2.sistbûn. **To loosen.** يَرْتَخِي

1.Baran barî,ez şilbûm.

2.Teng a kurtanê kerî şilbû,barê wî kevt.

\_ :n.j.verbal noun. 1.**Wetness.** بَلَلٌ .2.**Looseness.** إرتخاء .

1.Şilbûn a min ji barîn a baranê bû.

2.Barê kerî kevt ji ber şilbûn a tengê.

**Şilkirin:** j.tê.vt. 1.Terkirin. **To wet.** يُيَلَّلُ .2.Sistkirin. **To relax.** يَرخي

1.Baranê ez şilkirim.

2.gevaztin a hêstirê teng şilkir.

\_ :n.j.verbal noun.1.**Wetness.** بَلَلٌ .2.**Relaxation.** إرتخاء .

1.Şilkirinê persîv îna min.

2.Şilkirinê kurtan da êxistin.

**Şikbirin:** j.tê.vt. Gumanbirin. **To doubt.** يَشْكُ .

Min şikbirin,ku Serhing sîxurîyê dike.

\_ :n.j.verbal noun. **Doubt.** شك .

Şikbirin a min di cihê xu da bû.

**Şilqan:** j.tên.vi. Kan. **To shake, To agitate.** يَنْرَجُّ، يَنْخَضُ .

Mast di meşkê de şilqa.

\_ :n.j.verbal noun. **Shaking, Agitation.** رَجٌّ، خَضٌ .

Şilqanê mast kir nîvişk(kere).

**Şilqandin:** j.tê.vt. Kan. **To shake, To agitate.** يَنْرَجُّ، يَنْخَضُ .

Mast hat şilqandin, bû nîvişk.

\_ :n.j.verbal noun. **Shaking, Agitation.** رَجٌّ، خَضٌ .

Bi şilqandin a mastî nîvişk çêbû.

**Şirîqandin:** j.tê.vt. Qîjandin. **To noise, To cry.** يَصِيحُ، يَصْرُخُ .

Dema Lawînî mar dîtî şirîqand.

\_\_ :n.j.verbalnoun. **Noise, Cry.** صِيَاخ، صْرَاخ .

Şirîqandin a Lawînî heval hişyarkirin.

**Şirînbûn:** j.tên.vi. Ciwanbûn. **To sweeten.** يَحْلُوُ .

Sînem şirîndib/e/it roj bo rojê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Sweet, Sweetness.** حَلَاوَة، حَلْو .

Şirînbûn a Sînemê ji çav ên wê yên geşin.

**Şirînkirin:** j.tê.vt. Qendtêkirin. **To Sweeten.** يُحَلِّي بِالسُّكَّرِ .

Aramî çay gelek şirînkir, nehat vexuarin.

\_\_ :n.j.verbalnoun. **Sweet.** حَلْو .

Şirînkirin a gelek ne başe bo tenduristîyê.

**Şirovekirin:** J.tê.vt. Ravekirin. **To explain, To make clear.** يَشْرَحُ

، يَفْسِّرُ ،

Fêrkerî wane şirovekir bo fêrkeran.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Explanation.** شَرْح، تَفْسِير .

Şirovekirinê wane asankir bo fêrkeran.

**Şirrbûn:** j.tên.vi. Dirhan. **To tear.** يَتَمَرَّقُ .

Kirasê Xanzê şirrbibû, milê wê diyarbû.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Tear.** تَمَرَّق .

Şirrbûn a kirasî, Kiras da avêtin.

**Şirrkirin:** j.tê.vt. dirandin. **To tear.** يُمَرِّقُ .

Kelemî kiras ê Xanzê şirrkir.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Tear.** تَمَرِيق .

Kiras ên şirrkirî dihên avêtin.

**Şiyan:** j.tên.tê.v.i.t. Karîn. Tiwanan. **Can, To be able to** يَتِمَكَّنُ، يَقْدَرُ.

Mîni şiya ez name ya siwîdî bixuînim. Ez dişêm te bibînim.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Ability, Possibility.** قُدْرَة، تَمَكَّن .

Şiyan a Azadî ji jîrî ya wî ye.

**Şikirin:** j.tê.vt. Peyv nasîn di rîstande. **To parse, To analyze.** يُعْرَبُ

Fêrkerê rêzimanê sê rist(hevok) şikirin bo fêrkeran.

\_\_ :n.j.verbal noun. **parsing, Analyses.** إِعْرَاب، تَحْلِيل .

Rêzimanzan şikirinê baş dizanin.

**Şînbûn:** j.tên.vi. 1.Zîldan, Riwan. **To grow.** يَنمو.

2.Ximbûn. **To blue.** يَزرقُ

1.Me tovê gulberojan çand şînbûn.

2.kirasê Qentarê şînbû, dema min dîtî.

\_\_ :n.j.verbal noun. 1.**Growing.** نمو. 2.**To turn blue.** زرقة .

1.Şînbûn a tovê gulberojan dilê rezvanî xoşkir.

2.Şînbûn a kirasê Qentarê ji ber behîyê bû.

**Şînkirin:** j.tê.vt. Bi reng ê şîn ximkirin. **To make blue.** يَلوُن بالازرق .

Qentarê hemû cilên xu şînkirin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Blue.** تلوين بالازرق .

Şînkirin a cilan Bawe(hîbûne) li gund ên deştê.

**Şîrdan:** j.tê.vt. Memikmêjtin. **To suck.** يَرْضَعُ .

Nazê kurê xu yê sava şîrda.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Suck, Sucking.** رضاعة .

Şîrdan a zarok ên sava kar ê deşkan e.

**Şîrdoşîn:** j.tê.vt. Şîr ji memkî derînan. **To milk.** يَحلبُ .

Min bêrîvan dît, şîrdoşî ji bizinê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Milking.** حلبُ .

Şîrdoşîn karê bêrîvanane.

**Şkandin:** j.tê.vt. 1.Parçekirin. **To break.** يَكسِرُ

2.Rojîşkandin. **To eat.** يَظُرُ .

1.Min perdax şkand.

2.Alanî rojîşkand pêr.

\_\_ :n.j.verbal noun. 1.**Breaking.** كسِرُ. 2.**breaking fast.** إفطار .

1.Şkandin a perdaxî ez pêrabûm.

2.Rojîşkandin Alan pêrabû.

**Şkestin:** j.tên.vi. Parçebûn. **To break.** يَنكسرُ .

Perdax şkest,çiku ji destê min kevt.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Breaking.** انكسار .

Şkestin a perdaxî bêyî destê min bû.

**Şorbûn:** j.tên.vi. Dadelan. **To hang down, To dangle.** يَتدلى .

Dewlik şorbû di bîrê de.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Hanging down Dangle.** تدلي .

Şorbûn a dewlikê di bîrê de, bêyî destê Xecê bû.

**Şorişgêran:** j.tê.vt. Şergêran. **To revolt against.** يَثُورُ .  
Miletê kurd 14 sala şorişgêra dijî rijêma iraqê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Revolutionary, Revolutionist.** ثائر، ثورة .  
Şorişgêranê kurdistan rizgarkir ji bindestîyê.

**Şorkirin:** j.tê.vt. dadilandin. **To dangle.** يُدَلِّي .  
Berhemî dewlik şorkir di bîrê de.  
\_ :n.j.verbal noun. **Dangle.** تُدَلِّي .  
Şorkirin a dewlikê di bîrê de Berhem pêrabû.

**Şûkirin:** j.tên.vi. Mêrkirin. Şûikirin. **To marry, To wed.** يَتَزَوَّجُ .  
Nazdarê şûkir,wê pîrozb/e/it.  
\_ :n.j.verbal noun. **Marriage, Wedding.** زَوَاج .  
Şûikirin a Nazdarê li hemîyan xoşhat.

**Şûnkevtin:** j.tê.vt. Li peykevtin. **To follow up.** يَتَعَقَّبُ .  
Diz revî, Hêja şûnkevit heta Bêtasê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Go after, Following.** تَعَقَّب .  
Şûnkevtin a Hêjayî diz da girtin.

**Şûştin:** j.tê.vt. Paqijkirin bi av û sabûnê. **To wash.** يَغْسِلُ .  
Deyk a Nemamê cil şûştin bi cilşûyê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Wash.** غَسَلَ .  
Şûştin a cilan karê jinikan e.

# T

- Tagirtin:** j.tê.vt. 1.Leş gerimbûn. **To sicken.** يَمْرَضُ، يَتَّحَمِي  
2.Lagirtin. **To side with.** يَنْحَازُ .  
1.Min Gulê bir bo xestexanê, çiku tagirtî bû.  
2.Kurd li derevey welatî tayê heydu digirin.  
\_ :n.j.verbal noun. 1.**Sickness.** مَرَضٌ، حُمَى . 2.**Favoritism.** اِنْحِيَازُ  
1.Tagirtin a Gulê ji persîvê bû.  
2.Tagirtin ji xuînê ye.
- Talankirin:** j.tê.vt. Rûtkirin. **To steal, To rob.** يَسْرِقُ، يَسْلُبُ  
Leşkerê Seddamî gund ên kurdan talankirin.  
\_ :n.j.verbal noun. **Robbing.** سَرْقَةٌ، سَلْبٌ .  
Talankirin a gundan,gundî handan bo pêşmergatîyê.
- Tamkirin:** j.t.vt. Çêjtin. **To taste.** يَذُوقُ .  
Min tamkir xuarinê, genî bû .  
\_ :n.j.verbal noun. **Tast.** مَذَاقٌ .  
Tamkirinê hêla ez xuarinê birêjim.
- Tapokirin:** j.tê.vt. Hat nivîsîn. **To register in land register.** يُسَجِّلُ  
العَقَار  
Şamîranê zevî ya xu tapokir.  
\_ :n.j.verbal noun. **Land register.** تَسْجِيلُ الْعَقَارِ .  
Bi tapokirinê zevî ya Şamîranê kevt ser navê wê.
- Taqîkirin:** j.tê.vt. Jêpîrsîn, Sehkirin. **To test, To try.** يُجَرِّبُ، يَخْتَبِرُ  
Min xu taqîkir bo taqîkirinê.  
Pêlavê taqîbike paşî bikirre.

\_ :n.j.verbal noun. **Test, Trial.** تَجْرِبَةٌ، إختبار .  
Bi taqîkirinê min amadeyî tewawkir û ez li kolîgê hatim  
Pesindkirin.  
Bi taqîkirinê min pêlav kirrî.

**Tarîbûn:** j.tên.vi. Bû be şev, Roj çû ava. **To darken.** يَظْلَمُ .  
Dinya zû tarîdib/e/it li zivistanê. Lempe vemirî jor tarîbû.  
\_ :n.j.verbal noun. **Darkness.** ظلام .  
Tarîbûnê em dakirin di malan de.

**Tarîkirin:** j.tê.vt. Şevdahatin, Ronahîneman. **To darken.** يَظْلَمُ .  
Deyk a min jor tarîkir, da em binivin.  
\_ :n.j.verbal noun. **Darkness.** ظلام .  
Tarîkirinê ne hêla em hev bibînin.

**Tawandin:** j.tê.vt. Şêlan, Helandin. **To dissolve, To melt.** يُذِيبُ .  
Şekirê bi tawîne di çayê de . Xuwê di avê de hat tawandin.  
\_ :n.j.verbal noun. **Dissolving, Melting.** إِذَابَةٌ .  
Bi tawandin a şekirê çay şirîn bû.

**Tawdan:** j.tê.vt. Handan. **To encourage, To incite.** يُشَجِّعُ .  
Firensîyan tîm a topapêyî tawdan li pertuxalê.  
\_ :n.j.verbal noun. **Encouragement, Incitation.** تَشْجِيعٌ .  
Tawdanê hêla Yewnanî serbikevin di berêkaneyê de.

**Tazîbûn:** j.tên.vi. Ruîsbûn. **To uncloth, To disrobe.** يَتَعَرَّى .  
Ez tazîbûm, dema te ez dîtîm.  
\_ :n.j.verbal noun. **Unclothing, Disrobement.** تَعْرِيَةٌ .  
Bi tazîbûnê persîvê Şivan girt.

**Tazîkirin:** j.tê.vt. Ruîskirin. **To disrobe.** يُعْرِى .  
Avdelî xu tazîkir da serê xu bişût.  
\_ :n.j.verbal noun. **Disrobement.** تَعْرِيَةٌ .  
Bi tazîkirinê/ ser dihê şuştin/meleyî dihê kirin.

**Tehisandin:** j.tê.vt. Helxiliskandin. **To slip.** يُرْزِقُ .  
Celal hat bestin Ji serma, Arî xu liser tehisand.  
\_ :n.j.verbal noun. **Slip.** زَلْقٌ .  
Tehisandinê Arî êxist pişt a wî êşa.



**Tehisîn:** j.tên.vi. Helxilîskan. **To slip.** يَنْزِقُ .  
Aram tehisî liser befrê û kevt destê wî êşa.  
\_ .n.j.verbal noun. **Slip.** زَلَقُ .  
Tehisînê Aram gelek êşand.

**Temaşekirin:** j.tê.vt. Nêrrîn, Seyrkirin. **To see, To look at.** يَنْظُرُ إِلَى  
Alan baş xanî temaşebike berî tu bikirrî.  
\_ .n.j.verbal noun. **Seeing, Looking at.** الْنَظْرُ إِلَى  
Zaro çûn bo temaşekirin a hirçê.

**Tenabûn:** j.tên.vi. 1.Mitbûn. **To calm.** يَهْدَأُ  
2.Arambûn. **To rest.** يَرْتَاحُ  
1.Êşa piyê Darî tenabû.  
2.Darî çar roja tenabû ji karî.  
\_ .n.j.verbal noun. 1.**Calm.** هِدْوَاءُ 2.**Rest.** رَاحَةٌ  
1.Darî piştî tenabûn a êşê xew lê kevt.  
2.Darî piştî çar roj ên tenabûnê vegeza ser karê xu.

**Tenakirin:** j.tê.vt. 1.Mitkirin. **To calm.** يَهْدِي  
2.Aramkirin. **To rest.** يَرِيحُ  
1.Noşdarî Darî tanakir bi dermanî.  
2.Cejn a newrozê Darî tenakir ji karî.  
\_ .n.j.verbal noun. 1.**Calm.** هِدْوَاءُ 2.**Rest.** رَاحَةٌ  
1.Tenakirin a Darî ji êşê, noşdar pêrabû.  
2.Tenakirin a Darî ji karî, hatin a Cejn a newrozê bû.

**Tengavbûn:** j.tên.vi. Bêhinçikbûn. **To become annoyed.** يَنْزَعُجُ  
Hello tengavbû, dema babê wî hatî girtin.  
\_ .n.j.verbal noun. **Annoyance.** انْزِعَاجُ  
Tengavbûnê Hello nesaxkir.

**Tengavkirin:** j.tê.vt. Bêhinçikkirin. **To annoy.** يُزَعِّجُ  
Hişyarî babê xu tengavkir da jinê bo bîn/e/it.  
\_ .n.j.verbal noun. **Annoyance.** انْزِعَاجُ  
Tengavkirinê hêla Babê Hişyarî jinê bo wî bînit.

**Tengbûn:** j.tên.vi. Ji firehî kevtin. **To narrow.** يَضِيقُ  
Kiras ê min bi şuştinê tengbû.  
\_ .n.j.verbal noun. **Narrowness.** ضَيْقُ  
Tengbûnê kiras da havêtin.

**Tengkirin:** j.tê.vt. Ji firehî existin. **To narrow.** يُضَيِّقُ

Ciwanê kirasê Arî yê fireh tengkir ji navtengê.

\_ :n.j.verbal noun. **Narrowness.** تَضْيِيقُ

Tengkirinê kiras qaydekir bo Arî.

**Tengsistîkirin:** j.tê.vt. Bêpakîkirin, Dan piştguhî. **To delay.** يُهْمَلُ

Bijarî tengsistîkirin bo çûn a Misrê.

\_ :n.j.Verbal noun. **Delaying.** إهمال

Tengsistîkirinê Bijar aramkir(tenakir).

**Tepeserkirin:** j.tê.vt. Riswakirin. **To degrade.** يُذِلُّ ، يُهِينُ .

Bilind mirovê jar tepeser neke çuca!

\_ :n.j.verbal noun. **Degrade.** إذلال، إهانة .

Tepeserkirin a jaran karek ne başe.

**Tepisandin:** j.tê.vt. Vemirandin. **To abate, To put out.** يُخَمِّدُ .

Agir berbû xaniyekê li gundî; gundîyan agir tepisand.

\_ :n.j.verbal noun. **Putting down.** إخماد .

Tepisandin a agirî gundî pêrabûn.

**Tepisîn:** j.tên.vi. Vemirîn. **To abate, To go out.** يُخَمِّدُ .

Agir tepisî,dema xanî hatî sotin .

\_ :n.j.verbal noun. **Putting down.** إخماد .

Tepisîn a agirî bê harîkarî çêbû.

**Teqandin:** j.tê.vt. Peqandin. **To fling, To explode.** يُطْلِقُ ، يُفَجِّرُ .

Pezî gelek mîn teqandin. Şivanî tîfek teqand.

\_ :n.j.verbal noun. **Flinging, Explosion.** إطلاق، تفجير .

Teqandina mînan pez pêrabû. Teqandina tîfekê Şivan pêrabû.

**Teqîn:** j.tên.vi. Peqîn. **To explode.** يَنْفَجِرُ .

Mînek teqî bizinek kuşt.

\_ :n.j.verbal noun. **Explosion.** انفجار .

Teqîn a mînê bizin kuşt.

**Terabûn:** j.tên.vi. Belavbûn. **To scatter.** يَتَبَعَثُ ، يَتَفَرَّقُ .

Gundî yên germîyanê terabûn Di enfal a Seddamî de.

\_ :n.j.verbal noun. **Scatter, Scattering.** تَبَعَثُ ، تَفَرَّقُ .

Terabûn a gundîyan ji Tirsê bû.

- Terakirin:** j.tê.vt. Belavkirin. **To scatter.** **يُبَعِّرُ يُفَرِّقُ**.  
Serbaz ên Seddamî gundî yên germîyanê terakirin.  
\_ .n.j.verbal noun. **Scatter, Scattering.** **تَبَعَّرَ، تَفَرَّقَ**.  
Di terakirinê de gelek gundî mirin.
- Terbûn:** j.tên.vi. Şilbûn. **To dampen, To moisten.** **يَيْتَلُّ**.  
Cil ên min terbûn bi barîn a baranê.  
\_ .n.j.verbal noun. **Damp, Moist.** **رَطِبَ، مُبَيْتَلٌّ**.  
Bi terbûn a cilan min sarbû. Terbûnê cil dan guhorîn.
- Terkirin:** j.tê.vt. Şilkirin. **To dampen, To moisten.** **يُيَلِّلُ، يُرَطِّبُ**.  
Barîn a baranê cil terkirin.  
\_ .n.j.verbal noun. **Damp, moisture.** **رَطْبَ، رُطُوبَةً**.  
Terkirinê cil dan êxistin.
- Terxankirin:** j.tê.vt. Bijartin, Jêgirtin. **To prefer to, To favour.**  
**يُفَضِّلُ، يَخْتَارُ**  
Armancî hespê boz terxankir.  
\_ .n.j.verbal noun. **Preference (to), favouring.** **تَفَضُّلًا، إِخْتِيَارًا**.  
Terxankirin a hespê boz Armanc pêrabû.
- Tewşlêdan:** j.tê.vt. Rexnegirtin. **To Fault, To blame.** **يُعِيبُ، يَنْقَدُ**.  
Luqman nivîskar e, şaşîyan dike; Aramî tewşlêdan.  
\_ .n.j.verbal noun. **Fault, Blame.** **تَعْيِيبًا، انْتِقَادًا**.  
Bi tewşlêdanê, şaşî yên Luqmanî kêmbûn.
- Teyisandin:** j.tê.vt. Biriqadin. **To shine.** **يُلْمَعُ**.  
Guharê bazinê xu teyisand.  
\_ .n.j.verbal noun. **Shine, Shining.** **لَمَعَانًا**.  
Teyisandinê teysteysok dan dîtî bi şevê.
- Teyisîn:** j.tên.vi. Biriqîn. **To shine.** **يُلْمَعُ**.  
Stêr diteyisin bi şevê.  
\_ .n.j.verbal noun. **Shine, Shining.** **لَمَعَانًا**.  
Teyisîn a stêran bi şevê ciwanî ye.
- Tezandin:** j.tê.vt. Sarkirin. **To cool.** **يُبْرِّدُ**.  
Gozik ê nû av tezand bo vexuarinê.  
\_ .n.j.verbal noun. **Coolness.** **بُرُودًا، تَبْرِيدًا**.  
Tezandin a tezîkerê zûtir e, ji ya gozk ê nû.

**Tezîn:** j.tên.vi. Sarbûn. **To become cold.** يَبْرُدُ .

Av a rûbaran diteze zivistanan, havînan gerim dibe.

\_:n.j.verbalnoun. **Coldness.** برودة .

Tezîn a av a rûbaran di zivistanan de karek asayî ye.

**Têalandin:** j.tê.vt. Têwerandin. **To wrap, To surround.** يَلْفُ .

Gulê, evê serbistê bigire û benkî têbîalîne!

\_:n.j.verbal noun. **Wrapping, Surround.** لَف .

Têalandin a benkî li ser serbistê Gulê pêrabû.

**Têberbûn:** j.tên.vi. 1.Pêwerhatin. **To attack.** يَنْقِضُ عَلَى

2.Agirgirtin. **To catch fire.** يَحْتَرِقُ .

1.Se têberbûn Arî li gundî ;Arî revî.

2.Behzadî binkê çixarê avêt nav tanî agir têberbû.

\_:n.j.verbal noun. 1.**Attack.** انْقِضَاض 2.**Catching fire.** احْتِرَاق

1.Têberbûn a seyan hêla Arî birev/e/it.

2.Têberbûn a agirî tan da sotin.

**Têberdan:** j.tê.vt. Çupênêkirin. **To pay no attention to.** يُهْمِلُ .

Karek baş bidest min kevt;lê min têberda.

\_:n.j.verbal noun. **Inattention.** إهمال .

Têberdan a min bo karî ji nezanîne bû.

**Têbirin:** j.tê.vt. 1.Bê pakî girtin. **To neglect, To omit.** يُهْمِلُ، يَعْغَلُ

2.Dan kuştin. **To extirpate, To kill.** يَقْضِي عَلَى

1.Çima te kurrîn a rezî têbir Dara?

2.Ma ne gunehbû we Qenco têbir?

\_:n.j.verbal noun. 1.**Neglect, Omission.** إهمال، إغفال

2.**Extirpation.** قِضَاءٌ عَلَى

1.Têbirin a Darayî bo kurrîn a rezî ne başî bû.

2.Bi têbirin a Qencoyî, jin a wî bû bîjin.

**Têçûn:** j.tên.vi. 1.Neman. **To perish.** يَهْلِكُ 2.Jêçûn. **To leak.** يَتَسَرَّبُ

1.Zinar çû bo dizîyê;lê têçû.

2.Me denek kurrî û tijî av kir;lê hemû av têçû.

\_:n.j.verbal noun. **Perdition.** هَلَاك 2.**Leakage.** تَسَرَّب .

1.Têçûn a Zinarî ji çavzilî bû.

2.Têçûn a avê ji kevnatîya meşkê bû.

**Têgehandin:** j.tê.vt. Ruhinkirin. **To understand.** يُفْهَمُ .

Fêrkerî şagird têgehandin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Understanding.** فُهْمٌ، تَفْهِيمٌ .

Têgehandinê,şagird jîrkirin û pêşvebirin.

**Têgehiştin:** j.tên.vi. Halîbûn. **To understand.** يَتَفَهَّمُ .

Fêrkerî wate ruhinkir û şagird têgehiştin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Understanding.** تَفْهَمٌ .

Têgehiştinê şagird pêşvebirin.

**Têheldan:** j.tê.vt. Şeqlêdan. **To beat, To hit.** يَضْرُبُ .

Cangîrî diz girt û têhelda û bir bo polîsxañê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Beating, Hitting.** ضَرْبٌ .

Têheldan a dizî karek ne baş bû Cangîrî kirî.

**Têhilînan:** j.tê.vt. Kirin têda. **To dip.** يَغْمِسُ .

Firavîn a me avgoştbû,me nan têhilîna û me xuar.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Dipping.** غَمْسٌ .

Têhilînan a nanî di avgoştê de xoşe.

**Têhusîn:** j.tê.vt. Pêve înanûbirin. **To rub.** يَحْكُ .

Evî berzîvî bigre û çeçoyê têbihusî da tîj bib/e/it.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Rubbing.** حَكٌ .

Têhusîn bi berzîvî ve çeço da tîjkirin.

**Têgoşan:** j.tê.vt. Xebatkirin. **To strive.** يُنَاضِلُ .

Kurd têgoşan bo mafwergirtinê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Striving.** نِضَالٌ .

Têgoşan a kurdan ji dil bû.

**Têgoşîn:** j.tê.vt. Xebatkirin. **To battle.** يُكَافِحُ .

Kurd têgoşîn bo fîdralizmê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Battle.** كِفَاحٌ .

Têgoşîn karê dilsojan e, bo welatê parçekirî

**Têkalan (têkalhan):** j.tên.vi. Lêk hatin badan. **To surround.**

يَلْتَفِتُ

Dafk û pêdafk têkalan ne hatin vedan.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Surrounding.** التِّفَافُ .

Têkalan a dafkan nêçîr paşêxist.

**Têkalandin:** j.tê.vt. Lêk badan. **To convolve.** يَلْفُ .

Me werîs têkalandin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Convolution.** اِلْتِفَافٌ، لَفٌ .

Têkalandin a werîsan ez pêrabûm.

**Têkalizandin:** j.tê.vt. Di nav êkra birin. **To become complex.** يُعَقِّدُ .

Sûsik kevt dafkan û dafk têkalizandin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Complexity.** تَعْقِيدٌ .

Bi têkalizandinê dafik têkçûn.

**Têkalizîn:** j.tên.vi. Di nav êkra çûn. **To be complex.** يَتَعَقَّدُ .

Dafik têkalizîn di tuîrkî de.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Complexity.** عَقْدَةٌ .

Têkalizînê dafik têkbirin.

**Têkbirin:** j.tê.vt. Ji kar êxistin. **To leave without work.** يُعْطَلُ .

Hizir ên Alanî hatin têkbirin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Breakdown.** عَطَلٌ .

Têkbirin a hizir ên Alanî birayê wî pêrabû.

**Têkçûn:** j.tên.vi. 1.Neman. **To wreck.** يَنْهَدِمُ .

2.Jêksilbûn. **To quarrel.** يَتَخَاصَمُ .

1.Di enfalan de 4500 gund têkçûn.

2.Salar û Semyan têkçûn li ser kelepûrtî.

\_\_ :n.j.Verbal noun. 1.**Wreck.** هَدَمٌ 2.**Quarrel.** نِزَاعٌ، خِصَامٌ .

1.Têkçûn a kheştîyê ji peqîn a narincokekê çêbû.

2.Têkçûn a Şemalî û Hevalî liser hin diravî(paran)bû.

**Têkdan:** j.tê.vt. 1.Kavilkirin. **To sabotage.** يُخَرَّبُ .

2.Puîçkirin. **To cancel.** يُلغِي .

1.Kolkê mirîşkan hat têkdan.

2.komel a delalê kombûn a serê salê têkda.

\_\_ :n.j.verbal noun. 1.**Sabotaged.** خَرَابٌ 2.**Cancellation.** اِلْغَاءٌ .

1.Têkdan a kolkê mirîşkan ji ber bêhnê bû.

2.Têkdan a kombûnê ji ber sermayê bû.

**Têkhilkêşan:** j.tê.vt. Di nav hevra birin. **To knit.** يَتَشَابِكُ .

Bîrkerî(cilçêkerî) dav ên reng reng têkhilkêşan.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Knitting.** تَشَابِكٌ .

Têkhilkêşan a davan bo çêkirin a şel û şepkan bû.

**Têkirin:** j.tê.vt. Kirin têda, Dagirtin. **To pour.** يَصُبُّ .  
Çayçêkerî sê çay têkirin bo mêhvanan.  
\_ :n.j.verbal noun. **Pouring.** صَبَّ .  
Têkirin a çayê asan e.

**Têkvedan:** j.tê.vt. 1.Belavkirin. **To disarrange.** يُبْعِثُ  
2.Livandin. **To move.** يُحَرِّكُ  
3.Berdanhev. **To incite.** يُحَرِّضُ .  
1.Me belg ên puîngî têkvedan li ber hetavê da hişkbibin.  
2.Me çay têkveda da şekir bitawêt.  
3.Ba,îsîyan gundî têkvedan da lêkbikevin.  
\_ :n.j.verbal noun. 1.**Disarrangement.** بَعَثَ  
2.**Movement.** حَرَكٌ  
3.**Incitement.** حَرِيضٌ .  
1.Bi têkvedanê belg ên puîngî hişkbûn li ber hetavê.  
2.Bi têkvedan a çayê şekir tawa.  
3.Bi têkvedanê gundî berbûn hev.

**Tênan:** j.tê.vt.1.Kutan. **To make love to. To copulate with.** يُجَامِعُ  
Ker çû ser makerê û têna.  
\_ :n.j.Verbal noun. **Copulation, Lovemaking, Sex.** جَمَاع  
Bi tênanê zaro çêdibin.

**Têperbûn:** j.tên.vi. Jêkborîn. **To pass, To overreach.** يَتَخَطَّى .  
Avan têperbû di berêkane ya melevanî yê da.  
\_ :n.j.verbal noun. **Pass, Overreaching.** تَخَطَّى .  
Têperbûn a Avanî ji zîrekî ya wî bû.

**Têperkirin:** j.tê.vt. Jê borîn. **To pass, To overreach.** يَخْطِي،  
يُجَاوِزُ  
Otombîl a Şivanî Avan têperkir di rêkê de.  
\_ :n.j.verbal noun. **Pass, Overreaching.** تَخَطَّى، تَجَاوَزُ .  
Bi têperkirinê em zûtir gehiştin.

**Têrabirin:** j.tê.vt. Di /binra/navra/ çûn. **To get through, To let pass.** يَمُرُّ  
Kivanê serkevtinê di rêkê de bû, Şofêrî em têrabirin.  
\_ :n.j.verbal noun. **Getting through, Letting pass.** تَمَرِيرٌ  
Bi têrabirin a di bin kivanê serkevtinê ra, me pê xoşbû .

**Têraçûn:** j.tên.vi. Di/ binra/navra/ çûn. **To pass.** يَمُرُّ .

Pir di rêk a qazan de bû qaz têraçûn.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Passing, Pasage.** مرور .

Têraçûn a bin pirê rêk a qazan kurtkir.

**Têrahatin:** j.tên.vi. Di navra vegevan. **To come through.** يَمُرُّ مِنْ .

Devê kuna rîvî tengbû;rîvî şiya têrahatinê.

\_\_ :n.j.verbal noun. **coming through.** مرور مِنْ .

Tengbûnê hin pûrtê rîvî werand bi têrahatinê.

**Têrakirin:** j.tê.vt. Birin navda. **To enter, To insert.** يَدْخُلُ .

Çerim stûrbû,pînedozî dirêşk têrakir da kumbib/e/it.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Entrance, Insertion.** ندخال .

Têrakirin a dirêşkê çerim kunkir.

**Têrkirin :** j.tê.vt. Xuarin danê. **To satisfy.** يُشَبِّعُ، أَشْبَعُ

Me mêhvan ên birsî têrkirin .

\_\_ :n.j. Verbal noun. **Satisfaction.** إشباع

Têrkirinê dilê mêhvanan xoşkir.

**Têkteşqilîn:** j.tê.vt. Hevdu dîtin a bê jivan. **To meet by chance.**

يَلْتَقِي بِالصَّدْفَةِ

Şivan û Segvan têkteşqilîn li Amedê.

\_\_ :n.j.Verbal noun. **Meeting by chance.** لقاء بالصدفة

Têkteşqilîn a Şivanî û Segvanî li Amedê xoşbû.

**Têwerandin:** j.tê.vt. Têpêçan. **To wrap up, To furl.** يَلْفُ .

Arî sarbû deyk a wî bermalk têwerand.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Wrapping (up), Furl.** لف .

Arî Bitêwerandin a bermalkê gerimbû.

**Tifkirin:** j.tê.vt. Tif ji devê xu deranî. **To spit.** يَبْصُقُ .

Azadî tifkir,çiku bahîvek tal(tehil)xuar.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Spitting.** بصق .

Tifkirin li ser zemînê ne karek başe.

**Tijîbûn:** j.tên.vi. Pirrbûn. **To fill.** يَمْتَلِئُ .

Gulê av kir denî ta tijîbû.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Fill.** امتلاء .

Bi tijîbûn a denî,em ne mayin bê av.



**Tijîkirin:** j.tê.vt. Pîrîkirin. **To fill.** يَمْلُؤُ .

Nazê mesîn tijîkir bo destnivêjê.

\_\_ .n.j.verbal noun. **Fill.** مَلِيٌّ .

Bî tijîkirin a mesînî destnivêj hat girtin.

**Tikakirin:** j.tê.vt. Hîvîkirin, Paraneve. **To hope.** يَرْجُو .

Banê tikakir ji deyk a xu, da bihêlit biçit bo seyranê.

\_\_ .n.j.verbal noun. **Hope.** رَجَاءُ .

Tikakirin a Banê sergirt û deyk a wê hêla.

**Tingijîn:** j.tê.vt. Girrgirtin, xeyidîn. **To be irritated by.** يَغْتَاظُ .

Seddâm bi standin a Bexda tingijî û revî.

\_\_ .n.j.Verbal noun. **Irritation.** غَيْظٌ ، غَضَبٌ .

Tingijîn a Seddamî û revîn a wî ji ber standin a Bexdayê bû.

**Tiraşîn:** j.tê.vt. Kurkirin. **To shave.** يَحْلُقُ .

Hinkes herroj rih ên xu ditiraşîn.

\_\_ .n.j.verbal noun. **Shaving, Shave.** حِلَاقَةٌ .

Tiraşîn a rihan baqijî ye.

**Tirkirin:** j.tê.vt. Ba yê dengdar ji zikî derhatin. **To break wind.**

يَضْرِبُ

Pîremêrekê tirkir li dîwanxanê şerm a wî hat.

\_\_ .n.j.verbal noun. **Breaking wind.** ضَرْبَةٌ، ضِرَاطٌ .

Tirkirin li turkîya ne şerm e.

**Tirsan:** j.tên.vi. Bizdan, Toqan. **To frighten.** يَرْعَبُ، يَخَافُ .

Aram ji hirçê tirsan.

\_\_ .n.j.verbal noun. **Fright.** رُعْبٌ، خَوْفٌ .

Tirsan ji hirçê karê zaroka ne.

**Tirsandin:** j.tê.vt. Bizdandin, toqandin. **To fright.** يُخَوِّفُ .

Hirçê Aram tirsand, dema nikveçûyî.

\_\_ .n.j.verbal noun. **Fright.** خَوْفٌ .

Tirsandin a Aramî ji hirçê ne karek başbû.

**Tiwanîn:** j.tên.vi. Şiyan, Kharîn. **Can, To be able to.** يَتِمَكَّنُ .

Dîlanî tiwanî bi ser çiyayî bikev/e/it.

\_\_ .n.j.verbal noun. **Ability, Possibility.** تَمَكُّنٌ، إِمكَانٌ .

Tiwanîn a Dîlanî bo kîrîn a Otombîlekê xoşbû.

**Tîjbûn:** j.tên.vi. Xoşbirrbûn. **To sharpen.** يَنْشِدُّ، يَصْبِحُ حَادًّا .

Çeqo hat çerixkirin baş tîjbû.

\_ :n.j.verbal noun. **Sharpener.** حَادٌّ، شَدِّدٌ .

Bi tîjbûn a çeqoyê Nesrîn dilxoşbû.

**Tîjkirin:** j.tê.vt. Xoşbirrkirin. **To sharp.** يَشْحَدُ، يَحْدُّ .

Çerraxî çeqo tîjkir.

\_ :n.j.verbal noun. **Sharpener.** حَادٌّ، شَدِّدٌ .

Tîjkirin a çeqoyê, çeqo nuîkir.

**Tîmarkirin:** j.tê.vt. Dermankirin. **To treat.** يَدَاوِي .

Birîndar hatin tîmarkirin li xestexaneyê.

\_ :n.j.verbal noun. **Treat.** دَاوِي .

Tîmarkirinê birîndar saxkirin.

**Tîrbûn:** j.tên.vi. Av jê çûn. **To thicken.** يَكْتِفُ .

Mast di tuîrkî de tîrbû.

\_ :n.j.verbal noun. **Thickening.** تَكْتِيفٌ .

Tîrbûnê mast xoşkir bo xuarinê.

**Tîrkirin:** j.tê.vt. Av jê birin. **To thicken.** يَكْتِفُ .

Tuîrkî mast tîrkir.

\_ :n.j.verbal noun. **Thickening.** تَكْتِيفٌ .

Bi tîrkirinê mast kêmbû.

**Topandin:** j.tê.vt. Mirandin. **To die, To perish.** يَهْلِكُ، يَمُوتُ .

Nazenînê çîçelok topand.

\_ :n.j.verbal noun. **Death.** مَوْتُ .

Topandin a çîçelokê Nazenîn Êşand.

**Topîn:** j.tên.vi. Mirin. **To die, To perish.** يَهْلِكُ، يَمُوتُ .

Hêstir di kevrî de kevt û topî.

\_ :n.j.verbal noun. **Death.** مَوْتُ .

Topîn a hêstirê ziyaneke mezin bû.

**Toqandin:** j.tê.vt. Tirsandin. **To frighten.** يُخَوِّفُ .

Teqekirin a şevê gundî toqandin.

\_ :n.j.verbal noun. **Fear, fright.** تَخْوِيفٌ، خَوْفٌ .

Toqandinê xew a gundîyan têkda.

- Toqîn:** j.tên.vi. Tirsan. **To fright.** يَخَافُ .  
Zaro toqîn ji dengê topan.  
\_ :n.j.verbal noun. **Fear, Fright.** خَوْفٌ .  
Toqînê zaro nesaxkirin.
- Torebûn:** j.tên.vi. Silbûn, Êcizbûn, Têkçûn. **To rage, To become angry.** يَغْضَبُ  
Fêrkerî li qotabî heyband, qotabî torebû.  
\_ :n.j.verbal noun. **Rage, Anger.** غَضَبٌ .  
Torebûn a qotabî ne karek başbû.
- Torekirin:** j.tê.vt. Silkirin, Êcizkirin, Têkbirin. **To seethe.** يُغِيضُ .  
Dan û standinê segvan torekir.  
\_ :n.j.verbal noun. **Seethe.** إِغْضَاةٌ .  
Torekirinê Segvan bê dengkir.
- Tundbûn:** j.tên.vi. Azabûn. **To strengthen.** يَنْقُوِي .  
Bi werzişkirinê leş tunddib/e/it.  
\_ :n.j.verbal noun. **Strengthening.** تَنْقُوِيَةٌ .  
Bi tundbûn a leşî; Ciwanê pila yekem wergirt.
- Tundgirtin:** j.tê.vt. başgirtin. **To grasp, To grip.** يَمْسِكُ بِقُوَّةٍ .  
Zozan destê min tundbigire, da tu ne kevî!  
\_ :n.j.verbal noun. **Grasping, Gripping.** مَسِكٌ بِقُوَّةٍ .  
Tundgirtin a destî hêla Zozan ne kev/e/it.
- Tundkirin:** j.tê.vt. Azakirin. **To strengthen.** يُقَوِّي .  
Werzişkirinê leşê min tundkir.  
\_ :n.j.verbal noun. **Strengthening.** تَقْوِيَةٌ .  
Tundkirin a leşî hêla ez pila yekem bistînim.
- Tûlstandin:** j.tê.vt. Heyfstandin. **To retaliate, To revenge.** يَنْتَارُ .  
Merdanî Behroz quta û tûlaxustand.  
\_ :n.j.verbal noun. **Retaliation.** تَأْرٌ .  
Tûlstandin ne karek pêşkevî ye.
- Tûlvekirin:** k.tê.vt. Heyfvekirin. **To revenge.** يَنْتَارُ .  
Cemşîdî tûlvekir ji Cangîrî.  
\_ :n.j.verbal noun. **Revenge.** تَأْرٌ .  
Tûlvekirin karek paşkevî ye.

**Tûmarkirin:** j.tê.vt. Êxistin ser kasêtê. **To record.** يُسَجِّلُ

Bilindî stran ên Erdewanî tûmarkirin.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Record.** تَسْجِيلُ

Tûmarkirin a stiranan karek baş e.

**Tûşbûn:** j.tên.vi. Pêvebûn. **To suffer.** يَبْتَئِي .

Min gelek werziş kir û ez tûşbûm neşêm bihêlim.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Suffering.** اِبْتِئَاءُ .

Tûşbûn a werzişkirinê qazanc gehand min.

**Tûşkirin:** j.tê.vt. Pêvekirin. **To afflict.** يُبْلِي .

Eyasî qumar nîşa min da ez tûşkirim.

\_\_ :n.j.verbalnoun. **Affliction.** بَلَاءٌ، بَلْوَى .

Tûşkirin a min bi fêrbûn a qumarê, Eyas pêrabû.

# Ū

**Ūtûkirin (Ūtikirin):** j.tê.vt. Rastkirin. **To iron.** يَكوي المَلا بس .

Ūtûkerî kirasê Danî ûtûkir.

\_\_ :n.j.verbal noun. **Ironer.** كوي .

Ūtûkirin, cilan ciwan dik/e/it.



# V

**Vajîbûn:** j.tên.vi. Wergeran. **To reverse, To invert.** يَعْكُسُ ، يَقْلِبُ .  
وَجْهًا لِبَطْنِ .

Çît vajîdibe û dihê duruîn.

\_ :n.j.verbal noun. **Reverse, Invert.** مَعكُوس، مَقْلُوب .

Bi vajîbûnê kiras hat duruînê.

**Vajîkirin:** j.tê.vt. Wergerandin. **To reverse, To invert.** يُعكِسُ، يُقْلِبُ

Xecê şepik vajîkir û duruîn.

\_ :n.j.verbal noun. **Reverse, Invert.** مَعكُوس، مَقْلُوب .

Min şepik vajîkirî liberkir(Kir berxu).

**Valabûn:** j.tên.vi. Çu di navda nema. **To empty.** يَفْرُغُ .

Gozikî av dêrand û valabû.

\_ :n.j.verbal noun. **Empty.** إِفْرَاغُ .

Valabûn a gozikî ji dêrandinê çêbû.

**Valakirin:** j.tê.vt. Çu têda ne hêlan. **To empty, To discharge.** يُفْرِغُ

Me xanî valakir da em bihunîn(Rengbikin).

\_ :n.j.verbal noun. **Empty, Discharge.** تَفْرِيقُ .

Valakirinê kar sanahîkir.

**Vebûn:** j.tên.vi. Kiranewe. **To open.** يَنْفَتِحُ .

Min dergeh palda vebû. Pijkoja gulê vebû. Pijkoj vebû.

\_ :n.j.verbal noun. **Open.** انْفِتَاحُ .

Bi vebûn a pijkojê gul bi rewşkevt.

**Vebirrîn:** j.tê.vt. 1.Pêkhatin. **To agree.** يَنْفِقُ  
 2.rawestandin. **To stop, To cease.** يَوْقِفُ .  
 1.Azadî û Alanî bazar vebirrîn li ser xanî.  
 2.Dîlanî otombîl ne kirrî û bazar hat vebirrîn.  
 \_ :n.j.verbal noun. 1.**Agreement.** اِتِّفَاق . 2.**Cease.** اِنْقِطَاع , اِيْقَاف  
 1.Vebirrîn a bazarî liser xanî zuî çêbû.  
 2.Vebirrîn a bazarê otombîlê Ji Dîlanî çêbû.

**Veciniqandin:** j.tê.vt. Tirsandin. **To frighten, To startle.** يَجْفَلُ، يَفْرُ  
 Marî hêstir veciniqand.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Fright, Startle.** جَفُول، فَرْ .  
 Veciniqandin a hêstirê barê wê da êxistin.

**Veciniqîn:** j.tên.vi. Tirsan. يَنْجِفُلُ، يَنْفَرُ .  
 Hêstir veciniqî û barê wê kevt.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Fright, Startle.** جَفُول، فَرْ .  
 Veciniqînê barê hêstirê da êxistin.

**Veçirîn:** j.tê.vt. Jêkvebûn. **To be teased.** يَنْدُفُ، يَنْفِشُ .  
 Şirînê hirî veçirî bo balîfê.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Tease.** نَدِفُ، نَفِشُ .  
 Veçirînê hirî amadekir bo pirrkirin a balîfê.

**Vedan:** j.tê.vt. 1.Danan. **To set up.** يَنْصُبُ  
 2.Dan alekê. **To isolate, To put aside.** يُعْزِلُ، يُبْعِدُ .  
 1.Me çadir veda li seyranê. Me kêl vedan bo kêlanê.  
 2.Me cil ên pîs vedan bo şuştinê.  
 \_ :n.j.verbal noun. 1.**Set up.** نَصِبُ . 2.**Isolation.** عَزْلُ، اِبْعَادُ .  
 1.Vedan a çadirê em ji baranê paraztin.  
 2.Vedan a cil ên pîs bo şuştinê bûn.

**Vegeran:** j.tên.vi. Zivirîn. **To return.** يَرْجِعُ .  
 Cotyar vegera bo malê.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Return.** رَجوعُ .  
 Vegeran a cotyarî bo malê ji ber barîn a baranê bû.

**Vegerandin:** j.tê.vt. Zivirandin. **To return.** يَرْجِعُ .  
 Şivanî pez vegerand bo gundî.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Return.** رَجوعُ .  
 Vegerandin a pezî bo firotinê bû.



**Vegêran:** j.tê.vt. 1.Gotve. **To tell.** يَفْصُّ، يَرُوي .

2.Pêknehatin. **To restore.** يُعيد

1.Dapîrê çîrok vegêra bo nevîyê xu.

2.Dijwarî hesp vegêra,çiku leng bû.

**Vegirtin:** j.tê.vt. 1.Kirin kilozî. **To pickle.** يَكْبِسُ

2.Ji avê derînan. **To grasp, To grab.** يَلْفَفُ .

1. Xanê sîr vegirtin bo jajî û penîrî.

2.Zaro da xendiqît, Pîtanî vegirt.

\_.n.j.verbal noun. 1.**pickle.** كَبِسَ . 2.**Grasp, Grab.** لَفَفَ .

1.Vegirtin a sîran Xanê pêrabû.

2.vegirtin a zaroyî Pîtan pêrabû.

**Veguhaztin:** j.tê.vt. Cih lê guhorîn. **To transfer.** يُحَوِّلُ ، يَنْقُلُ .

Zozan hat veguhaztin ji Dihokê bo Amêdîyê.

\_.n.j.verbal noun. **Transfer.** تَحْوِيلٌ، نَقْلٌ .

Veguhaztin daxuaz a Zozanê bû.

**Veguran:** J.tê.vt. Kevilkirin. **To Skin.** يَسْلُخُ .

Dirbazî du berx veguran.

\_.n.j.verbal noun. **Skinning.** سَلَخَ .

Veguran karê Dirbazî ye.

**Vehandin:** j.tê.vt. 1.Helbest nivîsîn. **To poetize.** يَنْضُمُ

2.Pêvekîr. **To string.** يَسْلِكُ

1.Bêkesî sê helbest vehandin.

2.Narîne tizbî vehandin.

\_.n.j.verbal noun. 1.**Poetizing.** نَضِمَ . 2.**Stringing.** تَسْلِيكَ .

1.Vehandin a helbestan Bêkes pêrabû.

2.Vehandin a tizbîyan Narîn pêrabû.

**Vehejan:** j.tên.vi. Lerizîn. **To shake, To vibrate.** يَهْتَرُّ ، يَتَرَدَّدُ .

Di bagurrê(Hurrê) de dirext vehejan.

\_.n.j.verbal noun. **Shake, vibration.** اهْتِزَازٌ ، تَرَدُّدٌ .

Di vehejanê de du dirext şkestin.

**Vehejandin:** Lerizandin. **To shake, To vibrate.** يُهَزُّ .

Bagurrê dirext vehejandin.

\_.n.j.verbal noun. **Shake, Vibration.** اهْتِزَازٌ .

Vehejandin dijwar bû, hin dirext şkandin.

**Vehesan:** j.tên.vi. 1.Kelîn. **To mature, To ripen.** يَنْضُجُ  
 2.Hulîbûn, losbûn. **To smooth.** يَمْلَسُ .  
 1.Birinc vehesa. Savar vehesa. Girar vehesa. Nîsk vehesa  
 2.Binê jorê vehesa. Dîwar vehesa.  
 \_ :n.j.verbal noun. 1.**Maturity, Ripeness.** نِضُوجُ  
 2.**Smooth.** مَلْسُ  
 1.vehesanê birinc xoşkir.Vehesanê savar xoşkir.  
 2.Vehesanê dîwar ciwankir.

**Vehesandin:** j.tê.vt. 1.Kelandin. **To mature, To ripen.** يَنْضُجُ  
 2.Hulîkirin. **To smooth.** يَمْلَسُ .  
 1.Kabanîyê birinc baş vehesand.  
 2.Hunîkerê dîwar baş vehesand.  
 \_ :n.j.verbal noun. 1.**Maturity, Ripeness.** نِضُوجُ  
 2.**Smooth.** مَلْسُ  
 1.Vehesandin a gelek(zêde)şîv nexoşkir.  
 2.vehesandin a gelek dîwar kir xudîk.

**Vehewan:** j.tên.vi. Hatin malê. **To gather.** يَدْخُلُونَ الدَّارَ .  
 Ajel hemî vehewan. kewal hemî vehewan.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Gather.** دِخْوَالُ الدَّارِ .  
 vehewan a ajelî ji ber barîn a baranê bû.

**Vehewandin:** j.tê.vt. Kirin di malê de. **To fetch.** يَدْخُلُوهُمْ فِي الدَّارِ .  
 Şivanî ajel vehewand.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Fetch, gather.** إِدْخَالُهُمْ فِي الدَّارِ .  
 Vehewandin a ajelî şivan pêrabû.

**Vejenîn:** j.tê.vt. Velerzîn. **To vibrate.** يَتَرَدَّدُ، يَهْتَرُّ .  
 Kivan vejenî û pembî jêkvekir.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Vibration.** تَرَدُّدٌ، إهْتِزَازٌ .  
 Bi vejenîn a kivanî pembî jêkvebû.

**Vekêşan:** j.tê.vt. Kêşan. **To pull.** يَسْحَبُ .  
 Yarîkeran werîs vekêşa.  
 \_ :n.j.verbal noun. **Pull, Pulling.** سَحْبٌ .  
 Tîpa (B)Werîs vekêşan bir(qazanckir).

**Vekirin:** j.tê.vt. Kiranewe. **To open.** يَفْتَحُ .

Dizî dergeh bi kilîlê vekir.

\_ :n.j.verbal noun. **Open.** فَتْحُ .

Vekirin a dergehî bi kilîlê bû.

**Vekolîn:** j.tê.vt. Lêgeran. **To look for, To search for.** يَبْحَثُ، يَنْقَبُ

Mirîşkê xak vekolî bo kirman. Polîsî tuîrk vekolî.

\_ :n.j.verbal noun. **Looking for, searching for.** بَحْثُ، تَنْقِيبُ .

Bi vekolîn a tuîrkî polîsî debanceyek dît.

**Vekuştin:** j.tê.vt. Serjêkirin. **To slay.** يَذْبَحُ .

Xebatî berxek vekuşt bo mêhvandarîyê.

\_ :n.j.verbal noun. **Slaying.** ذَبْحُ .

Vekuştin a berxî bo mêhvandarîyê bû.

**Veman:** j.tê.vt. Man lipaş. **To be late. To delay.** يَتَأَخَّرُ .

Kerwanê Sêrtê vema li Mêrdînê.

\_ :n.j.verbal noun. **delay.** تَأَخَّرُ .

